



Sal 1
Hejmar 2
Hezîran 1995

XWEDÎ Û BERPIRSIYARÊ GIŞTÎ

Mehemed Malmîsanij

REDAKSİYON

Osman Aytar
Nedim Dağdeviren
Nacî Kutlay
Mahmûd Lewendî
Hesenê Metê
Zinar Soran

ŞERTÊN ABONETIYÊ

Salek: 200 SEK
Nîvsal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din
mesrefa postê lê zêde dibe.*

İLÂN

Rûpelek 1000 SEK
Niv rûpel 500 SEK
Çarîk rûpel 200 SEK

**PERGALA BERGÊ
Û RÛPELAN**

Nedim Dağdeviren

POSTGIRO

46 32 31-1

ISSN

1400-528X

Berpirsiyariya her nivîsê,
ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

ADRESS • ADRES • NAVNÎŞAN

c/o Tayfun, Hyppingeplan 21, 2 tr., 163 32 Spånga • SWEDEN

TELEFON 08-760 69 38 TELEFAX 08-711 08 36

TÊDE

Sal 1 • Hejmar 2 • Hezîran 1995

WESIYETNAMEYA PÊŞEWA QAZÎ MIHEMED

Amadekar: Seyîd Mihemedî Semedî, 3

DERHEQÊ MEHKEMEYA QAZÎ MIHEMED DE

Dr. Rehîmî Qazî, 7

DEWRA AHMEDÊ XANÎ Û KURDEWERIYA WÎ

Mûrad Ciwan, 13

KELBEŞ ÇI YE W BE KÊ DELÊN?

Seîd Kawe, 25

BIRAY Û LACÊ ŞÊX SE'ÎD EFENDÎ

Cigerxwîn, 30

BEŞA ÇARAN DÎ BÎWARA WELATÊ ÇIYA (CÎBAL) DE YE

Fedlullah el-'Umerî, 39

CIVATA AZADIYA KURD II

Zinar Soran, 55

ÇARÎN

Kemal Burkay, 66

DU NAMEYÊN DR. FÛAD BERXO (1887-1925)

M. Malmîsanij, 67

"SIYASİYÊN ME NEBÛN"

Hemîd Kilicaslan, 75

HÊNDÊ LAYENÎ KULTURÎ KOMARÎ KURDISTAN 1946

Kerîmî Husamî, 85

BÎRCANÊ DİYARBEKÎRÎ RA MEKTUBÊKE

Serdar Roşan, 88

BÎLA WÎRG BE

Ahmet Cantekin, 93

KIRDKÎ (DİMILKÎ) DÎ JEWAMOREY Û BOLAMOREY

Haydar Diljen, 96

JÎ KURTEÇIROKA HEVÇERX YA KURDÎ

Amedekar: Xelîl Duhokî, 101

KÎRMANCKÎ (ZAZAKÎ) DE NÊR Û MAYÎK

Mûnzûr Çem, 105

HATAY Û BÎRANÎNÊN MEKTEBÊ

Kemal Sülker, 113

MEMOYÊ ŞIVAN Û ÛJDANÊ DADGEHA TÎRK

Laleş Qaso, 116

JÎ KOMELÊ 120

WESIYETNAMEYA PÊŞEWA QAZÎ MIHEMED*

Amadekar:
Seyîd Mihemedî Samedî

Qazî di dehê Ferverdîn 1326 [31 Adar 1947]'an de, bi amadebûna Mihemed Siddîq Sidqî ev wesiyetname gotiye¹.

Perçeyek yan jî du perçe xalî yan jî xaliçeyên Seyîd Rehîm, kurrê Seyîd Camî ligel tiştên min in, bidin wî û hinek pereyên min jî li wî ne; heke da baş e, heke neda jî serbest e.

Genimê ku di Tesbîtê² de bû -ku yê min e-, heke dan bigrin.

Makîna Ford 46 [model] jî malê min ê şexsî ye .

Dema ku ez tewqîf kirim, pênc hezar û du sed tumen di bêrika min de bûn, ji min girtin û sed û pêncê û sê tumen carekê, deh hezar tumen jî carekê Serwan Şerîf bi navê "hequq'l-wekale" (heqê wekaletê) ji jina min girtine; wan jî paş de bigrin.

Mu'înî³ sê hezar tumen -hinekî zêde yan jî kêm- deyndarî min e û wî jî tişteke daye [min] û se'eta ku bi navê hediye jibo min aniye, daxilê deftera Şîrketê** kiriye û ez beşdarê Şîrketê nebûme.

Nizanim heşt hezar tumen yan jî tişteke kêmtir heqê Seyîd Selam⁴ li min e, wî bi xwe çî got bidinê.

Telefon birine, taqîb bikin.

Otomobîla ku ji Baba Şêx⁵ girtine, ew jî ya şêxsê wî ye.

* Farisiya wesiyetnameya Qazî Mihemed û fotokopiya destnivîsa Mihemed Siddîq Sidqî, ligel "serinc û ronîkirin"ên Seyîd Mihemedî Samedî, berê di hejmarê 24-25. a kovara Mamostay Kurd de derketibûn; min ji wir wergirtin û wergerandin. *M. Malmîsanij*

** Li gor gotina kek Hesenî Qazî, mebest ji vê "Şîrket"ê, Şîrketî Tereqqî ye ku di dema Komara Kurdistanê de şîrketêke tîcarî bûye. *M. Malmîsanij*

Çar cîbên ku min bi şexsê xwe... *** û di destê min de bûn ew jî yên min ên şexsî ne.

Ji ber ku Serwan Şerîf⁶ zehmet ..., bi qasî sê sed tumenî bidinê.

Heke ew panzdeh hezarên jorîn [paş de] hatin girtin, jê hezar tumenî bidin Se'îd Humayûn û hezarî jî bidin Mîrza Rehîm -her duyan xizmet kirine-, pênc sed tumenî jî bidin Mihemedê Feyrûze Xanim.⁷

Xwişkên min hene, xeyn ji Axilyan⁸ ku li ser navê min bi xwe hatiye qeydkirin, heqê wan di hemî terekeyê (mîrasê) bavê min de heye; wan razî bikin.

Jina min dayka zarokan bila wesî^{****} be û li zarokan binêre, bila Mela 'Ebdullah⁹ çavdêr (nazir) be.

Çapxane jî min bi xwe kirriye, malê min e.

Herçiqas xebera min jê tune [jî], li gor xeyala Mam 'Ezîz Qerenî Axa, tiştê ku bi serê wî de hatiye, bi tehrîka min bûye. Lê karekî bikin ku bila min bibexşîne (azad bike).

Herçiqas min [ew] ji kuştinê [jî] xelas kiriye, heke dilê Mîrza Rehmet¹⁰ yan jî kesê din ji min mabe, bila min bibexşîne.

Xizmetkarên ku di vê demê de xizmet kirine, zehmeta min kişandine, qencîyê li wan bikin û wan razî bikin.

Piştî ji ... ***** çend hezar tumen jibo îsquat û tehlîla^{*****} min bidin.

Şeva 10. 1. 1326 [31. 3. 1947]

Îmze

Mela Siddîq Sidqî, Qazî Mihemed

Yê ku ji Farisî wergerandiye:

M. Malmîsanij

*** Li vir kelîmeyek yan jî du kelîme nehatin xwendin. *M. Malmîsanij*

**** **wesî:** 1)Kesa/kesê ku malê sêwiyên îdare dike 2)Kesa/kesê ku wesiyeta kesekî bi cî tîne. *M. Malmîsanij*

***** Li vir kelîmeyek yan jî du kelîme nehatin xwendin. *M. Malmîsanij*

***** **tehlîl:** Gotina "laîlahe îllellah", du'a. *M. Malmîsanij*

HİN SERİNC Û RONÎKİRİN

(Ev serinc û ronîkirin ji alî Seyîd Mihemedî Samedî hatine nivîstîn. Dema wergerandinê de min tenê rêzêkirina hin paragrafan guherand. M. Malmîsanîj)

¹ Ev seneda ku li vir tê belavkirin, **beşek** ji wesiyetnameya Pêşewa Qazî Mihemed e ku di şeva 10. 1. 1326'ê hetavî (şemsî) de, nîv se'et berî şehîdbûna Qazî, bi destê Mela Siddîq Sidqî hatiye nivîstîn û li binî îmzeyên Mela Siddîq û Qazî Mihemed hene. Qazî, tim îmzeya xwe wek "Mihemed Qazî" avêtiye. Mamosta Mela Siddîqî Sidqî rûhaniyekî pirr berêz ê Mehabadî û di dema berê de îmam û dersbêjê mizgefta Hebas Axa ya Mehabadê bûye. Di şeva dardebûyîna Qazî de, jibo wesiyetkirina Qazî û hevalên wî, ew [Mela Siddîqî Sidqî] anîne da ku wesiyetên wan binivîse. 'Eslê vê wesiyetnameyê li ba Doktor 'Ebdulla Ebrîşimî ye. Doktor Ebrîşimî merivekî jîr ê Mehabadê ye, zavayê Qazî Mihemed e û nika li Tehranê dijî. Kek Se'îd Humayûn -ku xwarziyê Qazî ye-, jibo ronîkirin û şîkirina (tehlîlkirina) hin derên vê belgeyê alîkariya min kir. Gelek sipas jibo mezinî û camêriya her duyan.

² **Tesbît:** Navê ciyekî ye [li Mehabadê] û 'embara dext û danî bûye.

³ **Mu'înî:** Mihemed Emînî Mu'înî, di kabîneya Komara Mehabadê de wezîrê kîşwerê bû.

⁴ **Seyîd Selam:** Seyîd Selamî Huseynî, xwediyê gundê Sewzî bûye.

⁵ **Baba Şêx:** Cenabê Hacî Baba Şêx, serekwezîrê Hukûmeta [Komara] Mehabadê bû.

⁶ **Serwan Şerîf:** Di du ciyan de navê Serwan Şerîf derbaz dibe. Ev Serwan Şerîf li garnîzona Mehabadê efserek (zabitek) bûye û wê demê ji alî hukûmeta [Îranê] ve wek awûkatê Pêşewa Qazî hatiye tayînkirin. Merivekî berêz û rastgo bûye. Paşê bi Xatû Meryema Kak Axazadeyê Mehabadî rezewicî. Pirraniya rûdanên derheqê Qazî û karûbarê mehkemeya wî de, ji xelkê Mehabadê re gotibûn û eşkere kiribûn.

⁷ **Se'îdî Humayûnî** kesekî berêz û xoşewîst ê Mehabadê ye, ji malbara Feyzullabegî ye û xwarziyê Pêşewa Qazî Mihemed e. **Mîrza Rehîm**, Mîrza Rehîmî Cewanmerdî Qazî ye. **Mihemedî Feyrûze Xanim** karmendê îdareya Duxxaniyat (karê tutunê) a Mehabadê bûye. Tarrjenekî jêhatî û kurrê meta Qazî bûye.

⁸ **Axilyan:** Li herêma Mehabadê gundek e.

⁹ Mebest ji **Mela 'Ebdullab**, Mela 'Ebdullay Muderrîsî ye.

¹⁰ **Mîrza Rehmet:** Xwedê jê xweş be Mîrza Rehmetî Şafî'î yek ji kesên navdar û diyar ên Mehabadê bû.

DERHEQÊ MEHKEMEYA QAZÎ MIHEMED DE

Dr. Rehîmî Qazî

... Mehkemeyê li ser hev çar roj ajot. Roja pêşîn hukmê tawanbariya Qaziyan tê xwendin. Wekî ku Necef Qulî Pîsyar nivîsiye, roja duyem Qazî Mihemed çardeh se'etan dipeyive. Pîsyar, gotara çardeh se'etî ya Qazî Mihemed bi du rêzan îfade kiriye û wenî nivîsiye:

"Di mehkemeyê de Qazî Mihemed êriş dibir ser siyaset û karên Dewleta Tehranê û digot 'Ez ji vê quncikê girtîxaneyê, li dijî Dewleta Tehranê û serekên wê dengê xwe bilind dikim, dibêjim ku tawankar hun in neku em... Yên ku welatê me dagîr kirine û êriş bi ser me de anîne hun in' ..."

Di vî warî de Suleyman H., di nivîsa xwe de dibêje Qazî got "Şûna ku hun bîn girtin û mehkemekirin, hun hatine we li mala min ez girtime û we ez avêtime girtîxaneya xwe... Ev bûyerên ku rû dane giş encama siyaseta dagîrkerane ya dewletê ne. Dewletê nedihîşt xelk jibo xwe nûnerên xwe hilbijêre û bişîne meclisê... Heke dewlet temamê Kurdistan xayîn dizane, dev ji vê navçeyê berdin û heke wan welatperwer dihesibîne, bila bihêle da ku ew bi xwe karûbarê xwe bigrin destê xwe..."

Di belgeyêke tarîxî ya arşîva Dewleta Sovyetê de, derheqê birêvebirina mehkemeya Qaziyan de, li ser gotina çend efsar (zabit) û karbidestên dewletê, behsa gelek tiştan hatiye kirin, dema ku dor were em dê behs bikin.

Îcar di vê belgeyê de, derheqê gotara Qazî de wenî hatiye nivîsîn:

"Qazî Mihemed di temamiya mehkemeyê de pirr bi cesaret, bêtirsî û serbilindî dipeyive; carekê jî nayê dîtîn ku serî danîbe û ji kirinên xwe poşman bûbe. Qazî, hemî tawanbarkirinên mehkema eskerî red kirin û got 'Bi tenê ji ber ku dewleta Tehranê bi xwe qanûna esasî ya Îranê xist bin piyan gelê Kurd çek hilda, dest bi xebatê kir.' Qazî, li hember îddîa ku goya ew di bin êrişa dewleteke biyanî de têkilî tevgerê (serhildanê) bûye, pirr hêrs bû û got 'Hun nikanin rastiyê fêm bikin. Li Kurdistanê destpêker û damezrênerê tevgera demokrasîyê ez bi xwe bûm û tu hêzeke biyanî ji bo vî karî ez mecbûr nekirime. Di vî karî de serkanî û yê ku îlhamê dan min, welat û milletê min bûn. Hun çî dixwazin, bi min bikin, lê te'dayê li milletê min nekin.'

... Hêjayî gotinê ye ku piştî biryara mehkemeya eskerî, dezgeyên Dewleta Îranê bê eşkerekirina vê biryarê, bo xapandina xelkê dest bi taktîkekê kirin. Bi hemî hêza xwe hewl didan wenî nîşan bidin ku goya pirraniya xelkê Kurdistanê li dijî "rûdanên xirab" ên Qazî Mihemed û birayên wî ne û çî tiştê ku wan kirine bi serê xwe kirine û pêwendiyê wan bi bîrûbawerî, dawxaz û amanca gelê Kurd re tune. Îcar yek ji karên dewletê bo xapandina xelkê ew bû ku nameyek amade kir ku tê de behsa xayînî û welatfiroşiya Qazî [Mihemed] û birayên wî dihat kirin; herweha tê de hatibû nivîsîn ku pêwendiyê wan bi dawxaz û amanca gelê Kurd re tune, tiştên ku kirine hemî li gor daxwaza dewleteke din bûne û ji ber van kirinan divê ew bîn kuştin... Çend Kurdên ku paşê bûbûn endamên SAWAK'ê¹ -wekî Şêx 'Ebdulrehmanî xelkî Burhan-, ev name li Kurdistanê gerrandibûn ku xelk bi tiliya xwe mor bike, îmza bike. Lê ji çend derebeg, fêodal, şêx, mela û sermayedarên xwefiroş, welatfiroş û nokerên ber deriyê seraya Şah wekî 'Umer Xanî Şerîfî, 'Ewlay 'Ezîz Axay Mengûr, 'Ezîzî Mameş, Reşîd Begî Herkî, Mela Xelîl, Mela Sîddîqê mizgefta Hebas Axa², Mela Mihemedî Dirbikêyî, Şêx 'Ebdulrehîmî Bacewend, Rehmanî 'Ettarî, Rehmetî Şafî'î³, Ehmedî Tewhîdî, Muftî Gewre, Surey Şafî'î, 'Ewlay Kerîmî, Hesenî Dawidî, Reşîdî Şafî'î, Seyid 'Ewlay Seydî, Salihî Şatirî, 'Elî Begî Heyderî, 'Ewlay Îlxañzade û yên wekî wan pê ve, kesekî din bi tiliya xwe mo nekir).

... Nivîskarê kevneperest ê Îranî, Suleyman H. bi xwe îtîraf dîke ku Stadê Erteş [Kurmaya Orduyê] destûr dabûyê da ku beşdarî vê mehkemeyê bibe, lê wisa xuya ye ku ew bi xwe yek ji bawerpêkiriyan orduyê yan jî endamekî xwedînuvûz ê orduyê bûye. Îcar ew di nivîsa xwe de behsa fîdakarî, bêtirsî û aramiya (sakiniya) Qaziyan dîke û dinivîse: "Dema destpêkirina mehkemeyê de min Qazî dîtî. Seyfî Qazî û Sedrî Qazî di nav wan şertan de jî qedr û hurmeteke zêde didan Qazî Mihemed. Bê destûra Qazî rûnediniştin, nedipeyivîn, nan nedixwarin û hetta bê wî nimêj jî nedikirin. Her sêyan bi milletperwerî û welatperweriya xwe pîr şanazî dikir. Bi taybetî derheqê meseleya Kurdî de eleqe û xoşewîstiyê mezî nîşan didan."

"Dema ku behsa xiyaneta wan hatkirin, Qazî Mihemed bi aramiyê taybetî, lê bi dilekî tije kîn digot: 'Evder malê min e, axa Kurdistanê axa bab û bapîr û ecdadê min e, çawan ez dikanim dev jê berdim'?..."

... Ew belge û senedên vê mehkemeyê yên ku di dest de ne û derheqê gotara Qazî Mihemed û hevrêyên wî de ne, gotinên efsêrên Îranê û bi taybetî yên Serwan Şerîfî⁴ û Emîr Perwîz in. Li vir hêjaye ku behsa gotinên Serwan Şerîfî -ku wek awûkat beşdarî mehkemeyê bûbû- bê kirin. Ew, piştî temambûna mehkemeyê diçe mala Qazî û bi dilekî xemgîn van gotinan ji merivên Qaziyan re dibêje:

”Heyfa Qazî Mihemed, heyfa wî camêrê mezin û jîr û zana. Do, dema mehkemeyê, wî bê kaxîz çar se’etan nutuq da û bi zanîst û mentîqê xwe hemî heyran hiştin. Qazî wisa bi serrastî û fidakarî qise dikir ku, tu endamekî mehkemeyê nedikanî qiseyên wî bibirre; hemî cezb kiribûn. Qazî Mihemed ji her kesî baştir qanûnên Îranê dizanî û ji her kesî baştir şarezayê rewşa siyasiya Îranê û welatên derve bû. Di rastiyê de ne mehkemeyê Qazî, lê Qazî mehkeme mehakeme dikir. Qazî, dewleta Îranê, bi xiyankariya hember gelên Îranê tawanbar kir. Qazî bi bêtirsî û azayetiyeke bêmîmûne netenê mafê gelê Kurd diparast, mafê hemî gelan û serbixweyî û temamiya Îranê diparast. Qazî rasterast û bê ku tirs wî hebe got: ‘Ev mehkeme çêkirî (sun’î) û sexte ye, mehkemeyê millî û gelî nine. Çunkî gel zaroyên xwe mehkeme nake. Em baş dizanin ki hûn, axayên mehkemeyê, li ser daxwaza dagîrkerên dewleteke din mehkeme dikin û daxwaza wan bi cî tînin; em ji kirinên xwe ne poşman in û [tawana] xiyankariya welat û milletî qet qebûl nakin’...”


Şerîfî herweha gotibû: ”Wan lawên qareman bi awayekî hevûdin diparast û bersîv didan ku zerreyek lavayî yan jî ji kirin û bîrûbaweriya xwe poşmanî nedihat hîskirin... Ne min ne jî tu kesî ji Qaziyan qebûl nekir ku em binê qerara mehkemeyê îmtiza bikin...”

Ji ber vê yekê, paşê Şerîfî ji orduyê avêtin û hemî rutbeyên wî jê girtin.



Derheqê hel û merc (çawabûnî) û rewşa roja dardekirina Qaziyan de, serokê wê demê yê Dayîreya Cenderman, Serheng (Albay) Emîr Perwîz piştî çend salan ev gotinên jêrîn gotibûn ku di arşîvê de hatine parastin.

... Piştî derketina biryara mehkemeya duwem, Qaziyan ji hev vediqetînin û wan dixin odeyên cihê-cihê da ku haya wan ji hevûdin tunebe. Se’et yazdehê şeva 10 Ferwerdîn [31. 3. 1947], efserek diçe odeya Qazî Mihemed û jê re dibêje biryar hatiye dayîn ku we bibin Tehranê. Rabexwe amade bike. Qazî [Mihemed] suwarî kamyonek -ku tîji eskerên çekdar e- dikin û dibin



► Pêşewa Qazî Mihemed (Fotograf: Ji arşîva Hesenî Qazî)

rex Meydanî Çuwarçira. Li wir çavê Qazî bi sêpêyên amadekirî dikeve û êdî her tiştî fêhm dike. Qazî dibin salona şaredarî (belediyeyê). Dadsitanê (muddeî'umûmiyê) Mehkemeyê, Serekê Dayîreya Pizîşkî, Serheng Parsî Teyar, Mela Sîddîqî mizgefta Hebas Axa û Emîr Perwîz li wir bûne. Ligor gotina Emîr Perwîz, gava ku Qazî tê odeyê, berê xwe dide Parsî Teyar û dibêje:

"Hun ji mirîyên me jî ditirsin. Heke mebesta we kuştina me ye êdî çima hun derewan dikin û dibêjin em we dibin Tehranê? Wisa xûya ye ku derewkarî û durûtî qanûna we ye..."

Parsî Teyar berê xwe dide Qazî û dibêje di ciyê van gotinan de, baştir ew e ku tu rûnî wesiyetnameya xwe binivîsî. Qazî Mihemed jî berê xwe dide Mela Sîddîq û her li ser piyan bi wî dide dîktekirin. Gava ku Mela qelemê digre, Qazî bi zimanê Farisî dibêje: "Binivîse, bila milletê Kurd bizane ku ez heta hilma dawîn a jiyana xwe kurrê fedakar ê wî bûm..."

Li vir Parsî Teyar gotina Qazî Mihemed dibirre û dibêje "Qazî, jibo sêpêyê [dardebûyinê] tevî hev çend gavên te mane, lê tu dîsa jî dev ji van gotinên vala bernadî. Baştir ew e ku heke bo zar û zêçê te wesiyeteke te hebe, bêje, bila Mela ji te re binivîse..."

Qazî bersîva wî dide dibêje "Zar û zêçê min milletê Kurd e, peyayên wekî te ku nokerên biyanî û aletê destê vî û wî ne, ji tiştên wenî fêhm nakin. Malxirabo, li ser hev çend deqîqeyên min mane, tiştê ku ez dibêjim divê [hûn] binivîsin. Şer'a Îslamê vê yekê dixwaze, yan na we ev Mela Sîddîqê rafîzî jibo çi anîye vir?..."

... Piştî van gotinan Qazî Mihemed bi destê xwe wesiyetnameyê dinivîse. Ligor gotina efseran, Qazî Mihemed du wesiyetnameyan dinivîse. Ji vana yek derheqê mal û mindalan (zarokan) de, a din derheqê meseleya siyasî de ye. Eva ku derheqê mal û mindalan de ye didin jina Qazî, lê a din nedabûnê û nika jî nayê zanîn ku Qazî di wê de çi nivîsiye. Di wesiyetnameya mal û mindalan de -ku kopya wê di destê me de ye- çend rêzên ku bi mebesteke siyasî hatine nivîsîn hene. Çawa nivîsiye em li jêrê bi wî hawî pêşkêşî xwêndevanan dikin:

"Bi hemî hoyên ku di destê min de bûn eger min şerr kiriba dibe ku zora me nebirana, lêbelê bo ku Mehabad wêran nebe û bo xatirê ku xelk neyê qirrkin, me şerr nekir. Bi wan hemî makîne û fersendên ku di destê min de hebûn, min dikarî ji Mehabadê birevim û du caran jî di axaftinên xwe de min ji xelkê Mehabadê re got; min dizanî heke ez birevim, li vir jî wekî li

Tewrêzê (Tebrîzê) kuştar û talan çêdibe. Min bi xelkê ragihand ku, dibe ku min bigrin û bikujin jî, lêbelê bo ku namûsa xelkê bête parastin û talan nebe ez narevim û xwe dikim qurbana we. Va ye ez li ser gotina xwe disekinim û heta niha di tarîxê de nehatiye dîtin ku kesekî fedakariyeke wenî kiribe. Helbet li ser we jî pêwîst e ku hun li hember xizim û kes û karên min wefadar bin û heyfa min jî bistînin. Ez bi vê yekê serbilind im ku di riya milletê xwe de ez xwe feda dikim. Bijî serbestî û serbixweyiya Îranê!...”

... Qazî Mihemedî, berî dardebûyînê li ber sêpê jî nutuqeke kurt da û ji gelê Kurd re got ku bila di riya rizgarî û serbixweyiya Kurdistanê de dev ji xebata xwe bernedin. Qazî got:

”Ji dewleta xwefiroş a Tehranê bawer mekin. Qewl û qerarên wan hemî derew in. Wan em xapandin. Dev ji xebata xwe ber medin. Bijî Kurdistana rizgar[kirî]!”

Emîr Perwîz herweha gotibû: Dema ku Qazî Mihemed birin ser kursiya sêdarê, destmalek anîn ku pê çavên wî girêdin. Lê Qazî nehişt û got ”Xayînno! Ez li hember millet û welatê xwe şermezar ninim ku hun çavên min girêdin... Ez dixwazim di vê deqîqeya dawîn a jiyana xwe de bi serbilindî li asoya berbeyanî ya welatê xwe yê xoşewîst, xweşik û dilgîr binêrim ku çawan pêşîra tarîtiyê diçirîne. Ez kurrê wefadar ê milletê xwe bûm û [nika jî] weha me. Bijî milletê Kurd! Bijî rizgariya Kurdistanê!”⁵

Yê ku ji Kurdiya Başûr wergerandiye:
M. Malmîsanij

¹ **SAWAK** (Sazmanê Îtîla'at we Emnîyetê Kêşver): Di dema şah de sazmana emnîyet a Îranê bû

² **Mela Siddîqê mizgefta Hebas Axa**: Seyîd Mihemedî Samedî bi awakî pozîtîf behsa vî kesî dîke. (Binêre ”Hin Serinc û Ronîkirin” ên ku ji alî Seyîd Mihemedî Samedî hatine nivîsîn û di vê hejmara Çirayê de hatine weşandin.)

³ **Rehmetî Şafi’î**: Li gor Seyîd Mihemedî Samedî, ”Mîrza Rehmetî Şafi’î yek ji kesên navdar û diyar ên Mehabadê bû”. (Binêre ”Hin Serinc û Ronîkirin” ên ku ji alî Seyîd Mihemedî Samedî hatine nivîsîn û di vê hejmara Çirayê de hatine weşandin.)

⁴ **Serwan Şerîfî**: Derheqê vî kesî de binêre ”Hin Serinc û Ronîkirin” ên ku ji alî Seyîd Mihemedî Samedî hatine nivîsîn û di vê hejmara Çirayê de hatine weşandin.

⁵ Dr. Rehîmî Qazî, Basêk Le Merr Mehakemey Pêşewa Qazî Mihemed ”Be Bûney 80’yemîn Salî Le Daykbûnî”, Le Bilawkirawekani Tîşk, 1359 [1980], r. 9-10, 20-21, 32-34, 36-40

DEWRA AHMEDÊ XANÎ Û KURDEWERIYA WÎ¹

Mûrad Ciwan

Ahmedê Xanî, her wekî tê zanîn, şair, alim û mutefekkirê herê pêşin ê Kurd e ku bîr û baweriyên Kurdewerî pêşkêş kirine. Bawerîya xwe li ser rewşa Kurdan a dema xwe, sedemên vê rewşê û rîya çareserkerinê diyar kiriye. Bi vî awayê xwe, ew mutefekkirêkî siyasî yê Kurd e.

Lê bi dîtin û pêşniyariyên siyasî nemaye, hundurê fikrên xwe yên siyasî dagirtiye. Bi xwe dibêje ku bi zanebûn Mem û Zîn bi zimanê Kurdî nivîsiye, heta qehremanên xwe bi zanebûn ji nav civaka Kurdan hilbijartiye. Ev destan bi mîr û maiyeta xwe, bi hukûmet û xelkê xwe, bi evîndarên xwe, bi qehreman û fesadên xwe, bi dawet, şer, nêçîr, kêf û şahî, xem û zilm û zîndanên xwe civakeka Kurd a pir alî derdixê holê û Ahmedê Xanî ev rê bi zanebûn daye ber xwe:

(Xanî.....)

*Safî şemirand, vexwarî durdî
Manendê durê lîsanê Kurdî*

*Înaye nîzam û întizamê
Kêşaye cefa jiboyê a'mê*

*Da xelq nebêjîtin ku "Ekrad
Bêmarîfet in, bêesl û binyad*

*Enwa'ê mîlel xwedan kitêb in
Kurmanc tenê di bêhesêb in"*

*Hem ehlê nezer nebên ku "Kurmanc
Îşqê nekirin ji bo xwe amanc*

*Têk da ne talib in ne metlûb
Vêkra ne muhibb in ew, ne mehbûb*

*Bêbehre ne ew ji îşqebazî
Farix ji heqîqî û mecazî"*

.....

*Sazê dilê kul bi zîr û bem bit
Sazendê îşqê Zîn û Mem bit*

*Şerha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim bahane*

*Nexmê we ji perdeê derînim
Zînê û Memê ji nû vejînim*

*Malûl bûyîn hebîb û aşiq
Îrohe wekî tebîbê haziq*

*Derman bikim ez ewan, dewa kim
Wan bêmededan ji nû ve rakim*

.....

*Ev meywe eger ne abîdar e
Kurmancî ye ew qeder li kar e*

*Ev tifle eger ne nazenîn e
Nûbar e bi min qewî şêrîn e*

*Ev meywe eger ne pir lezîz e
Ev tifle bi min qewî ezîz e*

*Mehbûb e, lîbas û gûşîwar e
Milkêd-i min in, ne mustear e*

*Elfaz û meanî û îbarat
Înşa û mebanî û îşarat*

*Mewzû' û meqasid û hîkayet
Mermûz û menaqib û dîrayet*

*Uslûb û sîfat û mane û lefz
Esla nekîrin me yek ji wan qerz*

*Bîlcumle netaicêd-i fikr in
Dûşîze û nû'erûs û bîkr in*

Ahmedê Xanî, bi alimiya xwe ya dînî, bi dersdariya xwe, bi hînkariya xwe ya ji bo zarokên Kurdan, bi hunermendiya xwe ya şairî, bi mu-tefekirî ya xwe ya felsefî, dîrokî û

stêrnasî cihekî bilind digre.

Helbet sedemê vê yekê ew e ku ew kesekî zîrekê bikêrhatî ye, têgihîştin, aqil û xîreteka mezin li ser heye.

Ji eserên wî gellek xweş diyar dibe ku wî, li gor dema xwe, xwendin û tedrîsatek gellek tekûz û pîralî jî dîtîye. Xwendinek welê bi serûber û pîralî ku di zanyariyên dînî de, di dîrok û felsefa îslamiyetê de, di şerîetê de, di zimanên Farisî, Erebi, Osmanî û Kurdî de, di kultura îdarekirinê û ya dîwana mîrî de, di nasîna adet û teqalîdên civaka Kurdewarî de, di cografya û stêrnasiya wê demê de kûr çûye û bûye otorîte ku bi serbestî bîr û bawerî, qenaet û zanînen xwe di van waran de diyar kirine. Ev yek, pirtir destekê dide wan îddîayan ku dibêjin ew li gelek bajar û welatan geriyaye, wî li gelek medresên se-wiyebilind xwendîye. Bi alim, mîr û dewletmendên wê demê re rabûye û rûniştîye, ketîye sohbet û munaqesên dînî, zanyarî, bîr û baweriyên wê demê yên dunyawî.

Ev zanîna pîralî ya Ahmedê Xanî ji alî din ve fikrekê li ser sewiya hînkariya medresan ya wê demê dide me. Nexwe wan medresên ku Ahmedê Xanî û yên ku seyda û hevalên wî tê de xwendin û pişt re dersdarî kirin, ne medresenî bêîmkan û se-wiyenizm bûn.

Mîrov nikare îddîa bike ku Ahmedê Xanî zanayekî bi tenê yê îstîsna yê dewra xwe bû. Helbet ne bi

awayekî berfireh û kutlewî be jî, bi mahneya zumreyeka elît a serdest a teng be jî, ew di nava civatekê de dijiya, xwediyê hemdemên xwe bû.

Loma jî hem dema Ahmedê Xanî, hem jî hemdemên wî muhtacî wê yekê ne ku bi lêkolînên piralî û hûr û kûr bên ronahîkirinê.

Dewra ku ew tê de jiyaye, çî herêmî û welatî be, çî jî cîhanî be, tesîrek mezin li ser wî hiştiye. Di şikilgirtina fikrên wî de rol leyistiye.

Ahmedê Xanî, di nivê pašîn ê sedsala huvdehan de jiyaye. Tarîxa ji dayikbûna wî 1650-1651, ya mirina wî 1707-1708(?) e. Di 1664-65 an de dest bi nivîsînê kiriye. Mem û Zîna xwe ya şaheser di 44 saliya xwe de tamam kiriye.

Dewra Ahmedê Xanî, dewreka welê bû ku dest pê bûbû, dinya Rojhilat ji ya Rojava pêşdetir diket. Awrûpiyan ji mêj ve ji xwe re riyên din ên çûna Asyayê dîtibûn. Vasco da Gamayê Portekîzî, teqrîben du sed sal berî nivîsîna Mem û Zînê; di 1497'an de li dora Afrikayê zivirî û gîhaşt pêravê başûrê rojavayê Hindistanê. Her di wan salan de Kristoff Colombus jî Amerika keşif kir û Îspanyoliyan berê xwe dan vê qitaya nuh. Piştê hin Awrûpî yên din jî li pey Portekîziyan xwe gîhandin Asyayê, li hin peravan kolonî danin, di bazirganiya deryavaniyê de bi portekîziyan re ketin reqabet û şerî jî. Gava destpêka sedsala 17'an hat,

hin welatên din ketin pêşiya Portekîziyan. Herçî ji ber ku Îspanyoliyan pirtir berê xwe dabûn dinya nuh (qita Amerîkayê) li Asyayê zêde bela xwe di Portekîziyan nedan, lê Hollandî û Îngilîz ne di vê rewşê de bûn.

Deryavanê Hollandî Abel Tasman di 1643'yan de Awusturalya keşif kiribû. Di nivê duduyê vê sedsalê de Portekîzê kontrola Okyanûsa Hindî ji dest xwe derxist, xist destê Îngilîz û Hollandiyan. Evan jî bi riya bazirgan û leşkerên xwe yên deryavan, têkiliyên piralî li gel mîr, xaqan û mehracên Hindistanê, Moxolistanê, Çînê û Japonyayê danîn û di bazirganiya Asyayê û ya navbera Asya û Awrûpayê de pêşve çûn.² Vê yekê bi awayekî xerab tesîr li riya Baharatê û jiyana îqtisadî û ticarî ya wan welatên ser vê riye kiribû. Kurdistan, yanî welatên mîrayetiyên Kurdan ji vê yekê para xwe wergirtin. Ewrûpiyan li Afrikayê, li Amerîkayê û li Asya Dûr kolonyalîzma xwe pêşde birin. Êdî ne bi eşkereyî be jî şerqîyan pêşketina xerbiyan qebûl dikirin, rexbet ji mal û pereyên wan re pirtir bû. Çewa îro li şerqê dolar di ser hemî peran reye, wê demê jî Florinên Holandî pir bi qîmet bûn. Ahmedê Xanî di Mem û Zînê de pesnê Florînê zêrîn dide:

*Mîrê ku bi navê Mîreza ye
Mehza nezera wî kîmîya ye*

*Qelbêd-i zexel diket belorî
Pûlêd-i dexel diket florî*

Ronesansa Awrûpayê ku di eslê xwe de tevgera burjuwaziya Awrûpayê ya li hemberî arîstokrasiya feodal bû, ji du sed salan bêtir berî Ahmedê Xanî dest pê kiribû. Gava Ahmedê Xanî Mem û Zîn dinivîsand, ronesansa ku fikrên humanîzmê, şikjêbirinê û ferdiyeyê bilind kiribûn, gihaştibû qonaxa xwe ya herî bilind û kemilî. Tevgerên reformasyonê sed û pêncî sal berê destpê kiribûn. Li Ewrûpayê şer û têkilheviyên siyasî û fikrî hebûn. Galileo Galilei (1564-1642) yê Îtalî, berî ku Ahmedê Xanî were ser ruyê erdê dîn û ilim ji hev veqetand û iddia kir ku dinya li dora rojê digere. Filozof û zanayên wekî Francis Baconê (1561-1626) Îngilîzî, René Descartesê (1596-1650) Firansîzî derketibûn qada fikrî û ilmî. Isaac Newton (1642-1727) hemdemê Ahmedê Xanî bû. Nicolaus Copernikusê (1473-1543) Polonî sed û pêncî sal berî Xanî got ku ne ku dinya lê roj merkez e, hîv li dora dinyayê, dinya li dora xwe digere. Johannes Kepler (1571-1630) bi alîkariya lênêrinên xwe yê li stêran û ya Danîmarkî yê bi navê Tycho Brahes (1546-1601) Copernikus tesdiq kir û got ku planet li ser besteka elîpsî digerin.

Tevî vê jî, dewr li Awrûpayê dewreka wisa bû ku dêrê 70 sal piştî mirina Copernikus; di 1616'an de ew afaroz kir. Di 1633'yan de Galilei hat mecbûrkirin ku dev ji wê îddîa xwe berde ku digot dinya li

dora rojê digere.

Li Îngilterê, li Unîversîta Oxfordê, di 1670'yan de pişt li felsefa skolastîk hat şikandin. Li Harvardê, telebên dînî û teologan ev pirs girtin destên xwe. Lê li Îspanya û koloniyên wê, di 1633'yan de ev fikir hatin qedexekirin. Vê rewşa han heta nîvê sedsala 18'an ajot. Li Polonya û Macarîstanê û her wiha li Rûsyayê fikrên wiha di sedsala 18'an de peyda bûn û eynî di wê demê de jî di riya mîsyoneran re gîhaştin Çînê.

Fikrên Copernikus, 200 sal piştî mirina wî di sedsala 18'an de li Awrûpayê serbest bûn. "Principia" ya Newton di 1687'an de tenê çend nusxe çap bûn. Çapa duduyan ma heta sala 1713'an. Ev eser, cara pêşîn di 1729'an de bû Îngilîzî û di 1759'an de bû Firansîzî.³

Salekê berî ku Ahmedê Xanî çêbibe, li Îngilterê Cromwelî kral şikand û hat ser hukum. Li hin welatên Ewrûpayê şerê terefdarên kraliya mutleqî û yê kraliyên meşrûtî yan jî yê cumhûriyetçîyan çê dibûn. Li hin welatan her çendî parlamento, merkezî yan jî mehelli hatin avakirin jî, dem bi dem cumhûriyetçî hatin ser hukum jî, lê vê yekê gellek neajot, cumhûriyetçîtî û parlamenterîstî di demên gellek kurt de hildiweşîyan. Fikir û hukmên kraliyeta mutleqî li hemû Awrûpayê serdest û di rewacê de bû.

Osmanî hatibûn dawîya debdeba

xwe ya mezin. Erê hukmê şûrê wan hîn li ber deriyên Wîyanayê bû, lê Awrûpiyan li vir destpêkiribûn zora wan dibirin. Gellek şer li ber deriyê Wîyanayê çêdibûn, Osmanîyan êdî dest pê kiribûn ji Awrûpayê vedi-kişîyan.

Ev yek li paytext dibû sedemên bêistîqrariyan. Wezîr li pey weziran dihatin ezilkirin an îdamkirin. Yenî-çerîyan gav bi gav serî hildidan. Di serayan de entrîkayan Sultanani dadixistin û radikirin.

Rewşa bêistîqrarî, vekîşiyana ji rojava û Awrûpayê, şikestina di şeran de, daxwaz û tadeyiyên hukumeta merkezî ji bo esker û bac û xeracê, li ser Anadoluyê û Kurdistanê girantir dikir. Barê xelkê girantir dibû, nerazîbûn, acizî û tevlihevî di nav xelkê de pirtir dibû.

Kurdistan di rewşeka ecêb a balkêş de bû.

Rewşa Kurdistanê jî piçekî dişi-bihiya ya Osmanîyan. Kurdistan ji aliyekî ve di yek ji wan qonaxên tarîxa xwe yê herî bilind de bû.

Her weki tê zanin, di 1514'an de piştî ku mîrên Kurdan Sefewîyan ji erd û bajarên xwe derxistin, bi navbêncîtiya Îdrîsê Bedlîsî bi Yavuz Sultan Selîmê Osmanî re li hev kirin. Hin mîrîtî bûn hukumetên nîv serbixwe, hin jî hatin girêdan bi hukumeta merkezî ya Osmanî ve.

Herçî di 1514'an de piraniya Kurdistanê ket bin baskê Osmanîyan,

lê li ser erdên Kurdistanê hîn ji sed salan zêdetir misêwa şer di navbera Osmanî û Îraniyan de hebû. Ev yek bi giranî, 11 sal berî çêbûna Ahmedê Xanî, di 1639'an de bi Peymana Qesrê Şîrîn rabû û hudûdên diyar li navbera Osmanî û Îraniyan hatin kêşan, şer rawestiyar, aramî û îstîqrar zêdetir ket Kurdistanê.

Mîrên Kurdan ên ku xwedan hukumet bûn, di nav xwe de serbest bûn, hakimî dikirin û welat bi dezgeyên xwe yê herêmî, li gorî qanûn, adet û teqalîdên xwe idare dikirin. Vê dihişt ku Kurdistan di vê dewrê de ji alî îqtîsadî, ticarî, zirai û kulturî ve bi pêş keve.

Li vê derê em ê tesbîtên hin gerokan li ser du bajarên mezin ên Kurdistanê; Diyarbekirê û Bedlîsê bidin diyarkirin ku di dema Ahmedê Xanî de çûne li Kurdistanê geriyane û gerrên xwe nivîsîne. Xwendevan, gava van tesbîtan bixwîne wê fikreka zelaltir di heqê Kurdistana dema Ahmedê Xanî de li serê wî peyda bibe.

Sîmonê Polonî yê ku di sala 1612'an de hatibû Diyarbekirê di seyahetnameya xwe de wiha dinivîse:

"Bajar, her weki di tevayîya dewra dîrokê de, îro jî navendeka dîn û îrfanê ye... Zêrker, zernîşancî, kêrsaz, papûçsaz, cîzmesaz û erbabên zena- atên din hene û hemtayên wan bes li Îstenbolê tînin..... Gava meriv dikeve hundurê xaniyên Diyarbekirê, meriv nema dixwaze derkeve derva.

Ev, wekî xaniyên Helebê koşkên zarîf û taqbinexş in. Xelkê wê jî mirovinî gellek nazik û murefeh in, di dema xwarinê de ne ku serxweş bibin û zimandirêjîya bikin, di hemdê xwe de sakin û biedeb dimînin. Çimkî hemû jî mirovinî xwenda û zana ne, çî di sohbetan de, çî jî di kîrîn firotinê de be bi zeka û nezaket dilivin û bi zimanekî edebî diaxivin.⁴

Tavernier ku di nivê yekê yê sedsala 17'an de hatibû Diyarbekirê, pesnê sinaiya wê dide û dinivîse ku: "Marokenên Diyarbekirê hem bi reng hem jî bi deqên xwe di seriya hemû berhemên şerqê yên jî vî cinsî re ne. Li vê derê hindî maroken tên çekirin ku ji çaran yekê xelkê bajêr debara xwe bi vî karî dîke.⁵

Ewliya Çelebiyê ku di nivê sedsala 17'an de li gellek deverên Kurdistanê geriyaye û ev yek bi awayekî fireh û ûslûbek balkêş nivîsiye, di Seyahetnameya xwe de bi wê uslûba xas bi xwe pesnê şûr, mertal, rim, tîr, xencer, kêr û tiştên din yên hesinîn û polayîn, zîvkarî û zêrkariya wê (*van Bruinessen, Martin and Boeschoten Hendrik -Ewliya Çelebi in Diyarbekir 1988 r. 170*), tevnevaniya wê ya pembo û hevrişm, goşkariya wê ya ku pêlav, cîzme, papûç, meshên sextiyanîn ên rengîn, bazar û dikanên bajêr dipesinîne.⁶

Poullêtê ku di 1660'an de hat Diyarbekirê wiha dinivîse: "Çarşî û bazara Diyarbekirê mezin û hinde

sipehî ye ku li Tirkîyê mirov neşê rastî hemtayeke wê were. Hejmara bazirganên ku ji Îranê, Moxolîstanê, Polonyayê û Moskovayê tînin û hevrişm, pembo û awe sextiyanên xweşik û fewqelade dibin welatên xwe gelek in."⁷

Di tevnan de qumaşên ku ji wan re qutnî, xezeliye û mantin dihate gotin, pûşî, çitarî, manûse û cawên pembo dihatin tevinîn. Xalî, kilîm, cîcim, şal, kulav û sextiyanê rengîn ê Diyarbekirê bi nav û deng bûn. Ji sifrê Erxenyê û jî şûşê gellek awe eşya dihatin çekirin. Cawê pembo yê xîvetan yê ku jê re "Dirbakir kirbasî" dihat gotin bi kalîta xwe bêhemta bû. Ji bo lazimiyên eskeriyê dihat çekirin, ku zêde bimana jî bes bi îzn dikarîbû bihata îxracê.⁸

Ewliya Çelebî di Seyahetnameya xwe de cih dide jiyana ilmî û kulturî ya wan bajarên ku çuye wan; di vê çarçevê de pesnê şairên Diyarbekirê dide û dibêje: "Li Diyarbekirê bi sedan şu'erayên kamil ên fesîh û belîx hene ku her yek jî wan jî mîsala Rûhî û Fuzûlî ne."⁹

Ewliya Çelebî bi pesindayînek mezin behsa camî, medrese û tekayiyên Diyarbekirê jî dîke, yek bi yek navên camiyên nava bajêr dijmêre û pişt re vedigere ser medresan û xwendina ilim:

"Li her camiyên ku me li jorê binavkirin, yek, du medreseyên tehsîla ilim hene. Li Camiya Mezin, Medresa Mercaniye... Li nav aliman

rûmeteka wê ya bilind heye. Muderrisê wê li wê derê digihîje mewlewiyetê. Muderris û feqiyên wê hene. Weqfên wê gellek xurt in, wezîfeyên diyarên hucrên wê lehmiye û şem'iyeyên (istihqaqa goşt û çirayan) wê daîmî ne. Ji bilî wê li dervayî mihraba Şafî, Medresa Şafî, ev ji avadan e. Medresa Camiya Pêxember, feqiyên wê gelek in. Yekî ku li vê derê dest bi tehsîlê kiribe tu carî mehrûm nemaye. Medresa Îpariyê medreseyeka meşhûr e ku li vê derê ilmê beyan tê xwendin. Loma jî feqiyên wê di demeka kurt de bi navûdeng dibin û dibin xwedan meqam.

Piştrelî Deriyê Mêrdînê, Medresa Xusrevîye; li vî cihê ilim ilmê kelam tê xwendin. Ji ber hindê feqiyên wê gellekî sererast û rewan diaxifin. Medresa Şarûlîzade; li vê derê jî ber ku ilmê fiqh tê xwendin xelîfên wê gelekî feqîh in.

Piştrelî Medresa Şêx Rûmî [Urmîyeyî] asîtaneyeka mezin e. Şagirtên wê bi tesewîf û tewhîdê meşxûl in.

Piştrelî Medresa [ev nav di destnivîsa Seyahetnameyê de nehatiye xwendin n. m.] Li vê derê jî ilmê tefsîrê; Tefsîra Cerîr Taberî û Tefsîra Îbn-î Mes'ûd û Tefsîra Ebu'l-Leys û Tefsîra Baxawî û Tefsîra Qazî û Tefsîra Deylemî û Tefsîra Feyzullah Hindî û Tefsîra Ebû's-Su'ûd tên xwendin ulemayên musennifên fuzela yên mufessîr û mudeqqîq hene.²¹⁰

Di Seyahetnameya Ewliya Çelebî de mirov rastî gellek agahdariyên fireh di heqê Mîrekiya Bedlîsê jî tê. Li gor agahdariyên di vir de, xwiya dibe ku Xanê Bedlîsê, xwediyê nufûzeke mezin bû. 70 eşîr di bin destan de bûn. Ji wan, dikarîbû 70. 000 esker bicivandana. Merkeza mîrîtîyê, Bedlîs, yek ji bajarên şentirîn û binavtirîn ê dema xwe bû. Her çendî bi çiya û berên xwe, ji bo çandiniyê ne lihev bû jî 10.000 bax hebûn, baxê Avdel Xanî bi xwe wekî Baxê Îrem bû, tenê xurme, mûz û servî tê da nebûn. Yan ne hemî awe darên din û qesrên bilind di nav vî baxî de habûn, baxçevanên wê ji Îsfahanê, Tebrîzê û Naxîcewanê hatibûn anîn. Kanî û fiskiyên ku li vê derê hebûn li diyarê Rûmê li çu cihî nebûn. Li dora her hawuzekê jî berên hûr ên biqîmet mermerên wisa hatibûn raxistin ku weki karên sedefîn ên Hindî bûn. Li dora hawizan kaniyên ji serê şêran û ejderhayan hebûn ku avên heyatê qasî gewriya mirovî qalind tê ra diherikîn.¹¹

Ava bexçan yan bi çerxan (dolan) an jî bi amanên gir ên girover wekî kundiran dihat hilkişandin ji bo jorê.

Li Bedlîsê pîşekariya destan di qonaxa xwe ya herî bilind de bû. Di karê boyaxê û sextiyar çekirinê de gellek li pêş bûn. Bi taybetî wê demê nexişandina sextiyar gellekî muhîm bû ku Awrûpiyan hê ev yek niza-

nîbûn. Ev, dihatin ixrackirin ji bo Awrûpayê. Xusûsiyeteka din jî ew bû ku boyaxeka "esperék" a rengzerin dihat bikaranîn ku ji gul û gîha dihat derêxistin. Wekî boyaxçiyên Bedlîsiyan hesinkarên wan jî bi nav û deng bûn. Şûrên Şêxanî, Makrawî û Ziverzînî yên ku li Bedlîsê dihatin çêkirin li tu cihekî din nedihatîn durustkirin. Wekî van tîr û kevanên wan jî layiqî pesinandinê bûn.

Çuxayên ji hiriya safî yên ku li bal terziyan dihatin dirûn, hinde zarîf bûn ku meriy nedizanî ku hatine dirûn.

Li bazara Bedlîsê ya kargîr, 1200 dikan hebûn. Hemû qumaşên buha, tiştên xwarin û vexwarinê diviya biçûna ser qentara bazarê. Buhayê her malekî hatibû diyarkirin. Yaqûbîyên Xiristiyan bazirganî di destê xwe de digirtin. Ewan bi Îran û Gurcîstanê re ticaret dikirin.... Gellek xan û serayan bajar dixemiland. Ev hemû yên xanê Bedlîsê bûn.

Bendên ku av dianîn nava bajêr û 41 kaniyên ku hatibûn çêkirin di xizmeta xelkê de bûn. Ji bilî vê li der û dora bajêr 11 pir hatibûn avakirin.

Avdanî û dezgehên avê, wan gero-kên ku sedsalên buhurî diçûn li vê derê digeriyan mit û mat dihiştin. Xanê Bedlîsê bendek li ber Ava Neqlebanê ava kiribû û evder kiribû golek bendavîn kukekliser digeriyan.¹²

Ewliya Çelebî, behsa camî, mes-cid, medrese, mekteb û tekyayên Bedlîsê jî dike û dibêje ku di van

medresan de hedîs û tefsîr tèn xwendin.... 70 mekteb... 20 tekyayên neqşîbendî, Gulşenî, Bektaşî hene....

Çelebî dinivîse ku alimên Bedlîsê yên deqên esrê xwe hene û dibêje ku "yên em dinasin ev in: Molla Hesen Efendiyê Yekçeşm, Molla Zeynuddin, Mollazade, Molla Ebubekir, Îmamê Şerqiyê, Ali Efendiyê Molla Mihrabzade, Molla Cebrail, Molla Mûsa Hekkarî, Molla Israfil, Molla Muhtanî, ji hekîm û doktorên wan; Molla Mîsî, Molla Ramazan, Kara Seccah, Gencî Alî, Sarîhzade.. ustadên bêhemta ne."¹³

Piştî şikestina Evdal Xanê Mîrê Bedlîsê, li gel gellek tiştên ku tèn serê wî û xanedaniya wî, yek jê jî ew e ku mal û mulkên wî, çekên wî, kitêb, tablo û eserên neqaşiyê yên wî, li mezatê tèn firotin. Ewliya Çelebî, navê hin ji van kitêban dide. Emê li vir hinekan bi navbikin da xwendevan bikaribin bibînin ka eserên ku wê demê dihatin xwendin çi bûn:

Futûhat-î Mekkiye; destnivîseka Muhiddin Arabî, Fusûs; Muhiddin-î Arabî - şerha Fusûsê, telîfa Sari Abdullah Efendî; destnivîs, Futûhat-î Mekkiye: Qutbiddînê Hanefî, Fetihname-i Misir: bi destê Sultan Selim, telîfa katib Yûsuf Can; Milel ve Nahal, Telîfa Nûh Efendî, Menaqîba Şêx Ebû Îshaq Karzûnî, Saadetnameya Aşiq Paşa, Menasîk-ul Hac, Menaqîb-î Ewliya, Tarîxa Salih Efendî, Camî-ul Hîkayat, Tarîxa Mîr-

hand, Luxeta Lamiî, Cerîdet-ul Aca-
 îb, Mîr'atê Kaînat, Tarîxa Teberî,
 Qanûnname Latîfî Paşa, Tarîx-î Xa-
 zawat-î Sultan Mûrad Xanê Rabi',
 Tarîxa Peçewî, Rîsale-î Aqâidî Kemal
 Paşazade, Şerha Kûsûnîzade, tercuma
 Mîr'at-î Kaînat, Taqwîm-ul Buldan,
 Tarîxa Sukkerî, Tarîxa Misrê ya
 Şahab Çelebî, Futûhatê Misir a Îbn
 Abdulhalîm, Fezail-î Misrî ya Amr-
 ul Kebedî, Kîtab-î Îbn-î Dolak,
 Kîtab-î Îbn-î Yesîr, Kîtab-î Mesalîk
 a Îbn-î Fadlullah, Kîtab-î Menahic-
 ul Îber, Siyerê Nebî ya Nûh Efendî,
 Siyerê Nebî ya Weysî Efendî, Waqia-
 name ya Weysî Efendî, Tarîx-î Saha-
 be, Tecrd-î Sehabe ya Zehebî, El
 Asabe fî'l Marîfet-us 'Sahabe, Kîtab-
 ul Huffaz a Zehebî, Tabaqat-î Şafiye,
 Tabaqat-ul Malikiye ya Îbn-ul Fer-
 hûn, Tabaqat-i Şaranî, Tabaqat-ul
 Hanefiye, Mîr'at-î Zeman, Kîtab-ul
 Bedayî ya Îbnî Kesîr, Camî ya Kebîr,
 Camî ya Sexîr, Enwar-ul Aşiqîn,
 Tuhfet-ul Ebrar û Kelîle û Dimne."¹⁴

Lê mixabin xwiya bû ku êdî Kur-
 distan hatibû dawîya vê qonaxa bilind.

Çimkî Osmanî ji ber paşdeketin
 û şikestinên xwe yên di şeran de, dest
 pê kiribûn pirtir bela xwe di mîr,
 paşa û xelkê Kurdistanê didan. Çimkî
 statuya ku hebû, nedihîşt ku Osmanî
 li gor kêfa dilê xwe dest deynin ser
 dewlemendiyên Kurdistanê, esker,
 xerac û vêrgiyan û dewlemendiyên
 ser erdê û yên bin erdê ji bo xwe
 bibin. Loma jî dixwestin statuya ku

di 1514'an de hatiye danin bigu-
 herin. Ji ber vê hindê jî hem li
 bahanan digeriyan û hem jî dawa
 tiştên zêde dikirin. Dema ku Ahmedê
 Xanî êdî xortekî ciwan bû, êrîşên
 paşayên Osmaniyan jî êdî li ser mîrên
 Kurdan gurr dibûn. Di 1655'an de
 Melik Ahmet Paşa, mîr û paşayên
 der û dora Mîrîtiya Bedlisê jî da dora
 xwe û hucûmek bir ser Evdal Xanê
 Mîrê Bedlisê. Mîr şikest, reviya, kurê
 wî li şûnê bû mîr. Gerçî piştî salekê
 Evdal Xan cardin hat ser hakimiya
 Bedlisê lê statuya Mîrîtiya Bedlisê di
 1670'yan de bi temamî hat rakirin¹⁵.

Statuya Mîrîtiya Hekariyan jî di
 1688'an de hat rakirin. Berê huku-
 metek bû, hat guhertin bû "ocaklık".¹⁶

Tavernierê gerrok, di dema gerra
 xwe da dibe şahidê bûyerekê ku bi vî
 awayî neqil dike:

Paşayê Erzurûmê, wan 12.000
 leşkerên ku Padîşah ji bo şerê Qan-
 diyayê daxwaz kiribû, neşandibû.
 Kapûciyê ku fermana îdama wî li gel
 xwe anîbû, ya îdama paşayê Qersê jî
 anîbû ku 6000 esker neşandibû. Ez
 li gundekî rastî Kapûcîbaşî hatim ku
 vedigeriya Îstenbolê. Wî her du serên
 wan paşayan nîşanî min da ku di
 çenteyekî de dibir ji padîşahî re.¹⁷

Buyerên bi vî awayî, neliheviya
 mîrên Kurdan, bikaranîna wan li
 hemberî hev, destpêbûna berfireh-
 bûna têkilhevî û bêîstîqrariyan, şopa
 xwe li ser fikrên qewmî û civakî yên
 Ahmedê Xanî hiştine.

Ahmedê Xanî, gava Mem û Zînê dihûne xwiya ye ku li Bayezîdê ye. Bayezîd ji destpêka 1514'an sancaçek e ku girêdayî bi Mîrê Mîran ê Wanê ve ye û mîrê wê jî tum ji alî hukumeta merkezî ya Îstenbolê tê tayinkirin. Gerçî pirê caran ev mîrekî Kurd e lê ne hukmê wî, ne jî mafên wî qasî yên wan mîrên xwedan hukûmet nabin. Bayezîd bi vî awayî heta sala 1828'an geh girêdayî bi eyaleta Wanê geh jî bi ya Erzurumê welê diçe. Bayezîd sancaçek serhedî jî ye ku gellekî dibe şahidê şerê navbera Osmanî û Îraniyan. Ahmedê Xanî, li gellek deverên Kurdistanê; wekî tê gotin li Bedlisê, Xelatê, Ruhayê û Cizirê jî maye, çûye Misrê û hecê. Kurdistanê ji nêz ve bi tevayî nas dike.

Ev buyer, hemî dibin hevîrê fikrên Ahmedê Xanî. Ew, rewşa dema xwe wiha dibîne:

*Xasma di vê esrê da ku himyan
Maşûq û hebîb e bo me hemiyan*

*Yanî ji timayê dirav û dînar
Her yek ji me ra we bûne dildar*

*Ger ilmê tamam bidî bi pûlek
Bifroşî hîmmetê bi solek*

*Kes nakete meyterê xwe Camî
Ranagiritin kesek Nîzamî*

Ew, miletê Kurd miletekî bindest dibîne:

*Emma ji ezel Xudê wisa kir
Ev Rûm û Ecem li ser me rakir*

...

*Ez mame di hîkmeta Xudê da
Kurmanc di dewleta dinê da*

*Aya bi çi wechê mane mehrûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm*

*Wan girtî bi şîr şehre şubret
Tesxîr kirin biladê himmet*

*Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mîrekî wan bi rezmê Rustem*

*Bi fikir ji Ereb heta ve Gurcan
Kurmancî ye buye şubhê burcan*

*Ev Rûm û Ecem bi wan hesar in
Kurmanc hemî li çar kenar in*

*Her du terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeza kirîne amanc*

*Goya ku li serhedan kilîd in
Her taîfe seddek in sedîd in*

*Ev qulzemê Rûm û behrê Tacik
Hindî ku bikin xurûc û tehrîk*

*Kurmanc dibin bi xûn mulettex
Wan jêk vedikin mislê berzex*

Ahmedê Xanî sedemê vê rewşa xerab jî bi vî awayî nîşan dide:

*Cwamêrî yû himmet û sexawet
Mêrinî û xîret û celadet*

*Ew xetme ji bo qebîlê Ekrad
Wan dane bi şîr û himmetê dad*

*Hindî ji şeca'etê xeyyûr in
Ew çend ji minnetê nefûr in*

*Ev xîret û ev 'ilûwî himmet
Bû maniê hemlê barê minnet*

*Lew pêkve hemîşe bêtişaq in
Daim bi temerrud û şîqaq in*

Ahmedê Xanî berpirsiyarê vê rew-
şê Mîr û rêberên Kurdan dibîne:

*Tebeîyyetê wan egerçî 'ar e
Ev 'are li xelqê namdar e*

*Namûs e li hakim û emîran
Tawan çî ye şair û feqîran?*

Ahmedê Xanî tenê rewşê diyar
nake, li gorî xwe çareyan jî nîşan
dide:

*Ger dê habûya me ittihadek
Vêkra bikira me îngîyadek*

*Rûm û Ereb û Ecem temamî
Hemiyân ji me ra dikir xulamî*

*Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ilm û hikmet*

*Temyîz dibûn ji hev meqalat
Mumtaz dibûn xudan kemalat*

*Rabit ji me jî cîhan penahêk
Peyda bibîtin me padîşahêk*

*Şîrê hunera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn*

*Derdê me bibînitin ilacê
Îlmê me bibînitin rewacê*

*Ger dê hebûya me serfirazek
Sahibkeremek suxennewazek*

*Neqdê me dibû bi sikke meskûk
Nedîma wihe bêrewac û meşkûk*

*Her çendî ku xalis û temîz in
Neqdeyn bi sikke ezîz in*

*Ger dê hebûya me padîşahêk
Layiq bidîya xudê kulahek*

*Te 'yîn bibûya ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek*

*Hasil bibûya ji bo wî tacek
Elbette dibû me jî rewacek*

*Xemxwarî dikir li me yetîman
Tînane derê ji dest leîman*

*Xalib nedibû li ser me ev Rûm
Nedibûne xirabeyê destê bûm*

*Mehkûmê Elîyye û sealik
Mexlûb û mutîe Turk û Tacik*

Riya serketinê jî li gorî wî ev e:

*Herçî bire şîrê destê himmet
Zebt kir ji xwe ra bi mêrê dewlet*

*Lewra ku cîhan wekî erûs e
Wê hukum di destê şîrê rûs e*

*Lê eqd û sîdaq û mehr û kabîn
Lutf û kerem û e'ta û bexşîn*

*Pirsî ji dinê min ev bi hîkmet
Mehra te çî? Gote min ku himmet*

*Hasil ku dinê bi şîr û îhsan
Teskîr dibit ji bûyê însan*

Heke dewlet, serdar û muese-
se tunebin, medeniyet, hedaret û kultu-

ra meriv qîmetê nabîne:

*Ger dê hebûya me jî xudaneke
Alî keremek letîfe danek*

*Ilm û huner û kemal û îz'an
Şiir û xezel û kîtab û dîwan*

*Ev cins biba li bal wî me'mûl
Ev neqd biba li nik wî meqbûl*

*Min dê elema kelamê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn*

*Bînave ruha Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî*

*Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimaya heyran*

Lê Ahmedê Xanî gellekî xemgîn
e ku xan û dewlet nînin, loma jî
qîmeta hunerê wî û yên wekî wî
nayên zanîn, bi keserek mezin dibêje:

*Çi bikim ku qewê kesad e bazar
Nînin jî qumaşê ra xerîdar.*

¹ Ev nivîs cara pêşîn di semînera jî bo sêsed saliya nivîsîna Mem û Zîn a ku di 26.2.1995'an de li Stockholmê li ser Ah-medê Xanî hat dayîn. Piştî hatiye firehkirin û li vê derê çap bûye.

² Holmberg, Åke; Vår världs historia -från urtid till nutid-, Natur och Kultur, r. 290-291

³ Bonniers världshistoria, Bonnier Fakta Bokförlag, 1985, c. 12, r. 9-14

⁴ Hrand D. Andreasyan, Polonyalı Sime-on Seyahatnamesi (1608-1619), İs-tanbul, 1964, r. 98-99, yê jê hatiye wergirtin: Beysanoğlu, Şevket; Anıtları ve Kitabe-leriyle Diyarbakır Tarihi, Neyir Matbaası, Ankara, 1990, c. 2, r. 675

⁵ Beysanoğlu, Şevket, r. 675-676

⁶ Beysanoğlu, Şevket, r. 676

⁷ Pouillet, Nouvelles relations du Levant, Paris, 1688, c. 2, r. 415 û dewama wê. Ji Beysanoğlu, Şevket, r. 676

⁸ Beysanoğlu, Şevket, r. 676

⁹ van Bruinessen, Martin & Boeschoten Hendrik, Evliya Çelebi in Diyarbakir, 1988, r. 158

¹⁰ van Bruinessen, Martin & Boeschoten Hendrik, Evliya Çelebi in Diyarbakir, 1988, r. 142

¹¹ Mehmet Zilli oğlu Evliya Çelebi, Evliya Çelebi Seyahatnamesi, Tirkîya wê: Zuhuri Danışman, Kardeş Matbaası, 1970, c. 6, r. 186-192

¹² Köhler, Wilhelm; Evliya Çelebi Seya-hatnamesinde Bitlis ve Halkı, Tirkîya wê: Haydar Işık, Alan Yayıncılık, İstanbul, 1989, r. 42-47

¹³ Mehmet Zilli oğlu Evliya Çelebi, Evliya Çelebi Seyahatnamesi, Tirkîya wê: Zuhuri Danışman, Kardeş Matbaası, 1970, c. 6, r. 176-182

¹⁴ Mehmet Zilli oğlu Evliya Çelebi, Evliya Çelebi Seyahatnamesi, Tirkîya wê: Zuhuri Danışman, Kardeş Matbaası, 1970, c. 6, r. 306-307

¹⁵ Yurt Ansiklopedisi, Anadolu Yayın-cılık A. Ş., 1982, c. 2, r. 1392

¹⁶ Yurt Ansiklopedisi, Anadolu Yayın-cılık A. Ş., 1982, c. 5, r. 3311

¹⁷ Tavernier, J. Baptiste, Les Six voyages, Paris, 1682, neqil ji Yurt Ansiklopedisi, c. 4, r. 2720

KELBEŞ ÇI YE W BE KÊ DELÊN?

Seîd Kawe

Be hoy propagendey nawçe, Kelbeş wek ayîn nasrawe. Le nawçekanî Şino; Sindus, Lacan her ke nawî Kelbeş hat, dest be cê lezeyn û mêşkî gwêgir da, wek destê w grûp û firqîyekî taybetî û dij be Îslam cê degrê. Ewendey propagend le ser gutrawe w bilawbotewe, temanet jin û mindalîş le nawçekanî baskiraw şarezay ew wişe yen û lêy bêgane nîn.

Katî xoy **Mela Resûl Zendî**, şairî be nawbangî Kurd, ke be nasnawî "Edîb" şîrî gutûwe, le gundî Şawele w Peswê dersî be kuranî **Marif Axa w Qerenî Axa** gutûwe w mîrzayan bûwe. Nawbiraw pîyawêkî helkewtû w lêzan û rûnakbîrî dewranî xoy bûwe. Legel eweş da ke wek mamosta dersî gutuwe w mûçexorî axa bûwe, lew la w lew la, legel dostaşnakanî, zulm û zorî axawatî dawete ber bas û rexne w ta ew cêgayey boy liwawe xelkî rûn kirdotewe. Axakan katêk şitekanî **Mela Resûl**yan bîstotewe, propagandiyan bo bilaw kirdotewe, gutuyane: Mela Resûl birway be ayînî Îslam kem e, bo ye bas-man deka, edî bo melakan pêman nalên zalim û...

Dîyar e lew serdem da melakan le layen axa we bo melayetî radegîran, berat û serfitreşyan be werzêrekan deda.

Le şerî duhemî cîhanî w hatinî Rûsekan û serheldanî bîrî komunîstî w pêkhatinî Komarî Kurdistan le Mehabad, binemaley **Zendî** aktîvtir û helsurtir hatûnete meydan û pitir xerîk bûne.

Mela Qasim Zendî ke yekêk le melabaşekanî nawçe bû, be hoy rûnkirdinewe w qisey heq, kem wa bû dû sal le gundêk raygirin. Axa têt

heldepêça w derdekra. Nawbiraw endamî **Komeley J.K.** û diwayî endamî **Hizbî Dêmokrat** bû.

Mela Qasim le ber qisey heqkirdin û rûnkirdinewe, kemtir le gundîgewre w axay bedesthelat radegîra. Mela Sadiqî Zendî biray Mela Qasim bû, axakan pitir dijî nawbiraw bûn ta Mela Qasim û pitiriyên propagandî "Kelbeş" le ser dekird û le Mela Qasim pitir le ser zemanan bû. Sadiq Zendî mela nebû, be xwêndewariyekî kemî nêw feqêyan şîrî degut. Be Farişî w Turkî w Rûsî şîrî heye. Nawbiraw endamî Hizbî Demokrat bû. Zorim hatûço dekird. Katêk pê m degut: *Waz lew têk helkêşane bêne w şîrekanî her be Kurdî bilêy.*

Le welam da deygut: *Kake bive ye, katê boy werdegêramewe.* Rastî dekird û le zemanî Şa da besî serbûştî wa bigutrê. Nawbiraw ezîyet û azarêkî zorî le ser Kurdayetî çêst. Dû car çote zîndan û carêkîş bo mawey dû sal bo germesêrî Bender Ebbas dîr xirawetewe w dest be ser bûwe. Tenya tawanî nawbiraw Kurdayetî w hawkarî Hîzb bûwe.

Salî 1363 hetawî, le gundî Bayzawê be destî Kurdî xomalî ke le Êran penaber bûn û we pêş pasdar kewtibûn, le xora taqey lê deken û le temenî 70 salî da şehîd dekrê. Bew hîwaye şîrekanî her mabin û le dest neçûbin û çap kirabin.

Her wek amajem pê kird diway Komarî Mehabad, be taybetî le dewranî Hikûmetî Dr. Mihemedî Sedîq da berberekanî dijî derebegayetî le Kurdistan peray sandibû. Xebat û milmilaney werzêranî nawçey Şamat û çomî Mecîdxan û dewrberî Bokan û berî Begzadan, her weha karesatî girtin û kuştin û talan û awarebûnî gelêk binemaley xebatgêr. Axakan be hoy propagandî jehrawî meseley "Kelbeş" yan pitir zeq kirdewe w ew kesaney tê dekoşan hawîştibûyane ser zemanan û pitiriyên beyt û balorey bêdînî bo saz dekirdin.

Axakan be kelk wergirtin le ayin ke hemîşe bo çewsanewey hejaran kirdûyanete super, xebatgêranyan be nêwî "Kelbeş" dekuta, bo ewey qisey têkoşeran zor le ser xelk şwên danenê w kem bir bika.

Şehîd Sadiq Zendî çend çaran gîrawe w kewtote reşçalekanî rijîmî Pehlewî.

Meseley rûnakbîrî binemaley Zendî ke be "kelbeş" nêwiyan der kirdibû, her le nawçey Sindus û Lacan û Şino newesta, belkû bo nawçekanî tîrîş regajoy kird. Ew kesaney ke le jêr nawî Kelbeş da kewtibûne ber hirujm û propagandî jehrawî axakan û be bêdîn be xelkan denasandin. Min beşî here zoriyanim denasîn.

Yek: **Mîrza Mirad** le gundî Qereseqel pîyawêkî helsûr û endamî komîtey şaristanî Şino bû.

Dû: **Derwêş Wisû** ke destî şêirî hebû, wek layengir hatûçoman dekird û yarmetî deda be Hizb.

Sê: **Hemze Aşewan**, malî le gundî Peswê bû. Nawbiraw yekêk le dostanî Hizb û binkey kadire nehênîyekanî Hizbî Demokratî Kurdistan bû.

Çwar: **Westa Ehmedî Necar Kemalî** le Sergîz bû. Berpirsî ser şane bû. Hewelîn carim bû legel Mîrza Mirad bo serdan le şanekan çûme malî Westa Ehmedî Necar. Dway xwêndinewey beyanname w hendêk witûwêj, pirsîm:

– Erê rast e delên meseley ”**kelbeş**” le to ra serçawey girtûwe?

Pêkenî û gutî: *”Axa zalim in birale, her çî pêyan xoş bê wek çeqqe pêmanewe denûsênin”, le nûkewe boy gêramewe, gutî: ”Katêk malim hate ew gunde, wate Sergîz, kelêkim bû nêw çawanî sipî bû. Bo xot dezanî be kelî nêwçawan sipî delên beş, le dêhatîş zû paşnawêkit bo dedozinewe. Her rojî duhem bîstîmewe, be nêwî malî Westa Ehmedî Kelbeşman heldeden. Aşna w dost û refîqekanî minîş beşî zoryan ya hizbîn yan le xelkî dîke aqiltir in. Ewe nêwî Kelbeşîyan we diwa xistûyin û pêyan kafîrîn! Min ke le nêuyan da w lêyan nêzîk bûm, ta ew kate nemdezanî mesele w binç û binewanî Kelbeş le kwê ra hatûwe.”*

Neferî pîncim û meşhûr be ”Kelbeş” **Westa Ehmedî Asinger** bû. Kurî Haçî Mistefa ye w le binemaleyekî xoşnêwî ayinî ye. Malîyan le gundekanî Peswê w Derbend û Nezêmes û ... bûwe. Westa Ehmed pîyawêkî pir û le serexo w têgeyîştû bû. Fişarî axakanî nawçe naçariyan kird maliyan biçête Nexede w xerîkî karî asingerî bin. Nawbiraw le salî 1331 hetawî ta destgîrî payîzî 1338 berpirsî komîtey şaristanî Nexede bû. Nawbiraw wek hawrêkanî gîra w kewte jêr azar û eşkence w pitir le sê sal le zîndanî Qesir bû. Dway hatinederî le zîndan dîsan dijî rijîmî Şahenşahî destî kirdewe be xebat û berperekanî. Bo carî duhem le salî 1347 hetawî gîra w le padiganî meşhûrî Celdîyan kewte jêr lêdan û eşkence w dira be dadgay nîzamî.

Dwayî salêk û çend mang le zîndanî ”Celdîyan” û ”Felek el-Eflak” mawe w diwayî 14 mangîyan bo wistanî girmesêrî Kirman dûr xistinewe. Diway azadbûn û geranewe, le barî tendurustî w leşsaxî şikaw û pîr bibû, belam le barî rûhîyewe her detgut negîrawe w zor le pêşû bew retir û dilqayimtir û be hêztir bû. Kak Ehmed Ahingerî ta ew katey mabû w henasey heldekêşa, le têkoşan, diwayeş le rûnkirdinewe ranewesta. Nawbiraw salî 1989 wek hemû xebatgêranî Kurd awatekanî ke azadî w serbestî neçewey Kurd bû, debate bin gil û dilegewrekey le kar dekewê w malawayî le dostan û hawrêyan dekat. Lew dewrane da ke axakan Westa Ehmedîyan wek bîr û mêşkî ”Kelbeş” dana bû,

hawrêbendîyekanî başîyan denasî w zoryan rêz bo dadena w boyan rûn bibowe ke ew kesaney pêyan delên "Kelbeş" mirove xebatgêr û nersekan in ew nêweyan bo dataşîwin. Bo eweş bilêyn Kelbeşekan cige le berberekanî zulm û zorî derebegekan karî rûnkirdineweşyan we stoy xoyan girtibû, ke dekrê bilêm lew dewran da fire pir metirsî bû. Wate teblîxat dijî talanî şêx û xelîfe w herweha dijî koneperistî w şitî pir û bûç ke hêndêk melay nexwênwar wek paşko be ayinî Îslamîyanewe nûsandiwe. Le rastî da Kelbeş rûnakhîrî ew katî wilatî ême bûn û be hoy şîir û helbest zor kesyan bo xebatî dijî derebegayetî w dagîrker rûnkirdewe.

Helbeste handere w bizwênerekaniyan wek goranî hejaranî nexwêndewar le beryan dekirdin û dîyaengutnewe.

Le kutayî da be helbestêkî ew serdemî, Mela Seyid Elî be nasnawî "Remzî" kutayî be basî "Kelbeş" dênim.

Terîqetî îmro

*Îmro terîqet bo raw û rût e
Metlûbiyan mal e w tehsîliyan qut e
Îmro terîqet bo goşt û pilaw e
Hazey semawer kuftey naw taw e
Emro terîqet bo jinî ciwan e
Bo ferşî rengîn bo balexan e
Îmro terîqet bo eskîn nas e
Maşîn û radyo brîqey libas e
Erê ya şêxgiyan bo xatirî Quran
Milk û pêkirîn laçan le nêwman
Ewey we rû girt girdim û aza bê
Topey le serken rû w le Xuda bê
Talantan kirdin be zulm û nuşte
Cerg û encinîn wekû herîşte
Rojêk dê hejar destî helênê
Dezga w dûkan û têk birûxênê*

Remzî

Wa be bilawkirdinewey xezelêkî pir le ewîn û xoşewîstî Mela Resûlî Zendî "Edîb" yadêkî lê dekeyn.

Çaweket mest e, benaheq fêrî meyxaney meke

Lêygerê mexmûrî bezmî durdî peymaney meke
Zulfi sazawit desa tertîb û çînî têt mede
Heyf e tûştî cewrî rîş û kêştî lerzaney meke
Perçemit cêy aşyaney bulbulî tebîî min e
Çunke kêşkiçî şew e, to menî hêlaney meke
Gerdinim pêy xoş e helqey tay tenafî zulfeket
Çawekem îtir hewaley tewq û zolaney meke
Dil be meylî xoy demêke aşiqî balaket e
To Xuda mayil be xeyrî xot û bêganey meke
Her le ewel to dilit birdûm be nazî çaweket
Taze fêrî rawresmî tebî perwaney meke
Aşiqî xonçey demit ta key debê aware bê
Mehremî raz e hewaley çol û wêraney meke
Xot dezanî wek Edîb kes bendegî pê nakirê
Wa be riswayî le naw em xelqe efsaney meke.

Edîb

**Wergera ji herfên Erebî bo herfên Latînî:
Mahmûd Lewendî**

BIRAY Û LACÊ ŞÊX SE'ÎD EFENDÎ¹


Cigerxwîn

(.....) Şêx 'Evdirehîmî²-vatinî³ "Şêx Efendî³, vatişê Xalid Begî⁴ ser o û bi name bê Îrşadî⁵, hetey Pîranî ra şînî. Roj bi roj mirîdî, dostî û embazê Şêx Efendî norûdora yê (cê, ci) di kom bînî. Begî, axay, şêxî û melay yê reyra dewan ra geyraynî. Gelekî mêrdimê pîlî ameynî yê hetî û yê nînitikî pê mişewriyaynî. Labelê dewêk⁶ - 'Evdirehemî namey ya zî vatinî- di çend peyeyê perrayey (mehkumî)⁷ ki dewleti yê waştinî û eskerê Tirkî yînî dim a geyraynî, amey Şêx Efendî hetî. Eskerê dişmenî yînî dim a amey a dewî û Şêx Se'îdî ra va 'Ma hetanî ki nê perrayan xwî di nêberî, ma dewî ra nêşonî'. Şêx Efendî, pêrû day destê eskeranê dişmenî.

Labelê na mesela weş bê mi nêşî ki eskerê Tirkî, nê çendi mêrdimanê erjayeyan ma dest ra bigîrî û berî zîndan yan zî bikişî. Aw samed ra mi çend mêrdimî xwî di berdî û ma şî vernîda yînî. Ma ay çend mêrdimî, ebi zorî reyra eskeranê dişmenî ra girewtî û ma Tirkî ra çend tenî kiştî. Eskerê dişmenî amey ma ser di. Herçiqas ki vernî di Şêx Efendî hêrs bi zî, la tira pey mecbur bi, ferman vet ki ma sere hewa dî.

Ebi inhewa cengî dest pa kerd. Vernî di, êrîşanê Kurdan sêney welatî seqna û dişmen peyser açarna. La peyeyanê sey 'Emerê Faroy⁸ timû vatey Şêx Efendî nêkerdî û cengêko xwiserkî kerdinî."

(.....) Rojêk melayêk ame camî.⁹ Pilêşê çakêtê xwî xwî ro pîştî û ma miyan di cematî ronîşt û va "Namey mi Mela Mehemed o". Wîna va, dest bi persan



► Şêx Mêhdî
(birayê Şêx Se'îdî)
(Fotograf ji Şoreş Zîrek hatiye girtin)

kerd û va "Şîma kotî (ça, kura) ra amey tiya? Haco Axa¹⁰ Cizîri di se keno? Tirkî hema zî te' da û zilm şarî kenî?"

La embazanê ma ra yew ti ra persa û va "Raşta zî eke ti mela yî, ti ko ma rê îslenqa¹¹ îzeh bikî, senêhewa biya îslenqa?" Mela Mehemedî nê vatişdê yê ser o tena va "Ez aha wina biko îslenqada to! Ez K, r, d¹² geyrena lawo!" Ez werîşt a pay, mi destê yê tepîşt û mi va "Ay mêrdimo ki ti bide persenî ez a". Ma piya teber kewtî û teber ra mi ti ra va "Ez Cigerxwîn a, ez wazena to bişinasna veynî ti kam î."

Mela Mehemedî ez berda keydê xwi, mi rê wer ard, çay viraşti û va "Ez Mehemed Mehdi¹³, birayê Şêx Se'îd Efendî ya". Ma newe ra lewî pê ra şî û bermay. Raşta zî, hema gama ki mi yew Key Şêx [Se'îd] Efendî ra bidînî, heze ki ez lacê Elî¹⁴, lacê Huseynî¹⁵ veyna, [yê] mi rê ay hewa pîrozî (muqeddesî) û erjayey bî.

Mehdî mi ra va "Mi paseportê xwi virašto ki ez şêra Cizîri, Haco Axay hetî. Ez wazena nika to rê zî yew vejo ki ma piya şêrî Haco Axay hetî, beno ki ma bişt newe ra dest bi yew serehedayîşî bikî. Vanî Haco Axa gelekî xurt û pîl o". Labelê mi vatişdê yê ser o va "Rast a, Haco Axa mêrdimêko pîl bi, la ewro dekweto binê destê Frensa û nan yê dest nêkeweno. Şiyayîşê to yê Cizîri di, karê Kurdan çîno. Eke ma bişînî tiya bixebetî hina rind o." La Mela

Mehemedî, pîzze ra hesrêki anti û va "Tiya ra zî çî nêvejîyêno Cigerxwînê mi! Eke ma xwi rê nêbî, havila çî kesî ma rê çîna Seyday mi! Ganî (lazim o) Kurdî xwi rê bibî ki şar zî bişîyo desta ma bigêro. De xwi hadire biki ki ma şêrî Cizîri". La vatişdê yê ser ra mi de rê rast û roşn va "Ti Kurdanê Cizîri miyan di nişnî tena yew mêrdimê pankî zî bivînî. Heme dizd, mêrkuj û talanker î... Ez nika yînî hetî ra yena. La Îraq di mêrdimê sey Seyîd Tahay¹⁶ estî ki şênî heme çî biki". Mela Mehemedî ebi fekweşey mi ra va "Wina aseno ki ti nêwazenî ageyrî. La senêhewa bibo zî ez ko şêro."

Mehemed Mehdî Efendî şî Cizîri û ma Mûsil di mendî.




(.....) Şêx Elî Riza¹⁷ -Jacê Şêx Se'îd Efendî- û Fehmî Efendiyo Liceyî¹⁸ mêmanê Seyîd Tahay bî. Labelê Fehmî, Seyîd Tahay ra weş nêbi û vatinî "Çirê şorbaya marcî dano ma?" Fehmî û Elî Riza timû tê qiriki kewtinî. Elî Rizay vatinî "Ma ebi serran o keydê yê di yî, nişno hezey mêmanan qedr û qîmet bido ma." La Fehmî vatinî "Xwi ra to û bawkê (pêrê) xwi, bi na softîyeyda xwi key ma xerepna. Teyarey ameynî seredê maser, bawkê to vatinî 'Wardê ma pêrû piya nimac biki' û qala 'Emerê Faroy goştaritinî û yê dim a şînî'".



(.....) Labelê nika ez Îraq ra ameya û ez dewa Tilşêiri di ya. Haco Axa û Emînê Ehmedî¹⁹ dewa Dugiri di yî. Şêx 'Evdirehîm, birayê Şêx Se'îdî newe degeyravo amewo Binê Xeti û wazeno mi bivîno. Dosere ra mêrdimêk ame dewi û mi ra va "Haco Axa Dugiri di yo, wazeno to veyno". Ez mecbur biya rayir kewta şîya. La Dugiri ra naşt, ez raştê otomobîlêk ameya. Haco Axa, mi ra persava "Suxte, namey to bi xeyr?" Mi va "Ez Cigerxwîn a axa, ez ameya to hetî". Şêx 'Evdirehîm kişta Haco Axay ra peye bi û ame ridê mi, berma û va "Rast a, to bira û birazay²⁰ mi weşî dîy?" Haco û Emîn zî peye bî, amey ridê mi, ez otomobîli wenaya û ez xwi reyra ageyrnaya Dugiri. Ma odî ver di peye bî. Şêxî dest bi persan kerd. Mi yê rê derg û dila behsê dînî, hal û weziyetê bira û birazayanê yê kerd. Çar mecîdey day mi û va "Mi hetî perey vêşî nêmendî ki ez hina vêşî bida to". La ez huwaya û mi va "Şêx Efendî, ez nêwazena peranê to bigîra". La Şêxî mi ra va "Eke ti nêgîrî xatirê mi maneno". Cûra mi perey dekerdî tanekda xwi. Ebi otomobîli ez Tileşîri resnaya.

Şêx 'Evdirehîm, mêrdimêko siyatale bi. Riy yê derneyin û sey rengê kerranê (siyanê) keyenan bi. Mêrdim qirmîçanê çaredê yê ra tersaynî. Reyeyê



► Şêx 'Evdirehîm
(birayê Şêx Se'îdî)

canmêrdey pîrnîki û çaredê yê ra asaynî.

Şêx 'Evdirehîm, Mehemed Mehdî, Tahîr²¹ biray Şêx Se'îd Efendî û lacê Şêx 'Eliyê Paloy²² bî. 'Elî Rîza, Xiyasedîn û Selhedîn²³ zî lacê Şêx Se'îd Efendî bî. Ez nînan tena şînasnena, la eke sewbî zî bibî, mi ra nêamewo vatiş û mi nê tena dîy.²⁴ (.....)

Reya Diyini Mehemed Mehdî

Verî ki ez bizeweciya ez Amûdi di biya. Zeweciyayîşî ra pey zî ez reyna şînî Amûdi ki wendişê xwi biqedêno, Kurdeya (Kurdperwewereya) xwi vila bika.

Nîşka ve ra Mehdî asa. Ma timû piya rûniştinî û geyraynî. Labelê rayêk ciwananê Amûdi ser o ma day ronîştîş, firtiqalêk day mi dest û yew zî xwi rê verday. La ez çî zana firtiqalî çî yî û senê weriyênî. Şîma şênî vajî ki "no mêrdimo gepraye senê firtiqali nêşinasneno?" La bawer bikî ki mi nêzanaynî senê weriyêna zî! Rayêk werdêkey di mi qaşîkê yînî yaban ra, rayîrî ser o dî û antî pêser, berdî keye day maya xwi. Maya mi va "Baş o, ma ko bikî kincanê (cilanê) to miyan ki boya yînî tira bêra". La hetanî a gamî, a gama ki Mehdî firtiqalî daybî mi dest, mi hema nêdîbî.

Mi nêzanaynî senê bişikna. La semedo ki ez koyî nêbiya, ez pawibê Şêxî vindarta. Senê yê kardiya xwi veti û firtiqala xwi ser o kerdi, mi zî kardî ci

ra girewti, firtiqala xwi ser o kerdi û sey yê wardi.

Şêx Mehdî, ez yewrayî di hewnê keyenperestey ra hêşyar kerda û rayêk di ay ters û gumanî serey mi ra durî vistî. Warey dîndarey di çimê mi akerdî. Gelekî çiyê ki kesî nêewtanabi vajo, mi ra vatî. Heme çî dînî nawitînî. Roşney eştî fikir û bawereya mi ser. No xusus di ez deyndarê şêxê xwi ya.

Mehdî, mi ver di qirrika seyday mi girewtinî û vatinî "Ma senê 'Eysi ra bawer bikî ki vana 'rojêk mi mûnda Mehemedî bestinî, mûndi mi dest ra amey.' Gelo rast a, Mehemed bêgoşt û estey bi? Yan ya nege bide kena? Mehemed Qur'an di vano 'Ez mêrdimêko sey şima ya'." La seyda hêrs bînî û vatinî "Ti bi qirbanê gorrê Şêx 'Elî bî!" La yo huwaynî û vatinî "Pîzzey mi gelekî to veşeno".

Ez û Şêx 'Evdirehîm zî ma Amûdi di piya mendînî. La yû hezey Mehdî bêdîn nêbi. La canmêrdey ti ra varaynî. Mi ci rê rêza (sîlsîla) Neqşibendî hedirnaybî, la ez nêzana çi serî ser di ame?

Kurmanckî ra tadayox:

J. Espar

Notê J. Esparî

¹ Mi no nuşte, xatirayanê Cigerxwînê rehmetî ra tadawo. No kitab hema çapi ro nêginawo. Weşanxaney "Apec Tryck och Förlag"î ko demeyêko kilm (kirr) di nê kitabî bi name bê "Jînenîgariya Min" bido çapi ro.

Namey nê nuştî, mi pana.

² Şêx 'Evdirehîm ('Ebdirehîm) biray Şêx Se'îd Efendî yo. Yû, serehewedayişê Şêx Se'îd Efendî di, qumandanê cepheê Erxenî beno. Çêrmug, Erxenî û Me'denî yû eskeranê Tirkî ra gêno. (Biewnî Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh ve Devlet, Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi, Öz-Ge Yayınevi, Ankara, r. 356-357

-Nureddîn Zaza, Bir Kürt Olarak Yaşamım, Mezopotamya Publishing, Huddinge/Sweden, Mart 1995, r. 40)

Şêx 'Evdirehîm, Herbdê Şêx Se'îd Efendî ra pey şono Binê Xeti. Tira pey wexto ki Hukmatê Tirkî 1928 di 'ef vejeno yû zî ageyreno yeno Kürdistanê Tirkîya. La semedo ki bawereya yê Hukmatê Tirkî çîna, Koyê Sipî di dewa Sirîn di maneno.

Rojê çarinê menga (aşma) Adara 1932 di, eskerê Tirkî erzenî Sirîni ser, wazenî Şêx 'Evdirehîmî bikişî. Şêx û peyeyê xwi, ver a eskeranê Tirkî lej kenî (danî pêro). No lej di, new eskerê Tirkî kişiyênî û hîrêsenî zî birîndarî benî. Polê Şêxî ra zî yew kişiyêno û yew

zî birîndar beno. Na de'wa ra pey Şêx 'Evdirehîm reyna şono Binê Xeti. Ayca (weyra) di yew demewo derg maneno. (Biewnî Hesen Hîşyar Serdî, "Ararat û Îranî ra Ageyrayîşê Welatî", Armanc, rojnameya mehane, no: 137, Adar 1993.) Tira pey Xoybûn yê erşawena Kurdistanê Tirkîya (Biewnî Cigerxwîn, Jînenîgariya Min). Demewo ki menga Hezîrana 1937 di tanî embazanê xwi reyra yeno Kurdistan, nîzdî Bismîlî di, Salat di eskerê Tirkan yîni ca kenî û yê û embazanê yê xelî mîyan di gan bi ganî veşnenî. (Biewnî Malmîsanîj, Folklorê Ma ra Çend Numûney, Wêşanên Jîna Nû, Îlon 1991, Bällinge/Sweden, r. 16.)

Me'lumatê ki tornê Şêx Mehdî Behrun Aygörenî ra mi resay, Şêx 'Evdirehîm, serra 1937 di, nîzdî Bismîlî di şehîd bîyo.

³ **Şêx Efendîyo** ki Şêx 'Evdirehîm qalê yê keno, Şêx Se'îd Efendî yo.

⁴ **Xalid Beg:** Serekê Cemîyeta Azadî, Mîralay Xalid Begê Cibîri yo. Hewawo ki tornê Şêx Se'îd Efendî Melîk Firat vano, Xalid Begê Cibîri, him vistewre (biray cenî) him zî yaykizay Şêx Se'îd Efendî yo. (Biewnî Jêhat Serheng, "Di Salvegera Serhildana 1925'an De, Ji Devê Neviyê Şêx Se'îd Melîk Firat Çend Gotin Li Ser Şêx Se'îd", rojnameya Welatê Me, sal: 1, no: 14, 19 Reşemî 1995)

⁵ **Îrşad:** Rayiro rast nawitiş. (Biewnî Mustafa Nihat Özön, Osmanlıca-Türkçe Sözlük; İnkilap Yayınevi, İstanbul, 1987)

⁶ Dewa ki Cigerxwîno rehmetî vano "Evdirehîmî namey ya zî vatinî" Pîran o. Pîran ay deme nehîye bîyo, Mudurê nehîyê zî İsmail Efendîyo Ma'denîj bîyo. (Biewnî Malmîsanîj, "Min Şêx Se'îd Dîr", Çira, kovara kulturî, sal:1 no: 1 Adar,1995, r. 11)

⁷ Nê perrayeyê ki qala yîni bena nê yî: Welî Hediki, Hesenê Bêzi, Şewêşê Mehmedî, Hesikê 'Elikî, 'eyelê Îsîkî, yanî Mehemê Îsîkî û İsmelê Îsîkî. (Biewnî Malmîsanîj, "Min Şêx Se'îd Dîr", Çira, kovara kulturî, sal:1, no: 1, Adar 1995, r. 11)

⁸ **'Emerê Faroy ('Emê Fari):** Qumandanêkê Şêx Se'îd Efendî yo. Yû mesulê cepheadê rojawanê Diyarbekir o. (Biewnî Martin van Bruinessen, r. 356)

⁹ No camî Mûsil di yo. Çimkî kitabi di, na paragrafi ra ver nusiyawo ki Cigerxwîno rehmetî ay wext Mûsil di yo.

¹⁰ **Haco Axa:** Serekê 'eşîrda Hevêrkan o û serekanê Xoybûnî ra yew o. (Biewnî Cigerxwîn, Jînenîgariya Min.

-Ehmedê Abdurehman Axayê Kurê Şahîn Axa, "Eva ye Çîroka Jîna Min Ji Ewelê Umrê Min Heya Tarîxa Sala 1976", Armanc, no: 91, Nisan 1989)

¹¹ **Îslenqa:** Yew fîlê Erebkî yo, yeno me'na "paştî ser o rakewt". Kokê nê fîlî "seleqe" wo.

¹² **K, r, d:** Nê herfî, teksdê Kurmanckî di zî wina nusiyay.

¹³ **Mehemed Mehdî:** Gore bê vatişê tornê Şêx Mehdî (Meydîni) Behrun Aygörenî, yê 1969 di dînay xwi bedîlnaya û gorrê (mezêlê) yê Pîran di Lewedê Bawkalî di yo.

¹⁴ **'Elî:** Hezret 'Elî yo.

¹⁵ **Huseyn:** Hezret Huseyn o.

¹⁶ **Seyîd Taha (Seyîd Taha II):** Tornê Şêx 'Ubeydulahî û lacê Şêx Mehemed Sidiqî yo. Hewawo ki him M. van Bruinessen û him zî Garo Sasunî nuseno, Seyîd Taha lîderêkê siyasî û dînî ra vêşêr serekê 'eşîri bîyo. Ebi İsmail Axayê Şikakî reyra ver a Dewleta Îranî herb kerdo. Yew deme İngîlîzan yo kerdo qaymeqamê Rewandizî. 1932 di Şahê Îranî Rizay, Seyîd Taha da'wetê Tehranî kerdo û ayca je'r dawo bide. (Biewnî Martin van Bruinessen, r. 321

- Garo Sasunî, Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni-Kürt İlişkileri, 15.yy'dan Günümüze, r. 186)

¹⁷ **Şêx 'Elî Rîza:** Cigerxwînê rehmetî, heme cayan di herunda "Elî Rîza"y di "Elî Rîda" nuştö. Labelê namey yê 'Elî Rîza wo. Seki gelekî çimeyanê nuşteyan di vêreno, rolê yê Herbê Şêx Se'îdî di gelekî vêşî bîyo. Qumandanê Cepheadê Vakurî/Rojhelatêvakurî ra yew o. (Biewnî Martin van Bruinessen, r. 356.) Herbê Şêx Se'îdî ra pey şono Îraq (Biewnî Cigerxwîn, Jînenîgariya Min). Awankerdoxanê Xoybunî ra yew o (Biewnî Ehmedê 'Evdirehmanê Axayê Kurê Şahîn Axa, nuşteyo ki cor ra namey yê vêreno). Şêx 'Elî Rîzay, Fehmîyê Bîlalî, Şêx Mehdî, Seyîd Tahay û çendîna tenan 1927 di, Îraq di kongreya Xoybûn a yewini ra pey Cemîyeta Berzeya Kurdî (Kürt Tealî Cemîyetî) awan kerda. 1928 di 'efî ra pey amewo Tirkîya û yew deme ra pey tepîşiyawo. Frensîzkî, İngilizkî, 'Erebkî, Fariskî û Kurdkî zanaynî. (Biewnî Malmîsanîj, Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Doktor Abdullah Cevdet, Jîna Nû Yayınları, Uppsala, Mayıs 1986, r. 120.)

Melik Fîrat derheqê yê di wina nuseno: "..... Dat, vistewre û seyday mi Şêx 'Elî Rîza Efendî, alimêko pîl û wayirê de'wa xwi bi. Semedo ki nuştey yê yê ki te de meseley 'ilmî û xatirayê yê yê siyastî bî amey pêserkerdîş û veşnayış, reyna zewq û şewqê nuştîşî nêame bide. Mî ra va 'Herçiqas ki mi gelekî xwi ver ro da û waşt zî, ez ser nêkewta. Ez xeberî bida (qîsey bika) ko heskerdoxanê mi ra qorrî bidejî û te de bişikî; ez bêveng bimana wicdanê mi qebul nêkeno. Ayay ser o ez to rê vaja, ti nusênî.' La beno ki hesab nêkerdo ki ez tembela nê şahaneyan ra ya....." (Biewnî, A. Melik Fîrat, "Düşünceyi Yazıya Aktarmak", Özgür Ülke, 12 Haziran 1994)

Gore bê varîşdê tornê Şêx Mehdî Behrun Aygörenî, Şêx 'Elî Rîzay 15. 09. 1970 di Xunus di dînay xwi bedelnaya û gorrê yê Xunus di yo.

¹⁸ **Fehmî Efendiyo Licîyîj** (1887-1967): Hewawo ki gelekî cayan di nusiyawo û îfadedê Şêx Se'îd Efendî yê Mehkemaya İstîqlalî di zî vêreno, Fehmîyê Bîlalî, katibê Şêx Se'îd Efendî bîyo (Biewnî Mehmet Bayrak, Kürtler ve Ulusal Demokratik Mücadeleleri, Öz-Ge Yayınevi, Ankara, 1993, r. 337). Fehmîyê Bîlalî, endamanê (azayanê) "Komîtayê Herbî" ra yew o (Biewnî Martin van Bruinessen, r. 357). Pancês awankerdoxanê Xoybûn ra yew zî Fehmîyê Bîlalî yo (Biewnî, Ehmedê 'Evdirehmanê Axayê Kurê Şahîn Axa, nuşteyo ki cor ra namey yê vêreno.). Zînar Şîro zî derheqê Fehmîyê Bîlalî di gelekî ma'lumat dano. Gore bê nê me'lumatî, yû endamê nê cemîyetan bîyo: Hêvî (1912), Cemîyeta Berzeya Kurdistanî (1918), Cemîyeta Xwiserbiyayîşê Kurdistanî (1922), Xoybûn (1927) (Biewnî Zînar Şîro, "Neteweperwer û Xebatkarê Kurd Fehmîyê Licî", Armanc, no: 70, Adar 1987). Nînan ra teber, ma cor ra behs kerdbi ki yê qorrî embazanê xwi reyra Cemîyeta Berzeya Kurdî (Kürt Tealî Cemîyetî) awan kerda.

Fehmîyê Bîlalî karê edebî zî kerdî. Melik Fîrat nuseno ki yê hikayey La Fonteinî Frensîzkî ra tadayî Kurdkî. 12 hikayeyê Mamê Hitoy ki şarî miyan di vajiyaynî, ebi yew hewawo weş nuştîbî. Nê hikayeyan ra yew zî Giliya Daran (Gerreyê Daran) bî. Tanî xatirayanê xwi yê gelekî muhîman ra yew nusxa daybî Melik Fîratî. Melik Fîrat gelekî 'eteriyêno ki nê xatirayê Fehmîyê Bîlalî dewleti veşnay (Biewnî A. Melik Fîrat, "Giliya Daran", Özgür Ülke, 29 Mayıs 1994). Zînar Şîro zî qalê hikayê û şîranê Fehmîyê Bîlalî keno û namey çend heban nuseno (Biewnî Zînar Şîro, "Neteweperwer û Xebatkarê Kurd Fehmîyê Licî", Armanc, no: 71, Adar 1987).

Derheqê têkiliyanê Şêx Se'îd û Fehmîyê Bîlalî di, İzzeddîn Hemdem fekdê Osman Sebrî ra nê di meseleyan nuseno:

"Demewo ki Fehmîyê Bîlalî katibê Şêx Se'îdî bi, norûdora Şêx Se'îdî di tanî şêx û mîran

miyan di ca bi ca ver a Fehmîyê Bîlalî 'ecizyayîş peyda beno (Çimkî Fehmîyê Bîlalî, ebi fikranê xwi materyalîst biyo. -Î. Hemdem). Yê rojêk nê 'ecizyayîşê xwi Şêx Se'îdî rê eşkera kenî û persenî veynî çî rê Şêx Se'îdî, Fehmîyê Bîlalî kerdo katibê xwi. Şêx Se'îd na persda yîni ser o, tena nay vano:

-Fehmîyê Bîlalî Kurd o."

A bîni zî wina ya:

"Rojêk, wextê serhewedayîşê Şêx Se'îdî di, eskerê Şêxî amey dormarey şaristanê Diyarbekirî girewto. Tiya di Kurdî kenî nêkenî nişni bikewî şaristanî miyan. Eskeranê Tirkîkan top û tîfingê xwi yê makîneyîni bedenî (sûrî) ser o ronayî û cayanê bînan ra zî eskerê xwi teqwîye kenî. Tam ay hing di Şêx Se'îd û heyeta norûdora yê, werîştî nimac kenî. Tira pey zî roşenî û de'ey kenî. Semedo ki de'ey yîni gelekî dergî benî, Fehmîyê Bîlalî 'eciz beno û nişno xwi tepîşo, perseno:

- Şêxê mi, Tirkî xwi hadire kenî, gulan seredê ma ser o varnenî. Ma zî ganî tanî tedbîran bigîrî, planan virazî. La ez ewnêna ki şima ronîştî û de'ey kenî.

Şêx Se'îd hêrs nêbeno û wina cewabê yê dano:

- Semedo ki ma nişni sewbî çî bikî, ma de'ey kenî." (Biewnê Îzeddîn Hemdem, "Têkoşerê Bênav Fehmî Bîlal", rojnameya Welat, no: 12, 9-15 Gulan 1992)

Ma nuştêyêkê Yaşar Kayay ra bander benî ki di lacê Fehmîyê Bîlalî bî. Lacanê yê ra yew Sîrrî Tûran, Bedlîs di abûqat beno. Serra 1959 di, mudurê emnîyeta Bedlîsî, yew şewi Sîrrî Tûranî çipda xwi weneno beno, kişeno. Namey lacê yê yê bîni Zerdûşt o. Zerdûşt eskereya xwi Qora (Kore) di keno û tira pey şono Japonya û ayca di banqayêk ser o keno, tira pey yeno Tirkîya (Biewnî Yaşar Kaya, "Fehmî Bîlal, Faîk Bûcak, Seîd Elçî", rojnameya Welat, no:15, 30 Gulan-5 Hezîran 1992).

Tarîxê biyayîş û merdîşê Fehmîyê Bîlalî, Lici ra qeydê nufusî ra gêriyawo.

¹⁹ **Emînê Ehmedî (Emînê Perîxani)**: Serekê 'eşîra Reman o û serekanê Xoybûn ra yew o. (Biewnî Cigerxwîn, Jînenigariya Min

- Ehmedê 'Evdirehmanê Axayê Kurê Şahîn Axa, nuştêyo ki cor ra namey yê vêreno)

²⁰ Demewo ki Cigerxwîno rehmetî Îraq ra yeno, Şêx 'Elî Rizay ra teber, biray yê Selhedîn û Xiyasedîn zî Kurdistanê Îraqî di benî. Cigerxwîn xatirayanê xwi di wina behsê yîni keno: "..... Çar suxtey yew ode di bî ki ma zî şî yîni miyan, biy mêmânê ay çar suxtan. Werê yîni ma duyê mêrdiman rê qîm nêkerdîni, la ma a şewi viyarnay. Nimacê ma şî, yan zî ma erşawitî serê Kelehê, medresaya Melayê Kîçîk yan zî Mela Kîçîk Efendî ki Selhedînî, lacê Şêx Se'îd Efendî yê hetî wendîni. Ma pê ser o bermay, ma lewî pê ra şî û ay çax mi Mela Kîçîk Efendî dî...."

"..... Çend rojan ra pey ma şî Geliyê Zinwê, Şêx 'Elaidînî hetî ki yo bi xwi pabestey Key Nehrî bi û lacê Şêx Se'îd Efendî, Xiyasedîn, Şêx 'Elaidînî hetî bi û bi ma gelekî zerweş bi...."

²¹ **Şêx Tabîrî** 1969 di dînay xwi bedelnaya û gorrê yê Palo di yo.

²² Şêx Se'îd, 'Evdirehîm, Talîr û Mehdî lacê Şêx Mehmud Feyzî Efendî û tornê Şêx 'Eliyê Paloy î. Key Şêx 'Elî Paloy ser o Melîk Firat wina nuseno:

"Şêx Se'îd, lacê Mehmud Feyzî yo. Yû zî lacê Şêx 'Eliyê Paluy o. Bawkê Şêx Se'îdî amewo Xunus, dewa Qolhesarî di ca dawo xwi. (Yewna nuştêyê xwi di Melîk Firat nuseno ki Şêx Mehmudî na dewi Paşazadeyanê 'Elaidînî ra, Nusret Begî ra erînaya. Biewnî A. Melîk Firat, "Mijulî", Özgür Ülke, 9 Kasım 1994. -J. Espar.) Ayca di medresa û tekya xwi akerda.

Bawkalê min o hewtîn Diyarbekir di, Bismîl di, Çilstûni di ciwiyawo. Wexto ki Muradê Çarinî, Bexdat zeft kerdo û ageyrawo Diyarbekir, bawkalê mi razînebîyayîşê xwi nawito. Yanî şayiya yê, roşanê yê biyo, kalikê (bawkalê) mi Seyîd Haşîm nêşîyo, nêkewto miyan. Tira pey Diyarbekir di, Muradê Çarinî ra vato 'Yo zefte to yê Bexdadî teswîb nêkeno.' Yê zî emir dawo walî ki 'şêrê dewî û tekye yê biveşnê û yê bikişê'. Xwi ra şî kişto zî. Ayê ki ay kiştişî ra xelisiyay, ayca ra wenawo ver bi Farqînî, ver bi Pasûr (Qulp), ver bi Meletî şî. Tira pey Şêx 'Eliyê Paloy -Tirkî ti ra vanî 'Hezret Septî'- verê Cemê Muradî di, xwi rê banêko mutewazî viraşto û camîyêk akerdo. Ay cayan di hukim destê axayan di biyo.

Şêx Se'îd tornê Şêx 'Elî yo. Şêx Se'îd bi xwi Palo di maya xwi ra biyo. Dim a bawkê yê amewo Xunus, Qolhesari erînaya, yû zî amewo û ayca di ciwiyawo. Medresa û tekyada bawkê xwi di wendo.

Wextê Herbê Ürisî di, yanî Herbê Dinya yê Yewini di, key Şêx Se'îdî, Xunus ra wenawo ameyî Pîran (Dicle) di serrêk-di serrî mendî..." (Biewnî Jêhat Serheng, nuşteyo ki cor ra namey yê vêreno)

²³ **Şêx Selhedîn (1910-1978)**: Hewawo ki Malmîsanij tanî çimeyanî nuşteyan ra neqil kenê, Şêx Selhedînî Îraq di mektebê herbiye di wendo. Xoybûn reyra têkiliyê yê bîy. 'Eftî ra pey amewo Tirkîya. 1930 di, Ezurim di ebi awankerdişê yew cemîyeta nimitîkî suçdar biyo û Mehkemaya Ceza ya Giran a Anqara di amewo mehkemekerdiş. Serranê 1970 ra pey şarî miyan di xebata dîn û terîqetî kerda. Serra 1977 di ebi lehçeda Kirdkî (Zazakî) kitabêko werdêk o dînî dawo çapkerdiş û mirîdanê xwi miyan di dawo vilakerdiş (Biewnî, Malmîsanij, Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Doktor Abdullah Cevdet, Jîna Nû Yayınları, Mayıs 1986, Uppsala, r. 121).

²⁴ Hewawo ki mi şiyayo tesbît bika, lacê Şêx Mehmûd Feyzî Efendî hewt hebî yî: Şêx Se'îd, Şêx 'Evdirehîm, Şêx Mehdî, Şêx Tahîr, Şêx Dîyadîn, Şêx Bahadîn, Şêx Necmedîn.

Melik Firat aqubeta Şêx Dîyadîn û Bahadînî ser o fekdê maya xwi ra (maya cê, keynay Şêx Se'îdî ya) wina nuseno: ".....Banê ma yê Xunusî binê qordon û muhaseredê eskeran di bi. Xebera xeneqnayîşê bawkê mi Şêx Se'îd Efendî, şeş xalanê mi -Şêxanê Çanî ra-, zamayê mi -Şêxanê Melekan ra- û çewres embazanê yîni ma resay. Xebera Palo di sungukerdişî reyra kiştişê di datîzayanê bawkê mi ki cesedê yîni erziyaybî Cemê Muradî, xebera şhadeta datê mi Şêx Dîyadîn Efendî Îran di û peynî di zî odî zerre di, çimandê ma ver di, gama ki Qur'an wendîni panayîşê gulan reydi kiştiş û şehîdkerdişê dat û vistewredê min ê muftî muderîs Şêx Bahadîn Efendî. Qur'ano ki gonî pi ro biya no Qur'ano dês di leqnaye wo. Birayê min ê pîlî, heme camêrdê binî yê keydê ma viyartibî şîbî Îran û Îraq. Ma cenî û gedey halêko perişan di bî ki ma ra va 'Xwi hadire bikê ma şîma surgun kenî'....." (Biewnî A. Melik Firat, "İ'tidal", Özgür Ülke, 26.10.1994)

Nê watişanê maya Melik Firatî ra fahm beno ki Şêx Dîyadînî serra 1925 di Îran di dîna xwi bedelnaya. Şêx Bahadîno ki muftiyê Xunusî bîyo, a serrî Xunus di kişiyawo. Labelê ma nêzanî kamî çirê kişto. Hewawo ki îfadedê Şêx Se'îdî di vêreno, no biray yê muxalîfê yê bîyo (Biewnî Mehmet Bayrak, r. 333). Gore bê me'lumatê Behrun Aygörenî, Şêx Bahadîn 1925 di kişiyawo û gorrê yê Xunus di yo. Reyna gore bê me'lumatê Behrunî, Şêx Necmedîn zî 1920 di, Xunus di merdo û gorrê yê Xunus di yo.

BEŞA ÇARAN DÎ BÎWARA WELATÊ ÇIYA (CÎBAL) DE YE Û EW JÎ ÇAR BABET ÎN

Fedlullah el-'Umerî

AGAHDARÎ

Ev rêzên jêrî ji kitêbeke Erebi, Mesalik el-Ebsar fî Memalik el-Emsar (r. 124-135) hatine wergerandin. Ev berhem nêzê 650 sal berê ji aliyê Îbn Fedlullah el-'Umerî Şîhab ed-Dîn Ehmed (1301-1349) ve wek ansiklopediyeye wêjeyî, dîrokî, erdnîgarî (coxrafya), olî (dînî), zagonî (qanûnî) siyasî û birêvebirinê hatiye nivîsîn. Şîhab ed-Dîn Ehmed, piştî derketina ji zindanê û mirina bav û birayê xwe kete cihê wan û bû katibê taybetî ji Sultanê Memlûkiyan, en-Nasir Muhemmed ibn Kelawûn re. Îbn Fedlullah di hezîrana sala 1301 de li bajarê Şamê ji malbateke ku di xizmeta Memlûkiyan de bûye hatiye dinê. Destpêka xebata wî li Qahîreyê bûye lê piştî ew çûye Şamê û li wir karê xwe domandiyê. Wî di biwara rêxistin û birêvebirina dewleta Memlûkiyan de gelek agahdarî daye û berhemên hêja li pey xwe hiştine. Ji bilî vê pirtûka Mesalik el-Ebsar fî Memalik el-Emsar berhemên wî yên "et-Te'rîf bi el-Musteleh eş-Şerîf" û "Kîtabet es-Sir Lî es-Selatîn we el-Umera Fî el-Qahîre we Dîmeşq" navdar in. Herweha wî pirtûkeke mêtû û agahdariyê ku li ser malbata xwe nivîsiye û hinek helbest jî li pey xwe hiştine.¹

Pir hejfe ku tevahiya Mesalik el-Ebsarê di destê min de nîne, tenê kopyayêke destnivîsa wê ji beşa çaran ku tê de qala Kurdan dike, carekê ji aliyê Malmîsanîj ve gîhabû destê min, lê ez fêr nebûm ka gelo ew çap bûye yan na û ger bûbe jî min ew peyda nekir.

Bes yek ji nivîskarê Ereban ê mezin, el-Qelqesendî vê beşa ser Kurdan a di destê me de, wek çavkanî, ji Mesalik el-Ebsar girtiye û di pirtûka xwe ya Sub'h el-E'sa Fî Kîtabet el-Înşa' di cildê çaran de, bi cih kiriye û M. Emîn Zekî jî ew beş ji Sub'h el-E'sa wergirtiye. Încar dema M. Elî Ewnî jî pirtûka M. Emîn Zekî ya Xulasetu Tarîx el-Kurd we Kurdistan wergerandiyê zimanê Erebi, ew daye ber eslê wê, li gor lêkolînên xwe kêmasiyên wê deranîne, ew li hev rast kirine û hinek agahdariyên zêde jî dane. Herçendî di destnivîsa cem min de çend cih û hinek bêjeyên ku qenc nedihatînxwendin hebûn jî lê bi alîkariya van berhemên jorî min ew deranîn û xwendin. Bi hêviya lêborînê li kêmasiyan.

Babeta yekemîn di behsa Kurdan de ye; ev babet rewşa xelkê çiya (cîbal) hemû di xwe de dicivîne. Babeta duyemîn di biwara Lûriyan de ye, ya sêyemîn qala Şûliyan û ya çaremîn jî behsê ji Şenkariyan² dike. Welatê wan giş welatekî belawela, bi zêdebûn û bi bereket e. Çandiniyên wî xweş lê tîn û pircure ne, axa wî yeke wer xurt e ku dext û fêkiyên zahf ên bêhempa û hertexlît tê de tîn. Ew giş dewlemend û ehlê kêf û şahiyê ne.

BABET I

Babeta pêşî di behsa wan Kurdên ku bi alîkariya Yezdan em ê bînin ziman de ye. Her çendî kesên ku di vê beşê de ne tev dikevin ber hejmara Kurdan jî lê dîsa evên ku em ê li vir bînin ziman pareke taybetî ye ji tevahiya wan. Ew jî ew Kurdên ku nêzikî Îraqê û diyarê Ereban e, bilî wanên ku di welatên biyanî de belabûne: mîna wan malbatên li Şam û Yemenê û wan bavikên ku li nav herêmên Ereban û li der û dorên Îraqê belawela mane.

Di dema me de ew li nêzikî Mardînê zêde bûne û Îbrahîmê kurê Eli yê bi el-'Ezîz Balû³ navdar jî ji wan e. Rewşa wî zexm, hêza wî xurt bûbû û hemû li dora wî civiyabûn. Serrim û zirxên wî diçirisîn, xelk bi navê wî dihat gazîkirin û xebateke zêde li cem wî dihat peydakirin. Piştî gava ew mir kurê wî ket cihê wî, lêbelê kur qet li bavê nehat û nebû ew cewrê ku ketibû cihê şêr.

Heçî babeta ku rewşa wan runiştvanên çiya û yê din tîne ziman, bi destûra Yezdan em ê bêjin: Bêguman mebest bi çiya, li gor raya giştî, ew çiyayên ku dikevin navbera diyarê (welatê) Ereban û diyarê Eceman e. Destpêka wan çiyayê Hemezanê [Hemedan] û yê Şehrezorê ne; xilaseka wan jî digihîje kele û girên wî gundê kafiran ku dikeve welatê Tekfûrê [Mebest pê Împeretoriya Bîzansî ye-Emîn Narozi]; ango ew welatê Sisê⁴ û cihên pê ve girêdayî heyânî wan herêmên ku di destê Beyt Lawn de ye.⁵

Min bi tenê qala eşîrên ku ez bi wan serwest im kiriye û navê mîrîtiyên ku bi çiyayên Hemezan [Hemedan], Şehrezor, Erbil dest pê dikin û bi girava (Cezîre) Dicle heya bigihê Kîwar⁶ û Mûsilê diqedin, gotiye. Min, dev ji herêma navbera çemê Dicle û Firatê berdaye ji ber ku zêde ne girîng bûn, di gel vê jî tiştên ku min ji wir gotîye tenê kurtîya mebestê ye ku ew jî Kurdên Cezîrê û gundên Mardînê ne. Tevî ku ciyên wan ne asê ne û ji bo serhildanê bêmeçal in jî dîsa ew bi cînarên xwe hemû re neyartiyêke xurt dikin.

Zomek (qebîleyek) ji wan li çiyayên Hemezanê û Şehrezorê cîwar in ku ji wan re Goranî dibêjin. Ji wan him serbaz û him jî alî (re'ye) hene, hemû

xwedî hêz û bi xîret in û li cihekî ku bi navê "Rayedeşta⁷ Mîr (Emîr) Mihemmed" bi nav kiriye, rûdinên. Ji ciyê wan ê duyemîn re jî Derteng⁸ tê gotin û mezinê wan Mîr (Emîr) Mihemmed e; hejmara wan ji pênc hezarî zêdetir e,⁹ tev li hev in û di nav wan de ti nakokî tune. Li dû wan Kelalî¹⁰ tîn, ew jî eşîreke pir bi hêz e û hejmareke wan ya zahf heye; ew bi navê koma Seyfeddîn Sebûr jî têne nasîn û ciyê wan Damerk,¹¹ Nîhawend û heyanî nêzikî Şehrezorê ye. Ew nêzî hezar mêrên cengawer î zexm in, serokê wan, mîna wî fermandarê ser serbazan, bandorî li ser cînarên xwe yên Kurdnîjad hemû dike. Ji ber rastgoyî û xuyxweşiya serokeşîr, temamê rîspî û zaneyên eşîrê qedrê wî digrin û cihekî bilind didinê.

Ji eşîra Kelalîyan du bavikê din jî hene; yek ji wan li dorhêla Deqoqê cîwar bûye û hejmara wan li dora hezarî ye. Ya din li Eşneya [Şino] hêla Azirbeycanê rûdine û jimara wan dused kes in. Hejmara wan ji hewqasî xilbetir (pirtir) bû lê demazilamekî Teterî û nemisilman serokê Erbilê, Melîk Şerefeddîn îbn Selar kuşt hingê xelkê wî dijî gawuran [yên ne Misilman] serî hilda û piştî hinek ji wan bi bal Şamê ve, hinek jî bi bal Misrê ve koç kirin. Kurê wî, Mîr (Emîr) Mihemmed bû mezinê wanên Eşneyê [Şinoyê] û kurê wî Mîr Osman jî bû serokê wanên ku li ser axa xwe mane, lê mirina kurê wî bû mirina yên mayî jî.

Piştî Kelalîyan, li dora çiyayê Hemezanê [Hemedanê] bavikek bi navê "Zengilî"yan¹² jî tê. Ew pir mêr û jêhatî ne, hejmara wan du hezar e û ji wan re xelkê Cemaleddîn Balan jî tê gotin. Ew bi xurtî li ser diyarê Kenkûriya¹³ û li ser çol û kozên hawîrdor jî bandorî dikan.

Berî xirabûna Şehrezorê, eşîr û malbatên Kurdan ên mezintir û dewlemendtir li wir dijyan. Ew du ber bûn, yek ji wan jê re el-Lûset dihate gotin û ya din jî bi navê Babîrî¹⁴ dihate naskirin. Ew mêrxasên şer, serhildan û lêdanê bûne û piştî bûyera Bexdayê hejmareke pir ji wan tevî pîrek û zarûkên xwe bar kirine, diyarê xwe vale hiştîne û çûne li Misr û Şamê bicî bûne. Ji wan, hêz û komikên cuda derketine, gelek bûyer û qisûmatên giran (belayên mezin) bi ser wan ve hatine. Serpêhatî û bûyerên li wan qewimî wer mezin bûne ku her yek ji wan pirtûkekê tije dike. Di şûna wan de eşîrek bi navê el-Xerlîse¹⁵ cihwar bûye, lê ew ne ji Kurdên xalis in.

Li bajarê Şehrezorê, di navbera wê û Eşneyê de azbateke din bi navê "Siyûlî"yan¹⁶ heye. Hejmara wan digihîje du hezar kesî, ew gelekî mêr û camêr û zahf bi xîret in. Ew du ber in, berek jê li ser benda kurê Îzeddîn Mehmûd e û bera din jî ya Mîr (Emîr) Dawud e ku bi Dawud Bedran tê naskirin. Li dû wan jî qebîleya Qeryawîyan¹⁷ tê, ku li hinek bajarên herêma

Lîstarê¹⁸ cîwar in û hinek ciyên din ji Erbîlê jî di destê wan de ne. Hejmara wan jî çar hezar kesan zahftir e, mezinê wan Ebûbekir e û jê re Seyfeddîn jî têtê gotin; piştî wî, Şehabeddînê kurê wî mezinatiya êlê dike. Li pey wan jî êleke mezin bi navê Hesenan¹⁹ tê, ku xwey gelheyekî (nifûseke) xurt î zahf e. Ew dibin sê bavik û di dora hezar kesî de ne. Bavikê mezin bera Îsayê kurê Şehabeddînê Reyî ye û kela Cefrê²⁰ ku dikeve Reyê û ya Hamiyê jî ya wan e. Bavikê duyemîn du komik in: yek el-Benlîte²¹ û ya din jî Balcakî ne. Mezinê wan herdu malbatan jî Ebdullahê kurê Şehabeddînê Zengî ye. Bavikê sêyemîn yê Fexreddîn e ku serokekî pir qewî û zexm e, niha birayê wî Îxtiyared-dîn 'Umer, kurê Ebubekir li şûna wî ye. Eşîra Hesenan bi diyarê Kerkarê tê nasîn û wek hemû ciyên din, di parastina Derbend Qerayelî²² de jî bi Qeryawiyîyan re hevbeş e.

Piştî welatê Kerhîn û yê Deqmûq et-Taftî²³ tên, hejmara wan di ser heftsedî de ye û serokê wan Şeca'eddîn Babekir e ku xwe jî bona ol (dîn) û tekoşîna grûba xwe davête ziyane. Li navçeya Erbîlê, li qezaya Beyn el-Cebeleyn (navbera herdu çiyân), malbateke ku ji herdu dewletan re xizmet dike û herdu beran jî bi hev re îdare dike, dijî. Ew di zivistanan de bi Teteran re xweş derbasdikin û havînan jî bi Seraya Şamê re qenc li hev dikan. Hejmara wan mîna ya Kelalîyan e û serokê wan jî Taceddîn el-Xidir îbn Suleyman ku nivîskarekî rewanbêj û zarşêrîn bû. Ew dawî çû ber dergehê Melîk Mensûr es-Seyfî Qelawûnê Misrî û li wir ma heyânî ku mirîna kambax, bi xayîntî bi ser ve hat. Di dema dewleta Adiliye ez-Zeyniye de, dema her çar zarûyên wî jî her tiştî bêxeber bûn û cihekî bi rûmet jî wan re nema, hingê ew, digel 'Îzeddîn Senqerê Şehrezorî, Mubariz îbn Şeca'eddîn Erxî û Behaeddîn îbn Cemaled-dîn Xwoş el-Humeydî, dageriyên welatê xwe. (*Min li ser "dewleta Adiliye ez-Zeyniye" tu agahdarî nedît. -Emîn Narozî*)

Li dûv wan li hêla Erbîlê qebîleya Mazencaniyan tê, eslê wan Humeydî ne, xeyn jî mîrekên Humeydiyan ti mîrekên wan nemane, ew di talî û tengiyê tev de li ser Humeydiyan tên hesab kirin, hejmara wan tevî ya Humeydiyan jî hezar çekdarî ne kêmtir e. Mazencanî təkiliyan pir girîng digrin û bi cil û bergan xwe dişibînin merivên din. Lewra mîrê wan yek jî mîrekên xelîfetiya dewleta Ebbasiyan bûye û di dîwana xelîfetiye de bi Mubarizeddîn hatiye nav kirin (leqeb kirin), navê wî Kek bû lê jê re Selah jî dihate gotin û jî bonê qurban dihatin serjêkirin. Dema ku gazî (nevr) jê re diçûn wî ew dipejirandin, hew çendî jî datanî ser û tevî bi hev re dida xêr û xêratan.

Dema şarezayê qenc, Şemseddîn Ebû Ebdullah Muhemmed îbn Se'îd el-Ensarî, qala wî [Kek] dikir, weha pesnê wî dida: "Kek merivekî egîd û mêrxas,

xwey aram û tebat, bi himet û tevdîr, jîr û bikêrhatî, xweyşexsiyet û bi raman bû, herweha ew xwediyê serokatî û siyaseteke bihêz bû. Wî tu carî neyarê xwe piçûk nedidît û wan di ser guhê xwe de nedîavêt. Ew çiqas mezin û zordar bûna jî dîsa wî serî ji dijminê xwe yê xirab re danetani”.

Ji Îbn es-Selaya -dilovaniya Yezdan li ser be-hatiye veguhastin ku: ”Gava wî [Îbn es- Selaya] xebera mirina Seyfeddîn Muhemmedê bavê wî [Kek] dabûyê û serxweşî tê dabû hingê dilgeşiyê wusa di vî xortî [Kek] de çêbûbû ku wî [Îbn es-Selaya] hê di tu kesî de ev kêfxweşî nedîtibû.

Ew tiştê ku heval [Îbn es-Selaya] -dilovaniya Yezdan lê be- dît, di wî warî de eynî tişt di nav Teteran de jî, dema Îbn Yafes [ne Misilman] ketin erdê Îbn Sam [Misilman] çêdibû û dihate dîtin. Hingê Misilman ji hev belawela bûn, rêkûpêkî û serûberî feşilbû û ji rûniştvanên serê çiya pê ve ti şerkar û cengawer nemabûn. Çi dema kafir nikaribûn xwe bigihandina wan kesên serê çiya û bawer kirin ku şûrên wan jî nagihîje wir, dest bi gerefenan kirin û ji bo ku bigihîjine cem wan bi wan re bi ceweta devjêberdana bacê li hev hatin. Ji nav wan du meriv anîn û ji du aliyan ve li ser wan kirin mezin. Ji bo mezinahiya dorhêla welatê Ecem, Kek Mubarizeddîn bijartin û ji bo nava bajarên Ecem û dorên wan jî Esed bîn Mekakîn kirin berpirsîyar, ew kirin mezin û du heb text (yên milûkiyê) dane wan.

Piştî wan Mubariz Kek li ser Erbilê û cihên pê ve girêdayî danî. Wan ew kir birêvebirê şûrê [leşkerê] Erbilê û malê wê û temamê Eqresûsê²⁴ siparte wî, Hera²⁵ û Tilxetûnê²⁶ jî dane ser wir û pêncsed yan jî bêhtir mêrxas jî pêşkêşî wî kirin. Gelê wî bi dilgeşiya wî şad bû û roja wî ya îroyîn ji ya doyyîn xweştir bû. Ji ber têkilî û tevîhevbûna azbatî mîrek û giregir di nav eşîra wî de pir bûn; ew bi saya lêmiqeytî û haylêbûna peyva ”dewlet û dinya ji yê serkeftî re ye” bi ser hemdemên xwe ketibû. Ew di bîstsalîya xwe de bûbû mezinê vî welatî û notsalî jî bûbû lê hê jî mîna xortekî li ser xwe û şidiyayî bû. Çi neyarê ku qesta rûxandina welatê wî kir, Xwedê ew neyar bi xwe xiste cihê Kek û kîjan serokê Teterî ku li kuştina wî geriya berî pêkanîna vê daxwaziya xwe ew bi xwe çû telefê. Milk û mîrên tu kesî wek yên wî pir nebûn û çiyayên wî jî hew dilxweşî, şadî û îqbal jê re dianîn.

Piştî mirina wî [Kek] kurê wî Îzeddîn kete dewsa wî; ew jî bi tiştên ji bavê xwe girtî û jê hînbûyî dihate nasîn û pesindan. Li pey jî birayê wî Necmeddîn Xidir hate şûna wî; ew jî di hebûn û bereketê de, piyale li ber, li ser textên bilind, li ber pala wî nazbalgîvên rêzkirî û li binî jî xalîçe û tejkên raxistî, rûniştiye. Ew der û dor, ew dost û xizm, ew aqar û terş, tevî bextiyarî û kamiraniya kevn û nû çî tiştne xweş bûn ku bav ji mîratxwure xwe re hiştibû.

Ew li cem dewleta Îslamî û ya Teteran tev xweyê cihekî bêhempa bû û merteba wî ya bilind li ba herduyan jî nedihate guhartin; xweşî û rûmeta wî ji her ku diçû li nav gel zêdetir bela dibû. Tevî vê jî wî ti kêmasî nedixiste edeb û terbiyeya xwe, ew bi gihîştina ewqas gencîneyên zîv û zêr jî nedipesinî û guhê xwe nedidayê. Name û bersîvên wî, bi awayekî rewanbêjî, fena taviyên baranê dibariyan û digihan ber dergehê sultanê Misrê û cîgirê wî yê Şamê ku ezepên Ereban timî li hawîrdorên wî digeriyan. Piştî ew mir - rehma Xwedê lê be-, kurê wî kete dewsa wî û rêçika wî ajot; bi vê yekê hizkirin û başiya wî di nav gelê wî de zêde bû.²⁷

Di pey de Bîsar, derên pê ve girêdayî û Tilheftût tên; ev diyar ên wan Sehriyan²⁸ e ku bi diziyê navdar in, ew ji Şeqlabad²⁹ heyanî Xeftiyana³⁰ Ebû 'Elî, ku bi Xeftiyana Piçûk (Xeftiyan es-Sexîr) tê nasîn û wê deşta navbera wir heyanî Derbenda Mezin (Derbend el-Kebîr) digre. Ew bavikekî ku hejmara wan ji hezarî nabuhûre, çiyayên wan gelekî asê ne û rêbiwara (derbend) wan dikeve nav du çiyayên bilind ku Zabê Mezin wan qet dike û bi dengêkî xurt î bihêt û borîneke şêrane di ser wan çol û pesaran de diqelibe. Sê heb pirên bi pişte (kemer) î rêzkirî li ser wan hatine danîn; dido ji wan ji keviran û bi kixs û cixsê çêbûne, lê ya navîn ji darên mîna hesîran honayî hatiye saz kirin. Ji aliyê avê ve bilindiya pirê sed gaz li hewa ye û dirêjîya wê ya navbera herdu çiyayên jî pêncî gaz, li ser berahiya du gazan e (gaz: 75 cm ye. -Emîn Narozi). Carna jî cihê wê diguhire, hingê yan ji dirêjahiya wê tê kêmkirin yan jî li firehiya wê tê zêde kirin. Dewar tevî barên xwe û hesp jî digel siwarên xwe di ser de derbas dibin. Ew pir bilind dibe, nizim dibe, teng û fireh jî dibe; rêwiya ku di ser de diçe dikeve xetera canê xwe û ji hişê xwe diçe. Ew timî ji bo parastinê li ber nobet digrin û kesê bivên wî bi paş ve dizivîrin. Ew derbend dikeve cihekî teng î asê û raserî çemekî kûr e; xelkê wir jî yê ger û fenan, yê dek û dolaban û yê kirinên xirab e. Li wir mêvan nikarin xwe bispêrin wan û divê ew bi xwe xwe biparêzin.

Şemseddîn Muhemmed îbn Sa'idê rêzan û şareza, gotiye: "Ger hinek Kurd ji azbata cinan hebin wê evên han bin". Herçendî derbasbûna geliyên wê tev zor û asê ne jî lê ev der hê zortir û asêtir e. Serokê wan Husamê kurapê Qemyan bû, tiştên ku wî li pey xwe hiştin ew man lêyên mayî çûn. Ji cînarên wan re Zerzarî tê gotin; peyva zerzarî peyveke'ecemî angoyê biyanî ye bi wateya cewrikên guran e. Hinek dîrok nasan qala wan kirine û gotine: "Ew ji wan biyaniyên ku bûne Kurd lê hê jî bi navê serokên xwe tînin binavkirin in". Pirên wan debirvanî (cotarî) ne lê ji wan mîrek, dewlemend û belengaz jî hene. Nêzî pênc hezar zîlamên wan hene û hemû lihevhatî ne, di nav wan de dijîtî pir

kêm e. Ji wan, merivên zahid (xelwetnişîn)³¹ ên ku bi tiliyan têne nîşandan û şerîetmedarên ku bi fetwa wan tê bawerkirin hene. Cih û malên wan ji Meretê heyânî çiyayê Cencerînê ku ji aliyê rastê ve dikeve raserî Esneyê,³² rêzdibin. Ew [çiyayê Cencerînê] ji çiyayên hawirdorên xwe hemûyan bilindtir û sartir e eynî mîna Zemherîrê³³ ye û wek miqnatîsê ewran bi ser xwe ve dikîşîne. Ji bo balkêşî sê heb qûçê mezin li serê çiya hatine çikandin, dirêjahiya her qûçekê deh bihost e û firehiya wê jî çarîka (çaryeka) dirêjahiya wê ye. Ew kêlik ji kevirên çargûş hatine çêkirin û ji çaralî ve bi qandî dupayên (ji sisiyan dido) gazekê, belkî zêdetir jî, hatine şehkirin (verotin). Li ser her yek ji van kêlikan nivîsareke kevnare heye ku ji şûna wê [nivîsê] pê ve tiştêk jê nemaye. Ew qûç ji kevirê saxlem î kesk e ku serma û germ zû bi zû nikarin wî biguhirînin. Ew ancax bi hezar salan karibin şopekê li ser bihêlin ew jî yeke ku qenc nayê tefsel kirin. Qûça navîn li navsera çiya hatiye danîn, herduyên din jî dikevin sêyeka çiya. Li gor salixdanan ew ji bo balkêşiyê hatine çikandin û nivîsa ser wan jî derbarê wan kesên ku ji ber berfê seqemê wundabûyî mane, di havînan de, agahdarî ye. Xelk di bin wî de nobetdarî dike ji bo bigihîjin wan kesên ku li wir ji serma qerisîne û yên mirî jî veşêrin.

Bajarê Melazkird³⁴ û yê Ristaqê³⁵ tevî keke, cot û çobar û malê xwe hemû di destên Zerzariyan de ne û tiştêk jî jê bi ser kesî ve bernadin. Serokê wan ku wan dicivand ser hev û hêza wan pê radiwestiya Necmeddîn îbn Basak³⁶ bû; piştî mirina wî kurê wî yê bi navê Ceyde kete cihê wî û piştî mirina wî jî kurê wî Ebdullah cihê wî girt. Serokekî wan ê din jî bi navê Husamşêrê Piçûk (Husamşêr es-Sexîr) hebû ku pir mêrxas î qenc, xweyray, bi tevdir û xweparistî bû. Eşîra wî li dora wî bû û hemû pê re yekdev bûn. Herweha serwerekî wan ê baş î xuyxweş, bi navê Basakê kurê Husamşêrê Mezin (Basak îbn Husamşêr el-Kebîr) jî hebû. Yekî din jî, ji yên bavîkxurt, bi navê Behaeddîn îbn Cemaeddîn Ebû Elî hebû. Ji bilî wan, hinek serek û mîrekên din jî ku beremrîya (îta'eta) wan dihate kirin di nav wan û civata wan de hebûn, lê ji ber ku hêz û fermandarîya wan ewqas ne xurt bû me bi dayîna navê vanên bihûrî tenê bes kir û dev ji wan berda.

Grûbeke hindik ku bi navê gundê xwe Balikan tê binavkirin jî li ser Zerzariyan têne hesabê. Ew hindik in lê ji Zerzariyan re mîna qeweteke hêja ne. Gundê wan Balikan, bi tena serê xwe li ser cihêkî bilind, raserî xaneke rêasê dimîne, ew bi hêzeke xurt li xanê nobet digrin û di nav Hesnaniyan [navê eşîrekê ye ku li pêş bihûrî] de digerin. Mezinê wan Feto Bek, bi Necmeddîn [yek ji serokên eşîra Zerzariyan e] re hate kuştin û eşîra wî jî bû bavîkek ji eşîra Zerzariyan; hejmara wan digihîje sê sed zilamî.

Colemerkî [Çolemêrgî] jî ji wan in, ew eşîrek e ku ne bi kesên xwe lê bi ciyên xwe tê nasîn; ji wan re qebîleya Hukemî³⁷ ya Benî Ûmmiye jî têtêgotin. herweha tê gotin ku: "Gava di şer de meriv pir hatin ser wan û zora wan çû, wan xwe avêt çiya ji bo ku di dema hatina xelkê û zordariya wan de ew jî bidin ser rêça Kurdan, xwe bi çiya ji neyarên xwe biparêzin û ji şerê wan dûr bikevin". Her bi vî awayî ew parastî man û ji xelkê filitîn. Niha hejmara wan gelek zêde bûye û bi ser sê hezaran ketiye. Serokê wan 'Îmadeddînê kurê Esededdîn ê kurê Mengelan e.³⁸ Piştê kurê wî Esededdîn kete şûna wî û bû serokê wan. Di bin destên wan de madena zernîxê hebû û wan ji bo firotinê dibir hinek ciyên din. Li gor gotinan, madena lazwerd jî li wir derdiket lê wan ew vedişart da ku paşayên Teteran pê nehîsin û ji wan nestînin (*lazwerd: kevirêkî şîn e ku ji wan morîk û xişrên cuda çêdibin, ji xişrên wan re şînok, çavik û pîrozî jî tê gotin. -Emîn Narozî*). Kele û sitarên (parêzgehên) wan, ku ji yê herî asê û pêbawer in, dikevin ser çiyayekî bilind ku ew bi xwe ji qurma wan çiyayên din veqetandî ye û di nav wan de lê ji wan cuda çik radibe, bi hewa ve hildikşe; ew çiya di nav wê ava hawîrdorê xwe de rind cihdayî ye. Çemê Zab ê mezin hawîrdorê wî digre û wî û wan çiyayên din, bi destûra Xwedê ji hev diqetîne. Ne cihê ku leşker derkeve ser heye û ne jî tîr digihîjinê. Serê wî ji bo çandiniyan fire ye û di kêlekan de jî şikefteke bilind heye, kesê bivê dikare here ser û astengiyê ji bo çûyin û hatinê derîne. Bingehê çiyê di nav avê de ye û berf jî timî riya çûyina serê wî digre. Ji bo derketina ser vî çiyayî, di hin riyan de divê meriv -ger ku karibe- di ser hinek singên kutayî de derbasbibe; lê ew kesê ku nikaribe derkeve ser, bi werîsê eliqandî ve tê kişandin. Herweha hesp û hêstir jî ji bo aşê û zexîreyê pêwîst di wê rê de derdikevin ser.

Serokê wan, ku li cem wan gelekî bi rûmet û pêbawer bû, Behaeddînê kurê Qutbeddîn (Behaeddîn îbn Qutbeddîn) bû. Kurê wî jî bi mezinatiyê ve rabû, kete cihê wî, bû serokê wan û li ser riya bavê xwe meşiya. Kurapekî wî jî bi navê Şemseddîn Dawud hebû, wî demeke dirêj zordarî li ser welatên dijmin kir, ew gelek jê aciz bûn û bi her dek û dolabê qesta kuştina wî kirin lê bi ser neketin. Di pey de wan, bi hêviya daketina ji serê çiyayê, azadbûna ji ber eş û belayên wî û lêewlebûnê, pê re dest bi qencyeke zêde kirin. Nêzîkbûn û qencyê, gihaştina bal wî hêsantir kir û hişt ku ew li hinek bajaran bi cih bibe.

Demê ku wî, ji bo xaniyekî ku ji Sultan re hatibû avakirin û li dora wî bûstaneke bendbilind û xweyfêkiyên curbicur ku bihayê berên wî bîst hezar dînarên hingê dikir, biryara cihwarbûnê da, wan gelek diyarî danê û fêkî û berên wî baxçeyî giş pêşkêşî wî kirin. Ew xanî, di temamê axa Padîşahîyê de

mezintirîn û bi xalçe û hacetên nav malê jî hêjatirîn xanê bû. Ew heyânî mirina xwe li wir ma. Lê piştî kurê wî dev ji wan (*ên ku xanê dabûnê û pê re qencî kiribûn*. -*Emîn Narozî*) berda û li şerê wan geriya, çiku xeraca welatê wî ew bi ser xwe ve dikişand. Biraxwe (pismamê nêz) û mêrxasên wî kudera wî welatî bixwestina wî ew der dida wan. Wî li rîya Azirbeycanê, ya Tewrêzê (Tebrîz) heyânî bigihê ya Xoyê û Nexcîwanê (Neqşîwan) tev nobet digirt û wan diparast. Her yek ji karker û xizmetkarên wî gere li gor hunerên xwe berpirsiyarê hinek kesan bûna: Mîna nivîskar, şa'ir, cihgir (naîb), muteserrif û nûnerên gel (wukela). Taştîya wan heyânî nêzî nîvro nedihat ber mêvanan, herweha şîva wan jî heya siseyek (sulus) a şevê nediçû ber mêvanan. Xwê jî qet nedikete nanê wan, da ku merivên şerûd û aştxwaz giş karibin jê bixwin.

Bavîkekî Kurd ku li hêla çiya li herêmeke bi navê Merkewan³⁹ dimîne, cînarîya Colemerkiyan [Çolemêrgîyan] dike. Berf û barana wê hêlê pir e, bihara wê rengîn e, curbicur giya û kulîlik lê hene û havîna wê jî ji deng û teraneyên (xwendin) teyr û tilûran têkel û hevaheng dibe. Zivistana wê jî pir bi şîr û goştê xweş î pirtexlît e ku ji hêla Azirbeycanê ji bajarê Ormiyê tê. Li wê derê du heb mîrên wan hene: Bedreddîn û Mîr (Emîr) Hesên, ew herdu birayên hev ên ji dê û bavê ne û hevalê hev ên birêvebirinê ne jî. Hejmara wan digihîje sêhezar kesî û di nav wan û cînarên wan Zerzarî û Colemerkiyan de ehd û peyman heye. Ew bi hev re qencyê dikin û ji hev re gelekî mihîrîvan in.

Ji aliyê Welatê Romê [Împeretoriya Bîzansî] ve hinek çiya û welatên din ên cînarên Colemerkiyan hene ku ji wan re Kîwar⁴⁰ tê gotin. Ew navçeyeke gelekî mezin e, ji bo heywanan koz (çêregeh) û pawanên baş tê de hene û hertim bi dar û şînahî ne. Kesên ku li wir rûdiniştin tev bi wê navçeyê dihatin binavkirin û ji wê qebîlê dihatin hejmartin. Mezinê wan Mîr Şemseddîn e û sê hezar merivê wî hene.

Li pey Colemerkiyan navçeyên Eqreşûş, Îmadiye, Zîbar⁴¹ û Hekariye tî. Hejmara Zîbarîyan digihîje dora pêncsed kesî; ew xwey cawxane û çirçirxane (pembû vedijene) ne, çarşî û bazarên wan jî hene. Demeke dirêj di nav wan û Mazencaniyan de qirêneke (şerekî) gelekî dijwar hebû, lê demek piştî piyê wan erd girt û cihê wan bilind bû. Yek ji mezinên wan Mîr Îbrahîmê kurê Mîr Mihemmedê Zabî (el-Emîr Îbrahîm ibn el-Emîr Muhemmed ez-Zabî) bû. Ew merivekî giran ku xwedîyê tecrûbeyên dema xelîfetiye bûye û bi xwedî biryariyê dihate nasîn. Piştî mirina wî, kurê wî kete cihê wî lê ew piçûk bû û pêwîstiya wî bi alîkari û piştgiriya Kek Mubariz hebû ku jê re bibe. Mezinê wan ê diduyan Şehabê kurê Bedreddîn Berş bû, dema ku bavê wî mir û ew kete cihê wî, mezin bû. Ger ne ji Mazencaniyan bûna

kesekî ji wan doza mîrîtiyê li wî nedikir, lê gava ew bû mîr wî bi her awayî bandoriya xwe danî ser xelkê û ew xistin bin destê xwe.

Heçî Hekarî ne, ew li hêla 'Îmadiyahê runiştine, hejmara wan ji çar hezar şervanî zêdetir e. Mîrîtiya wan ji aliyê du birayan ve tê birêvebirin; yek ji wan Mîr Ebû Bekr û yê din jî Mîr Elî ye. Bavê wan bi navê Tarawsî tê naskirin. Ebû Bekr bi zilamên xwe, bi pirbûna dek û dolabên xwe, bi zorî û asêbûna çiyayên xwe, bi biriya (qeweta) parêzger, leşker û hevalbendên xwe gelekî xurt bû û kes nedigihîştê. Demek wusa bû ku tevî amadekirina ewqas leşker û hevkarîya hewçend fêlbaz û hîlekarên jî dîsa tu kesî nikaribû ne bi wan [leşker, parêzger û hêzên wî] û ne jî ji bo ku wî bixin bindest, tişteki bikin; ta ku yekî Xiristiyan (Nesranî) bi navê Mes'ûd el-Berqûtî bû mezinê Musilê û Mîr Rediyeddîn Baba yê Qezwînî Bekrî (Emîr Redyeddîn Baba el-Qezwînî el-Bekrî) -rehma Xwedê lê be-, ji ser hukm rakir. Hingê bi hevkarîya hin bavikên din jî wî dest bi kirina her dek û hîleyî li Mîr Ebû Bekr kir. Wan bavikan ji bo ku Ebû Bekr bibin cem wî [Mes'ûd el-Berqûtî] timî jê re şelaqî û melaqîyan dikirin, pesnê wî [Mes'ûd el-Berqûtî] û baweriya pê didan. Dema bi vî awayî jî çênebû, ew rabûn çar heb zarûk di gerewa wî de girtin û birin ba Sultan: Yek ji wan Mubarekşah bû, yê duyemîn Seyfeddîn kurê Mubariz Kek [Kek Mubariz] bû ku li Eqreyê bavê wî ew danîbû cihê xwe. Herduyên din jî Ehmed û Curr bûn; bavê wan herduyan jî tunebû. Nûçeya vê bûyerê gihabû guhê Bekreddîn ku hingê li Erbîlê cihgiriya Sultan dikir. Ew bi vê yekê pir êşiya û hahakê (bi lez) rabû xwe berda ber dergehê Sultan, demeke dirêj li cem wî ma. Wan ew da rawestandî heyanî kutabûna dema î'îrazê û gotin em zarû û ehlên wî nayînin lê ka î'îraza wî çi ye? Dema wan weha got û jê xwestin, ew rabû çû ku dakeve cem wan lê cardin wî nepejirandin. Wî [Bekreddîn] li ser daxwaza wan cardin qasid şand û ji wê bûnê ew [Bekreddîn û merivên xwe] dereng ketin. Wê gavê Sultan jî -ku hingê bi grûbên xwe ve berê wî li ser riya 'Humusê bû-, li rewşa wan kete gumanê û ferman kir ku li wî û hevalê wî haydar bin. Wextê ew gihan mexel û mozgela nê Azirbeycanê, siwarekî ku Sultan ew xwestibû û li wê derê li nik wî pêbawer bû, çû pêşiya wan. Wî ew fersenda ku jê re, ji ber pêbawerîyê, derket holê wek xenîmet dît, di cih de xwe avête ser piştê hespê tazî û tevî hevalê xwe reviya. Wan bi hêviya ku çiya nêzîk in û tarîtiya şevê dê wan veşêre hespên xwe bi çargavî ajotin.

Dema ku xelk bi reva wî hisiya, ji xezeba sultanê xwe gelekî tirsîya û li pey gazîkirin, bû "ulam ulam" a wan.⁴² Qewmek ji Îxtaciye -ku siwarne hêja bûn-

pê hisiyân (Min tu agahdarî li ser "Îxtaciye" nedît. -Emîn Narozî). Hingê ew [Ebû Bekr] ji bo êmê hespê xwe li bajarekî bi navê Kezelkê bû. Yekî ji wan [Îxtaciyan] tîrekî avête wî û lêxist; hevalên wî xwe avêtin ser da ku wî biparêzin lê ji yek zilamekî ku dema revê ketibû bajêr pê ve kes ji wan nefilitî. Pirên rehîneyan, demaku Mubarizşêr [Mubariz Kek e] êrîşt ser ewên ku kurê wî dizîbûn kir, reviyân û ew jî [Mubariz Kek] giha kurê xwe. Piştî birayê wî [birayê Ebû Bekr] Mîr Elî, bi tena serê xwe bû mezinê Hekariyê û heya mirina xwe li wir ma. Li pey wan jî xwediyê Kela Herûzê,⁴³ Xerseddîn kurê Mîr Elî kete cihê wan.⁴⁴

Paşî Mîr Mihemmedê kurê Mîr Ebubekr mezin bû, bû fêrisek û qesta keleya Çiyan (Cîbal) kir, wî ew zefî kir, geliyên der û dorên wê şewitandin û xwest ku ger çarenûsa wî bihêle, ew ji xwe re tê de rûnê. Hekariyan ji Buxara heya bigihê çiyayên Cezîrê gelek cihan diparastin.

Li kêleka wan ji aliyê deştê ve çiyayê Qemeraniyê û şikefta Dawud tên; ev der jî welatê Sibkiya⁴⁵ ye. Herçendî ew bavikekî hindik in jî lê dîsa axa xwe pir baş hefidandine. Xwarina wan li gor taybetmendiyên wan tê dayîn. Ew ji pêncsed kesî ne zahftir in, serokê wan li Qemeraniyê rûdinê û jê re.....⁴⁶ tê gotin.

Li pêşberî Colemerkiyan, li rastê Mûsilê, eşîra Boxtiyan⁴⁷ dimîne. Ew eşîreke mîna Humeydiyan bûye, lê merivên wan pirtir û bavikên wan jî xurttir bûne; gelek rîsipî û giregirên wan hebûne, lê piştî mirina serokên wan giregirên wan jî ji hev belabûne û xelkê wan jî tev ji ber hev ketine. Ji komikeke piçûk pê ve kesekî wan nemaye û ew li nav gel û bavikên din dabeş bûne. Yek ji mîrên wan ên mayî Fexreddîn e ku xizmeta mezinê Mardînê dikir, lê ji ber hinek gotinan wî ew ji ba xwe derxist. Xelkê eşîra Boxtiyan gelekî pir bûn û bavikne wan ên curbicur hebûn. Yek ji wan eşîra Sindî bû, ew bi hejmar ya herî xilbe û xwediyê leşkerê herî zahf bûn. Nêzî sîhezâr şerkar (çekdar) ên wan ên siwarî û dekbazên şerûd hebûn. Bavikekî din ji yên wan bavikê Muhemmedî bû, mîrê wan Şerwîn (Şirwîn) bû û ew ji şeşsed mêrî bêhtir bûn. Yek ji wan jî bavikê Rasiniyan⁴⁸ bû. Ta mîrê wan Bedir kurê Keya Bek (Bedr îbn Keya Bek) tevî kulfet û zarûkên xwe ji bo hêz û şerefê ji wê herêmê dûr nebûbû, hejmara wan, cebîlxane, supa û leşkerê wan zêde bû. Lê dema ew ji nav wan çû, koma wan belabû û giş ji hev veqetiyân. Ji ber vê yekê hejmara wan li bajarê Mûsilê bû ku ne zêdeyî hezar mêrî ye û mîrê wan Elaeddîn Kurk îbn [kurê] Îbrahîm e. Ew di bajarê Eqreyê de jî ji pêncsed kesî ne hindiktir in, mîrên wan jî Mîr îbn Ebû Elî û Mûsa îbn Behaeddîn in.

Yek ji bavikên wan Boxtiyan jî bavikê Dunbiliyan⁴⁹ e, ew li çiyayên Meqlûb dijîn, xelk ji bo nobedarî û parêzkariyê gazî mêrên wan ên qenc û jêhatî dike. Navê mîrê wan Keltî ye; hejmara wan ne zêdeyî hezar kesî ye. Ew li herêmên cuda cuda û li geliyên cihê cihê belabûyî ne.

BABET 2

EV BABETA DUYEMÎN DÎ WARÊ LÛRÎYAN DE YE

Evên han qebîleyek e ku hejmara wan pir e û bavikên wan li bajaran belabûyî ne. Di nav wan de paşa, mîr, pêşewa û çalak hene; ew gelek cansivik, xweşlibat û rastgo ne. Zilamên wan li ber avahiyên bilind disekin, zikên xwe bi quncikek ji yê dîwêr ve dizeliqînin û piştî hin bi hin pê ve hildikişin ta ku derdikevin ser serê avahîyan. Di nav wan de hinek hene ku malê xelkê didizin, wan dişêlînin û ew bi xwe pê jî nahisin. Carna hin ji wan pêxwasên wan têne girtin, ew bi qemçiyên lêdan dixwun û bi cezayê herî mezin tîştên kirin lê dîsa ew tiştêkî li xwe danaynin. Bes dema ku yek wan dibe ber perda Xwedê [perda mizgeftê] û pê yan jî bi Xwedê dide sondê, hingê ew tevî li xwe datînin. Hinek bavikên wan li Misrê jî hene lê piraniya wan li Şamê ne. Di vê navê de gelek bûyerên bi nav û deng û rewşên ecêb ji wan hatine dîtin.

Tê gotin ku zilamek ji wan rojekê tê ba Selahuddîn Ebul-Muzaffer Yûsuf Îbn Eyyûb [Selaheddîn Eyyûbî] -mîhrîvaniya Xwedê lê be- û hinek ji wan cansivikî û xweşlibatîyên xwe pêşkêşî wî dike. Ew li ber avahiyeke bilind radiweste, xwe pê ve dizeliqîne û ber bi jor ve hildikişe, heyanî diçe serê wê. Selahuddîn -dîlovaniya Xwedê li ser be- li cansivikî, xweşlibatî û çalakiyên wî yê kesnê heyirî û mat dimîne. Dema ku ew ji jor tê xwar, Selaheddîn wî perû dike, qedrekî baş didê û gelek qencî pê dike. Ew wî li hespekî dide siwarkirin, cihekî mezin didê û jê re weha dibêje: "Ez dixwazim (divê) hinek ji we li cem me bin, çiku ji bo derketina ser kele û sûrên neyaran alîkariya kesên wek we pêwîst e". Yê Lûrî, radibe hebo hebo ji wan kesên ku dikarin vî karî bikin dikîşîne cem Selahuddîn. Kîjanê ku tê Sellahuddîn qencî pê re dike, diyarî didê û hinek erd dispêrê. Demek piştî, gava ku kesekî din ji wan êdî nema tê ba Selaheddîn, hingê ew pirs dike:

– Gelo çima kes ji wan êdî nema tê cem me?

Yê Lûrî dibêje:

– Serwerê min, bi Yezdan, ji van pêştir kesekî din ê ku wî karî bike êdî nema.

Wextê Selahuddîn dilbicih dibe ku ji van pêştir kesî din nemaye, radibe wan dide girtin, piştîre tîne ba hev û her yek ji wan zilamek datîne pişt. Bi îşareta wî re her yek ji wan derbekê li stûyê yekî Lûrî dixê û serê wî dibire.

Sedemê kuştina wan, paxava Selahuddîn bû ku ew ji aliyê neyaran ve, li dijî wî bîn bikaranîn; încar ger wî yê pêştî tenê bidana kuştin, hingê wê yên din bihatina heyfa wî û bi vê cambaziyê ew bikuştana. A ji ber vê yekê, ew bi delalî wan dixapîne û bi vê dek û dolabê ji holê radike.

Dîsa ji bo wan tê gotin ku: ”Ev merivên han li ser werîsên bi qandî çend bejnan bilind dimeşyan, piştîre xwe qulopanî dikirin davîtin hewa ta ku serê wan digiha erdê û piyên wan bi werîs ve daleqandî diman. Piştîre ew radibûn ser piyên xwe û bi qapqapikan li ser wî werîsî digeriyan, wan leystikên wer ecêb ên nebînayî dikirin ku aqil nedigihayê û dev ji wan re vekirî diman”. Herweha jinên wan jî hespên xwe zengo dikin didin cirfê û xaranîya paşî ew xwe bi şid ber bi erdê ve berdidin, carna ew xwe dixin bin zikê hespan û cardin xwe li ser rast bikin, dîsa ew xwe bi bin zikê hespê ve digrin û dibin wek beşek ji hespê. Di dût de ew destê xwe ji zîn û manekiyan berdidin, careke din geh ji jor ve û geh jî ji xwar ve xwe davêjin stûyên hespan û gelek tiştên weha yên cansivikî û ecêb î nedîrî dikin. Li Şamê, kesê ku qeweta wan bigihîjê û bikeve ber lepê wan çû jê. Ji ber ku semaxa wan a ber derban tê zanîn, dema girtinê êdî kes li wan naxe, lêbelê ji pêl ve ew wan bi Xwedê û bi perdeya wî didin sondê, hingê ew li xwe mukur tîn û tiştên ku birine bi paş ve didin; gava ew wan tiştan bi paş ve didin jî weha dibêjin: ”Em xirabê wî dibin û başê wî bi paş ve didin.”

Me ev herdu gotin ji devê wan girtin û rewşa wan, digel bûyerên wan anî ziman. Ew li welatê xwe xwediyê hêzeke xurt î hêja ne. Lûrên Mezin û Piçûk hene, ji wan fermandar û fermanber hene; dizên wan qet nikarin dev jê berdin. Di welatê me de ev edetê wan ji berê û paş ve weha dom kiriye.

Yê ku ji Erebî wergerandiye:

Emîn Narozi

¹ Ferdînannd Tulû, El-Muncid Fî el-Luxewe el-E'lam, Dar el-Meşriq, Beyrûd, 1973, çap: 7, beşa dîrok û agahan, r. 528

-The Encyclopaedia of Islam, University of Manchester, England [Îngilîstan], 1982,

new edition, vol. III, r. 758

² Li gor M. Elî Ewnî -ku ji pirtûka Farisnameyê digre-, ew Şenkare ye û ji Şebnekare, yan Şebankare yan jî Şewankare hatiye xirakirin. Ew navê eşîreke Kurdan e ku di navbera salên 421-756 [1030-1355] de li Îranê mîrîtiya Şebankare ya navdar avakiriye (M. Emîn Zekî, Xulasetu Tarîx el-Kurd we Kurdistan Mîn Eqdem el-'Usûr et-Tarîxiye 'Hett el-An, Wergêrê ji zimanê Kurdî bi bal Erebi ve: M. Elî Ewnî, Çapxaneyaya Selahuddîn, Bexdad 1961, çap: 2, cild: 1, r. 360).

³ Li gor M. Elî Ewnî, "el-Xersî Balû" ye û eslê wê "el-Xerzî" ye, ew jî ji Xerzan a ku bingehê wê Erzen a dîrokî ya herêma Diyarbêkrê ye (M. Emîn Zekî, r. 360).

Niha ji Erzenê re Xirebajar tê gotin.

⁴ Li gor Mu'cem el-Buldan eslê navê wê Sîsiyet e lê xelkê wê giş jê re Sîs dibêjin, ew dikeve navbera Antaqya û Tersûsê; saraya sultanê Ermeniyên wê herêmê Îbn Leyûn li wir bûye, di sala 1374'an de Dewleta Memlûkî ew vegirtiye û ruxandiye (Şîhab ed-Dîn Ebû Ebdullah Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, Dar Beyrûd, Beyrûd, 1957, c. 3, r. 297; El-Muncid Fî el-Luxe we el-E'lam, r. 377).

Sîs: Navê kevn ê Kozan a ku niha qezaya Edenê ye. Dibe ku jê mebest ev Sîs be. (M. Malmîsanij)

⁵ Herçendî di kitêba M. Emîn Zekî û di kitêba Subh ul-E'şa de "Beyt Lawn" dinivîse jî di destnivîsa cem min de bêhtir wek "Beyt Laren" yan jî "Beyr el-Eden" xûya dike û ger weha be dibe ku mebest pê Edena niha ya wîlayeta Kozanê-Li Tîrkiyê- be (M. Emîn Zekî, r. 361; Ehmed El-Qelqesendî, Subh ul-E'şa Fî Meqam el-înşa', Dar el-Kutub el-Melekiye, Qahîre, c. 4, r. 373; destnivîsa Mesalik el-Ebsar a li cem min, babeta çaran, r. 125).

Dibe ku mebest bi "Beyt Lawn" malbata Îbn Leyûnê serokê Ermeniyên hingê be lê dawî guhîrî be bûbe "Lawn".

⁶ Di biwara vê de tu agahdarî bi destê min neket.

⁷ Li gor M. Emîn Zekî "Deyawest" e. M. Elî Ewnî dibêje "Di pirtûka Mesalik el-Ebsar de 'Yadest' e, lê herdu jî şaş in çîku ew Mahîdeşt yan jî Maydeşt e herwekî kitêba El-Mu'cem jî dibêje ku 'navê kele û bajarekî li dora Xaniqînê ye'." (M. Emîn Zekî, r. 361)

⁸ Li gor M. Emîn Zekî "Derateng" e lê li gor M. Elî Ewnî "ew ji Derteng"ê hatiye xirakirin û di El-Mesalik û nexşeyên (xerîteyên) nûjen de jî wusa ye" (M. Emîn Zekî, r. 360).

⁹ Di ktêba M. Emîn Zekî de weha ye: "Hejmara wan ne zêdeyî ser pênc hezarî ye" (M. Emîn Zekî, r. 361).

¹⁰ Li gor M. Emîn Zekî ew eşîra Celaliyan a niha ye (M. Emîn Zekî, r. 361).

¹¹ M. Emîn Zekî wek "Datîrk" nivîsiye, lê li gor M. Elî Ewnî di Mesalik el-Ebsar de "Datsîrk" e û ew dibêje "Ez di tu ferhengan de rastî navekî wusa nehatime" (M. Emîn Zekî, r. 361).

¹² Li gor M. Elî Ewnî, ev der di Mesalik el-Ebsar de "Rengele" ye lê herdu jî xirabûyîyên jî "Zengene" ya Kurdî ya niha ne (M. Emîn Zekî, r. 361).

¹³ Di ktêba M. Emîn Zekî de "Keykûr" e, lê li gor M. Elî Ewnî ew jî "Kenkûr"ê xirabûye û jê re Qesra Dizan tê gotin (M. Emîn Zekî, r. 362).

Dibe ku ev Kengewer be jî.

¹⁴ Li gor M. Emîn Zekî -ku ji Daîret el-Me'arif el-Îslamiye digre- Kusadmabîr e, lê ew bi xwe "Basriye" digre û M. Elî Ewnî jî "Babîrî" dinivîse (M. Emîn Zekî, r. 362).

¹⁵ Li gor M. Emîn Zekî "el-'Hûse" ye, lê li gor M. E. Ewnî "el-Xûlse" yan jî "el-Xûle" ye (M. Emîn Zekî, r. 362).

¹⁶ Li gor M. Elî Ewnî dibe ku "Sibûlî" be lê ne dûr e ku herdu jî xirakiriyê "eş-Şûl" bin (M. Emîn Zekî, r. 362).

¹⁷ Rastiya wê yan Qertawî yan jî Kersawî ye (M. Emîn Zekî, r. 362).

¹⁸ Li gor M. Emîn Zekî "Bîsqad" e lê li gor M. Elî Ewnî xirabûyîya "Alîster"ê ye (M. Emîn Zekî, r. 362).

¹⁹ M. Emîn Zekî "Xefr" nivîsiye (M. Emîn Zekî, r. 362).

²⁰ Li gor Daîret el-Me'arif el-Îslamiye, ew eşîra Xoşnaw a niha ye, ew jî sê bavik in û yek ji wan li bajarê Kartawî û Derbenda Qereboylî ye ku li gor Hofman dikeve çiyayên nêzî Zabê Piçûk (M. Emîn Zekî, r. 362).

²¹ M. Emîn Zekî "Baltelî" nivîsiye (M. Emîn Zekî, r. 362).

²² Li gor M. Emîn Zekî "Derbend Qerayir" e, lê li gor M. E. Ewnî him di el-Mesalik û him jî di Daîret el-Me'arif de "Qerablî" ye (M. Emîn Zekî, r. 363).

Lê li gor destnivîsa ku li ba min e "Qeraylî" ye.

²³ M. Emîn Zekî "Deqûq en-Naqe" nivîsiye. Di Daîret el-Me'arif de dibêje "Navê wê eşîrê Tîrkarîn e û dikeve navbera Kerkûk û Tawuqê" (M. Emîn Zekî, r. 363).

²⁴ Li gor M. Emîn Zekî û El-Qelqêşendî "Eqreşûş" e (M. Emîn Zekî, r. 364; Ehmed El-Qelqêşendî, Subh ul-E'sa Fî Meqam el-înşa', c. 4, r. 375).

²⁵ Li gor M. E. Ewnî, di Mesalik el-Ebsar û di el-Kamil Fî et-Tarîx de ev nav "Herar" e, lê M. Emîn Zekî "Herat" dinivîsîne (M. Emîn Zekî, r. 364).

Di destnivîsa li ba min de jî "Hera" ye.

²⁶ Li gor M. Emîn Zekî "Til'heftûn" e û di Mesalik el-Ebsar de li paş Til'heftût tê (M. Emîn Zekî, r. 364; destnivîsa Mesalik el-Ebsar we Memaalik el-Emsar, beşa çaran, r. 128 û 129).

²⁷ Di kitêba M. Emîn Zekî de, li vir di peyv û hevokan de tevîhevî û guhartin heye. Ji xwe M. Emîn Zekî jî "Mesalik el-Ebsar"ê giş negirtiye, wî beşa Mesalik el-Ebsarê ya ku di Sub'hul-'Eşayê de heye, girtiye (M. Emîn Zekî, r. 364; Ehmed El-Qelqêşendî, r. 375).

²⁸ Li gor M. Emîn Zekî "eş-Şehrî" ye, lê M. Elî Ewnî dibêje "Di Daîret el-Me'arif de 'es-Sûrî' ye û mebest pê Kurdên Soran (Suhran, Suhranî) e". (M. Emîn Zekî, r. 365).

²⁹ M. Emîn Zekî û El-Qelqêşendî "Şe'labad" dinivîsin, lê li gor M. Elî Ewnî ew jî "Şeqlabad"ê xirabûye û mebest pê "Şeqlawe"ya niha ya girêdayî bi Erbîlê [Hevlêr] ve ye. Ew jî Mesalik el-Ebsar bi xwe jî rêzekê digre û van navan wek "Şeqlawer" û "Heftîyanî Ebî Elî" dinivîse (M. Emîn Zekî, r. 364; Ehmed El-Qelqêşendî, r. 375).

Lê di destnivîsa di dest min de Şeqlabad û Xeftîyanî Ebî Elî ye (destnivîsa Mesalik el-Ebsar a li cem min, r. 129).

³⁰ Ev "Derbenda Heftîyan" e ku niha nêzikê Rewandîzê ye (M. Emîn Zekî, r. 364).

³¹ **Zahid:** Kesê ku ji bo riya Xwedê bi tena serê xwe dikeve xênî yan odayekê û xwe jî xwarin û her cûre kêf û şahiyê digre.

³² Li cem M. Emîn Zekî û El-Qelqêşendî "Uşne" yan jî "Eşne" ye (M. Emîn Zekî, r. 365; Ehmed El-Qelqêşendî, r. 376).

³³ Li gor dîne Îslamê, "**Zemherîr**" navê cihêkî ye ku pir sar û bi seqem e; yê ku jî agir hatibe afirandin (mîna Şeytan û cinan) li dinya wî alî di şûna dojhê de dikeve wir.

³⁴ M. Emîn Zekî "Mazkird" nivîsiye lê ew ji Daîret el-Me'arifê "Rûbarê Berazkird" digre ango Çemê Berazkird yan jî Berazcird e (M. Emîn Zekî, r. 365).

³⁵ Li gor destnivîsa ku di destê min de ye dikare "el-Hetaq" jî bê xwendin (destnivîsa Mesalik el-Ebsar a li cem min, r. 130).

Di Daîret el-Me'arif de dinivîse "Ristaq dikeve başûrê Şemdînan a niha" (M. Emîn Zekî, r. 365).

³⁶ Li gor M. Emîn Zekî û El-Qelqêşendî ew navê bavikekî Ereban e (M. Emîn Zekî, r. 366; Ehmed El-Qelqêşendî, r. 376).

³⁷ M. Emîn Zekî "Başak" nivîsiye, lê li gor M. Elî Ewnî "Masak" e (M. Emîn Zekî, r. 366).

³⁸ M. Emîn Zekî "Esed îbn Meklan" nivîsiye, 'Îmadeddîn kurê wî ye û Esededdîn jî hê dibe kurê wî (M. Emîn Zekî, r. 366).

³⁹ El-Qelqêşendî û M. Emîn Zekî "Bilad ed-Dînar" dinivîsin, lê li gor wergirtina M. Emîn Zekî ji Daîret el-Me'arif el-Îslamîye, ew "Zîbar" a niha ye (M. Emîn Zekî, r. 367; Ehmed El-Qelqêşendî, r. 377-78).

⁴⁰ M. E. Ewnî dibêje "Rastiya wê Merkewar e û mebest pê herêma 'Mergewer'a xuşka 'Tergewer'ê ye" (M. Emîn Zekî, r. 367).

Lê di destnivîsa li cem min de "Merkewan" e (destnivîsa Mesalik el-Ebsar a li cem min, r. 132).

⁴¹ Herçendî M. Emîn Zekî nivîsiye "Kurdar" jî, ew ji Daîret el-Me'arif digre û dibêje "Di Daîretê de Gewer (Cewer)' a navdar e" (M. Emîn Zekî, r. 367).

⁴² **ulam ulam:** Dibe ku mana wê "wan gazî kir û kire qîreqîr" be, lê mixabin min eseyîya wê dernexist.

⁴³ Ev der di berhema M. Emîn Zekî de Harûn e, lê li gor M. Elî Ewnî ku ji Mesalik el-Ebsar û Îbn el-Esîr wergirtîye Herûr e. Di destnivîsa li cem min de Herûz e (M. Emîn Zekî, r. 367; destnivîsa Mesalik el-Ebsar a li cem min, r. 134).

⁴⁴ Di Erebiya van çend paragrafên jorî de tevîhevîyek heye û ew bi zor tê xwendin. Ew nîvrûpel di kitêba binavkiriya Ehmed El-Qelqêşendî û ya M. Emîn Zekî de tine.

⁴⁵ M. Emîn Zekî "Tenbekî" nivîsiye lê li gor ku ji Daîret el-Me'arif girtiye ew "Bestekî" ye û dikeve nav çiyayên Ermenîyan û Şikefta Dawud (M. Emîn Zekî, r. 368).

Bi ya min rastiya wê "Sibkî" ye û armanc jê eşîra Sipkiyan a ku niha jî heye û dikeve dora çiyayê Agrî.

⁴⁶ Li vir dewsa navê mîr vale maye. Ew yan jê çûye yan jî nehatiye nivîsin.

⁴⁷ Li gor M. Emîn Zekî "et-Tehtî" ye lê xûyaye ku şaş e (M. Emîn Zekî, r. 368).

⁴⁸ Her çendî M. Emîn Zekî "er-Rasîne" nivîsiye jî, wî ji Daîret el-Me'arif girtiye ku "ew eşîra Dasînî ye û serokê wan jî Bedreddîn e". Li gor M. Elî Ewnî "Rasînî" jî "Dasînî" yê xirabûye û ew ji Mu'cem ul-Buldan, c. 2, r. 538 werdigre ku "Dasînî navê çiyayekî mezin e, ji aliyê rojhilatê Dîcle ve dikeve bakurê Mûsilê û gelek bavikên Kurdan ku ji wan re Dasînî tê gotin, li wir dijîn" (M. Emîn Zekî, r. 368).

⁴⁹ M. Emîn Zekî wek "Deynekî" nivîsiye, lê li gor M. Elî Ewnî rastiya wê "Dunbulî" ye. Herweha ew ji pirtûka bi navê el-Qamûs werdigre û dibêje "Dunbul bavikek jî nifşê (nesl) Kurdan e ku niha jî wan re Zaza û Dunbilî tê gotin" (M. Emîn Zekî, r. 368).

CIVATA AZADIYA KURD (Kürt İstiklal Cemiyeti) II

Zinar Soran

ARMANC Û STRATEJİYA AZADÎ

Di destê me de, program û destûra rêxistina "Azadî" yê tuneye. Herweha, em baş nizanin ku bê program û destûra wê rêxistinê bi niviskî hebûn ya na. Lê mirov dikare ji wan agahdariyên ku li jor hatinin nivîsandin û ji agahdarî û raporên ku hinek serbazên Kurd yên endamên vê rêxistinên bûn, bighêje hinek encaman.

Beriya her tiştî, Azadî weke rêxistinek îllegal hatibû avakirin û armanca Kurdistanek serbixwe dabû pêşiya xwe. Navenda Azadî û rêxistinîya wê ne li metropolê, li Kurdistanê bû. Xalid Begê Cibranî û hevalên wî, li gor îmkan û teknîka wê demê xwestine ku li ser danûstendinek piralî û berfireh tevgirêdanek xurt damezirînin û ji bo Kurdistanek serbixwe, serhildanek çekdarî amade bikin. Ji bo vê armancê jî, berpirsiyarên Azadî ji aliyekê têkilî bi muxalefeta Mustefa Kemal re danîne û xwestine ku doza neteweyê Kurd bigihîne Koma Milletan; ji aliyê din jî peywendî bi şêx, axa, mele, xwendekar û memûrên Kurdan re danîne û xwestine ku bi beşdariyek fireh serhildanek çekdarî li dar xine. Lê teva vê yekê jî, mirov nikare bibêje ku ew têkilî û rêxistinîya Azadî gihiştibû qonaxeke weha têr û stewyayî. Şax û rehên rêxistinê, di nava civata Kurd de, kûr û berfireh belav nebûbûn. Azadî di giraniyê de, di nava serbaz, hinek serokeşîr, mele, memûr û navdarên Kurdan de mabû. Li gor Metîn Toker dinivîsîne; "Kürt İstiklal Komitesi" li ser esasê komikan hatibû hûnandin. Her komik ji pênc kesan pêk dihat; ji komikê yek kesî kesekî ji komika din nas dikir û têkilî bi wî re datanî¹⁷.

Pêşengên rêxistina Azadî di giraniyê de, hesab û planên xwe yên serhildanê li ser hêzên eşîrên Kurdan çekiribûn. Wan bawer dikirin ku wê eşîrên Kurdan ji serhildanê re amade bin û serbazên Kurdan jî wê Li gor tecrûbeyên xwe yên leşkerî wan îdare bikin. Bi gotinek din, wê hêza çekdarî ya serhildanê ji eşîrên Kurdan û fermandarê wan jî, ji serbazên Kurdan bihata

pêk anîn. Bi vê bîrûbaweriyê, wê tevger weha bihata meşandin:

1. Li seranserî Kurdîstana Tirkîyê wê li hemberî Tirkan gelek serhildan bihata li dar xistin.

2. Di dawîya tevgerê de, li navçeyek rizgarkirî, wê hukûmeteke neteweyî bihata damezrandin.

3. Wê weke dewletek serbixwe perwerdekirin, cotyarî, dewlemendîya xwezayî bihata pêşve birin.

4. Ji bo pêkanîna wan armancan wê alîkariya çek, malzeme û piştgiriya dîplomatîk ji hukûmeta Îngîlîstanê bihata xwestin; lê wê bi tu awayî daxwaza leşkeran nehata kirin.¹⁸

Martin van Bruinessen jî, li ser plan û stratejiya serhildanê weha dinivîsîne:

"Lê mirov nikarîbû bigota ku planekî stratejîk yê bideştgirtî hebû. Tiştê herî pir ku dihate kirin, bideştçistina piştgiriya giregirên bi rûmet yên herêmê bû. Di seranserî Kurdîstanê de serhildanek giştî û îlankirina hukûmetek Kurd, ji bo damezrandina Kurdîstanek serbixwe têr dihate dîtin. Dihate zanîn ku di nav Tirkan de muxalefetek ciddî ya olî li dijî Mustefa Kemal heye. Di vê rewşê de, rûyekî olî ji bo serhildanê avantajek dihate dîtin. Di Meclîsê de, hin çênebûna yekgirtinek tam jî, ji bo berfirehiya beşdariya serhildanê wê tesîrek erênî bikira. Ji bo ve yekê jî, bi Sultan Xelîfe Vahdettîn yê li surgûnê re têkilî hatin danîn. Piştgiriya resmî ya Sultan Xelîfe, ji bo razîkirina xelkê wê gelekî tesîr bikira".¹⁹

Li gor agahdariyên ku Martin van Bruinessen ji Mele Hesên Hîşyar girtine; Azadî kongreya xwe ya yekem di sala 1924-an de çêkirîye û Şêx Seîd jî beşdarî ve kongreyê bûye. Di vê kongreyê de, du biryarên girîng hatine girtin:

"1. Wê li Kurdîstanê serhildanek giştî dest pê bikira û bi dû re serxwebûn bihata îlan kirin. Serhildan bi her awayî bihata plankirin. Ji bona ku wê ev kar demeke dirêj bigirta, wê beşdar di derheqên wezîfeyên ku ji wan bihatina xwestin tam bihatana agahdarkirin.

2. Wê hewil bihata dan ku piştgiriya ji bo tevgerê pêwîst, ji Îngîlîzan, Fransîyan û Rûsan bihata girtin. Lê gelek fermandarên milîs li dijî namzetê dawîn bûn. Ji ber sedema olî, Rûs ji xwe re dijminekî herî mezin dihesibandin. Di vê rewşê de, Tirk ji bolşevîkên bêol bêtir nêzîkî xwe didîtin. Şêx Seîd bawerîya wan pê anî ku di dewsa ku ji aliyê Tirkan ve weke Ermenîyan bibin, girtina alîkariya bêolîyan mubah e. Derhal qasid şandin Gurcîstanê. Yekîtiya Sovyetan diyar kir ku ew dê piştgiriya tevgerê bike, lê mercê wê yê alîkariyê tuneye. Herweha wan garantiyê dan ku wê bi tu awayî piştgiriya hukûmeta

*Tirkan nekin. Di tefandina serhildana Kurdan de, bi Îngilîzan jî têkilî hatibû danîn, lê bêencam mabû”*²⁰

HEWILDANA SERHILDANA BEYTUŞŞEBABÊ

Di 7-ê Tebaxa 1924-an de, li derdora Çalê, Oramarê, Çolemergê, Beytuşşebab û çemê Xabûrê serhildana Nestûriyan dest pê kiribû. Hukûmetê di 14-ê Tebaxê de biryara tefandina wê serhildanê girtibû û ev vatinî dabû Cafer Tayyar Paşa. Lijneya Wezîran plan dikir ku ji bo tefandina wê serhildanê ji eşîrên Kurdan îstifade bike. Ji bo vê yekê jî, Tirkan têkilî bi serokê eşîra Şikakan, Simko re danîn. Simko di wê demê de, di nav ”sînoren Tirkîyê” de dima.²¹

Ji bo vê tevgerê, hinek serbazên Kurdan Yuzbaşî Îhsan Nûrî, Teymen Xurşît, Rasim, Riza û Tewfîq jî li wê navçeyê bûn. Ew endamên rêxistina Azadî bûn. Serbazên Kurdan di peywendiyên xwe yên rêxistinî de, telgrafên leşkerî jî bi kar dianîn. Di 31-ê tebaxa 1924-an de Teymen Riza ji birayê xwe Yusuf Ziya re vê telgrafê dişîne: *”Ji bona wî mîqdarê pereyê ku daxwazkirî hewaleyê ser hesabê te bibe, ez li benda bersîva te me”*. Yusuf Ziya jî, ji birayê xwe Riza re vê telgrafê dişîne: *”Ez diherim Erziromê. Miqdar tayinkirin ne pêwîst e. Hema di cî de û bi lez peran bişîne. Bê ku li benda hatina min bimînin, agahdariyê bidin Bahattîn û Faîq”*. Bahattîn birayê Yusuf Ziya bû û li Erziromê memûr bû. Faîk jî zavayê Yusuf Ziya bû.²²

Telgrafa Yusuf Ziya ya ku ji birayê xwe Riza re dişîne ji aliyê serbazên Kurdan yên li navçeya Beytuşşebabê bûn ve, weke îşareta serhildana giştî tê şîrove kirin. Ji ber vê yekê jî, di 4-ê Îlona 1924-an de, çar serbazên Kurdan li derdora 350 leşkerên Kurd ve firar dikin û di serokatiya Îhsan Nûrî de dest bi serhildanê dikin. Di raporeke ku ji Serkaniya Giştî ya Dewleta Tirkîyê re hatiye şandin de, ev serhildana tenê weke firareke basît ya leşkerî hatiye nîşandan. Albay Reşat Hallî li ser vê rewşê weha nivîsandiye:

*”Di dema ku ji bona pêkanîna ewlekariya welêt û tefandina serhildana rûdayî hewildan dihatin kirin de, di nava van desteyên leşkerî ku wê ev vatiniya pêk bianiyan de, derketina hedîseyên xemgînî, fermanदार bêtir mijûl dikirin. Di raporeke ku di 4-ê Îlona 1924-an de ji Serkaniya Giştî re hatiye şandin de, hatiye diyarkirin ku ji grûbên Beytuşşebabê Alaya 18-an, tofa (bölük) yekem ya serbaz Hurşîtê Wanî ku ji 76 kesan pêk tê û piştî wê bi demekê, di femandariya Yuzbaşî Îhsan de, grûbeke ji 275 kesan pêk tê, bi Teymen Rasim, Teymen Tewfîq, 10 otomatîk, 380 tîfing û 800 kg genimê ji embara Garnahê re, ber bi îstiqameteke nediyar ve firar kirine...”*²³

Ev serhildana bêwext, ji tu derê Kurdistanê alîkarî û piştgiriye nagire. Herweha tu tevlivandinek ji nav eşîrên vê derdorê ku di nava haziriya serhildanê de bûn jî, nayê xwanêkirin. Îhsan Nûrî û hevalên xwe li serê çiyê bi tenê dimînin. Weha diyar dibe ku piştî serhildanê, di nav serbazên Kurdan yên dest bi serhildanê kiribûn û navenda rêxistinê de peywendî û diyalogeke pêwîst çênebûye. Yusuf Ziya di 11-ê Îlona 1924-an de, ji zavayê xwe Faîq re vê telgrafê dişîne: *"Çûna min ya Ankarayê bi hatina pereyên ku ji Rîza werin ve girêdayî ye. Heta sibê agahdariya ku hûn ji wî bigrin, bişîne"*. Faîq jî di 12-yê Îlona 1924-an de, ji Yusuf Ziya re vê bersivê dişîne: *"Berî niha bi hefteyekê Rîza 300 lira bi riya Hecî Mehemed hewale kiribû. Ez tê nagihêjim ku bê çima we heta niha ew negirtiye. Min pez şandin Sêrtê. Eger bê frotin, ez ê bişînim. Sihata me li cih e"*.²⁴

Gava serbazên Kurdan dibînin ku îmkana domandina serhildanê tune, leşkerên di bin fermandariya wan de bûn terhîs dikin û ew jî neçar dimînin ku derbasî Sûriyê bibin. Bi dû re jî, ew di ser Sûriyê re derbasî Başûrê Kurdistanê dibin. Başûrê Kurdistanê, di wê demê de di bin manda Îngilîzan de bû.²⁵

Ev serhildana bêwext ya Beytuşşebabê, bû sedemê ku hukûmeta Tirk bêtir êrîşî ser rêxistina Azadî bike. Ji xwe beriya vê bûyerê jî hayê hukûmetê ji rêxistina Azadî û haziriya serhildanek Kurdî çêbûbû û ew ji nêzîk ve taqîb dikir. Karbidestên Tirk bi behaneya wê telgrafê, dest bi girtina berpisiyarên rêxistina Azadî kirin. Yusuf Ziya, Xalid Begê Cibranî, Hecî Mûsa Beg û li derdora bîst hevalên wan hatin girtin û şandin dadgeha leşkerî ya Bedlîsê.

Yusuf Ziya piştî ku tê girtin jî vê telgrafê ji Faîq re dişîne: *"Ez girtî me, nikarim herim Ankarayê. Pêwîstiya min bi peran nema. Lê bipirse, bê ew pere li ku dere man"*.²⁶

Li gor ku M. Şerif Fîrat dinivîsîne; Yusuf Ziya ji bo rewşê fêhm bike tê Erziromê û li wê derê di 10-ê Çiriya Pêşîn de tê girtin. Ji bo di dadgeha leşkerî de bê mahkeme kirin, bi mufrezeyek leşker ve wî dişînin Bedlîsê. Piştî wî, Hecî Mûsa Beg tê girtin û hukûmet biryara girtina Xalid Begê Cibranî û hevalên wî dide. Lê Xalid Begê Cibranî nakeve tatoleka girtin û kuştina xwe. Wî bawer dikir ku gava hukûmet wî bigre jî wê piraniya xelkê Erziromê û serbaz û leşkerên Kurdan yên di ordiyê de ne, wî xelas bikin. Mufrezeyek leşkerê Tirk di şeva 20-ê Çeleya Pêşîn ya 1924-an de Xalid Begê Cibranî di koşka wî de digrin. Di eynê şevê de wî ji nav Erziromê derdixînin, bi otomobîleke di ser Ercîş û Wanê de tînin Bedlîsê û dixînin zîndanê.²⁷

Ji telgrafa dawî ya ku Yusuf Ziya ji zavayê xwe Faîq re şandiye diyar dibe ku Yusuf Ziya piştî girtina xwe jî xwestiye mesajekê bide hevalên xwe ku ew

li ser rewşa nû rawestin û li bûyera Beytuşşebabê bipirsin. Lê teva vê yekê jî, serokê rêxistinê Xalid Begê Cibranî xwe nedaye alî û li gor wê rewşa nû û taybetî, tedbîrên xwe yên pêwîst nestendiye. Bêguman sebeb çî dibe bila bibe, ew helwesta wî, şaşî û îhmaliyek pir mezin bû. Ew şaşî û bêtedbîrî, ne hew bi jiyana wî dibe mal; herweha li ser qedera serhildanê jî tesîteke gelekî mezin ya neyînî dike.

Ekrem Cemîl Paşa ku yek ji wan niştimanperwerên di nav gelek komeleyên Kurdanyên wê demê de xebitîbû û damezrênerê kîliqê Diyarbekirê ya rêxistina "Azadî" yê bû, di bîranînên xwe de hinekî li ser metodê xebata Yusuf Ziya û helwestên wî jî radiweste û di vî warî de nerazîbûna xwe weha dide diyarkirin:

"Di havîna 1924-an de, me jî liqekî vê rêxistinê damezrand. Têkiliyên me bi hevdu re gelekî xurt bûn. Yusuf Ziya Beg pir xeyalperest û zêde xwîngerm bû, li hevalan tahakumî dikir. Ez nizanim, bê çawa li Ankara baweriya xwe bi Tirkan anî. Bi Fethî Begê ku demek dirêj serokvezîrê Mustafa Kemal bû, yekîtî çêkiribû. Wê Kurdan li Kurdistanê, Tirkan jî li Ankarayê şoreş li dar xistina. Xwedê dizane, serokê rêxistinê Xalid Begê jî hate lîstika vî zilamî; bi Yusuf Ziya re, bê wext, bê pere, bê çek, bê cebxane, bê heval, bê hazîrî, derbeder û perîşan, bûn sebebên şoreşa Kurd ya 1925-an".²⁸

LÎSTIKÊN DEWLETA TIRKIYÊ Û SERHILDANEK BÊWEXT

Karbidestên hukûmetê dixwestin ku Şêx Seîd û Xalid Begê Hesenan jî bigrin û heta mumkun be tevgerê bê pêşeng û berpirsiyar bihilin. Weke taktîk Hecî Mûsa Beg berdane û xwestin ku bi fen û fûtan Xalid Begê Hesenan û Şêx Seîd jî berdest bikin. Dadgeha Leşkerî ya Bedlîsê, ji bo îfadegirtinê xwest ku Xalid Begê Hesenan û Şêx Seîd binin Bedlîsê. Xalid Begê Hesenan di zanebûna bêbextiya hukûmeta Tirk de bû û ji bo wê jî xwe berdest nekir. Şêx Seîd jî niyete Tirkan fêhm kiribû û ji bo vê yekê jî yextiyariya xwe kir behane û xwest ku îfadeya xwe li Xinisê bide. Li ser vê daxwazê, bi fermana wîlayeta Erziromê, di 22-ê Çeleya Pêşîn ya 1924-an de îfadeya Şêx Seîd li Xinisi hate girtin.²⁹

Gava Şêx Seîd ji Xinisê vedigere, têkilî û gerên xwe yên di nava xelkê de berfirehtir dike. Eşîrên dijminatî di nav wan de hene, li hevdu tîne û hewil dide ku yekîtî û tifaqa nav wan xurttir bike. Xalid Begê Cibranî jî, di girtîgehê de qasidekî dişîne cem Şêx Seîd, jê daxwaz dike ku ew di cî de serokatiya tevgera serhildanê bigre ser milên xwe. Di ser Diyarbekirê re têkiliyê bi Suriyê re dîne. Her eşîr li navçeya xwe êrîştî ser navendiyên

hukûmetê bike û ew li wî nefikirin. Gava Şêx wê daxwaza Xalid Begê Cibranî digre; bi nameyekê ji Xalid Begê Hesenan re diyar dike ku divê ew di kês û firsenda pêşîn de, bi hemû hêza xwe di ser Melazgirtê re êrîşt ser Bedlîsê bike û Xalid Begê Cibranî xelas bike.³⁰

Lê mixabin ew plan û hewildana ku Xalid Begê Cibranî ji zîndana Bedlîsê rizgar bike, di pratîkê de nakeve jiyânê. Herweha piştî hewildana serhildana Beytuşşebabê û girtina pêşengên Azadî, ji bo tevgera Kurdî û haziriya serhildana giştî jî rewşeke gelekî nazik û taybetî derketibû holê. Hukûmeta Tirk bi awakî eşkerê pê hisyabû ku Kurd di nava haziriyek berfireh û serhildaneke mezin de ne. Tevgera Kurdî jî di vê rewşê de neçar mabû ku destê xwe zûtir bigre û di demek herî nêzik de dest bi serhildanê bike. Ji ber vê yekê jî, hukûmeta Tirk ji bona ku ev tevger û serhildan li gor plan û amadekirina Kurdan dest pê neke û berî ku bistewe bifetisîne, dest bi haziriyek taybetî kiribû. Herweha rola Şêx Seîd ya di nav vê tevgerê de jî bêtir hatibû naskirin û hêzên dewletê Şêx Seîd gav bi gav taqîb dikirin; li kês û firsenda ku tevgerê beravêtî bikin, digeriyan.

Gava Şêx Seîd hate Pîranê, qomandarê qereqolê xwest ku çend kesên bi Şêx Seîd re ne bigre û bi vî awayî rûmeta Şêx di nav xelkê de bişkîne. Her çiqasî Şêx nedixwest ku bûyerê weha rû bide jî, qomandarê Tirk ji ser daxwaza xwe nehate xwarê. Li ser vê rewşê, di 8-ê Sibata 1925-an de, şer di nav leşkerên Tirk û birayê Şêx Seîd, Şêx Evdîrehîm û hevalên wî de, dest pê dike. Di vî şerî de, hinek leşkerên Tirk tên kuştin û birîndar kirin. Bi wî awayî, fitîla serhildana Şêx Seîd bêwext tê pêxistin.³¹ Bûyera Pîranê ji bona rêxistina Diyarbekirê ya "Azadî" yê jî bûbû şokeke mezin. Di vî warî de, Zinar Silopî ku yek ji endamên vê rêxistinê bû weha dinivîsîne:

"Gava me li Diyarbekirê bihîst ku di 8-ê Sibata 1925-an de, li Pîranê çend leşkerên qereqola Tirk hatin kuştin; em, ew kesên ku endamên rêxistina Azadî bûn û haya me ji vê meselê tunebûn, tenegehiştin ku naveroka vê bûyerê û armanca wê çibû. Ji ber ku serokê rêxistinê Xalid Cibrî û endamên xwedînişîfûz girtî bûn û hûnandina rêxistinê jî hîn temam nebûbû. Me bi biryara rêxistinê destpêkirina serhildanê gelekî dûr didît. Em di nava heyret û tatolekê de mabûn. Di dema ku me mirovek şandibû cihê bûyerê û em li benda xebera rastiya vê meselê bûn; ez teva hevalên ku kurdperwer hatibûn naskirin, hatim girtin".³²

Şêx Seîd nedixwast ku weha bê hazirî û bê wext serhildana giştî dest pê bike. Ji bo serhildan li derê din dest pê neke, ji Pîranê derdikeve. Lê deng û bahsê vê bûyerê zû belav dibe. Ji bo ku li gelek deran Kurd di nav hazirî û heyecana serhildanê de bûn, serhildan weke agir û pîşo belav dibe. Bi gotinek

pêşyan, "êdî tîr ji kevên derketibû". Bi vî awayî, serhildanek din ya Kurdan bê wext û bê stewardin dest pê kiribû. Ev jî, ji bo dewleta Tirkîyê bi peran nedihate kirin.

Piştî bûyera Pîranê, karbidestên dewletê li Diyarbekirê jî dest bi girtina niştimanperwer û rewşenbîrên Kurdan kirin. Di 19 yan jî 20-ê Adara 1925-an de jî Xalid Begê Cibranî û Yusuf Ziya hatin îdamkirin.³³ Dewleta Tirk baş dizanîbû ku tevgerêk bê pêşeng û kadroyên siyasî, dikare bi awakî hêsantir bê tefandin.

Gava serhildana Şêx Said bi ser neket, gelek niştimanperwer û rewşenbîrên Kurdan yê ku beşdarî serhildanê nebûbûn jî, di "Mahkemeya Îstiqlalê ya Diyarbekirê" de bi îdam û cezayên giran hatin cezakirin. Ji ber ku dewleta Tirkîyê ne hew hesab û planên wê rojê, herweha yê pêşerojê jî dikir. Muxalefeta Mustefa Kemal û ew kesên ku dikarîbûn di pêşerojê de bibana muxalefet jî, ji ber wê zilm, zordarî û hovîtiya Mustefa Kemal xelas nebûn û dengên wan jî hatin birin.

Di encamên biryarên Dadgeha Îstiqlalê ya Diyarbekirê de; di 27-ê Gulana 1925-an de Seyîd Evdulqadir, Seyîd Mihemed, Kemal Fewzî, Sadiyê Paloyî, Xoce Eskerî û Av. Hacî Axtî li Diyarbekirê hatin daliqandin. Bi dû re jî, vê dadgeha kolonyalîst biryara îdama 48 kesên din da. Ji nav wan, cezayên du kesan hatin sivikkirin û yê din teva Şêx Seîd di şeva navbêna 28 û 29-ê Hezîrana 1925-an de, li Diyarbekirê hatin îdamkirin.³⁴

SIYASETA KOLONIALÎST Û AZADÎ LI HEVDU NAKIN

Dewleta Tirkîyê ji destpêkê de, li ser bingehê xapandin û fen û fûtan hatiye avakirin. Soz û peymanên ku ji bo Kurdan û azadiya giştî hatibûn dayin, piştî damezirandina dewletê hêdîhêdî hatin jibîr kirin. Dewlet, li gor "yek dewlet", "yek şef", "yek millet", "yek partî" û "yek îdeoloji" hate birêvebirin. Mustefa Kemal û berdevkên wî, di tu demê de kês û firsend nedanin daxwaz û tevgerên mafên cûda û azadiyeke giştî. Partiya resmî ya dewletê "Cumhuriyet Halk Fırkası" (CHF) bû. Serokê Giştî yê vê partiyê jî Mustefa Kemal bû. Vê wezîfeya wî di dema ku bû Serokkomar jî dom kir. Hemû desthilatdarî di destên vê partiyê û serokê wê Mustefa Kemal de bû. Teva ku demdema avakirina hinek partiyên din yê siyasî dihat dîtin jî, ew di pratîkê de nedibûn xwediyê jiyaneke dirêj û simbolîk diman.

Ev siyaseta Mustefa Kemal, di dema serhildana Şêx Seîd de jî bi awakî pir êşkere berdewam kir. Di wê demê de desthilatdarî dîsa di destê partiya Mustefa Kemal "CHF"ê de bû. Ji ber sedemê nexweşiya xwe, İsmet Paşa di

22-ê Çirya Paşin ya 1924-an de, ji serokwezîrtiyê îstifa kiribû û li ser daxwaza doktoran li Stenbolê bi cih bûbû. Di dewsa wî de Fethi Beg bûbû serokwezîr. Gava serhildana Şêx Seîd dest pê kir, di warê tebdîrên ji bo tefandina vê serhildanê de, nakokî di nav serokwezîr Fethî Beg û serokkomar Mustefa Kemal de derket holê. Li gor Fethi Beg bûyera Pîranê serhildaneke herêmî bû. Ji bona tefandina vê serhildanê jî tebdîrên herêmî têrê dikirin. Pêwîstiyek ku li tevayê Tirkiyê tebdîr bên girtin tune. Divê hukûmet tenê li ser tebdîr û pêwîstiyên herêma serhildanê raweste. Wî nedixwest ku ev bûyer weke ku di rojnameyan de dihate mezinkirin, bête pêşkêşkirin û di nava raya giştî de heyecaneke taybetî çêbibe. Lê Mustefa Kemal di vî warî de weke wî nedifikirî. Mustefa Kemal dixwest ku ne tenê li navçeya Kurdistanê û serhildanê, herweha li tevayîya Tirkiyê li dijî hemû muxalefata ku heye tebdîr bêne girtin.³⁵ Daxwaza Mustefa Kemal ev bû ku bi vê wesîleyê li tevayê Tirkiyê, dengê hemû rojname û kovarên ku weke wî nedifikirîn ji binî de bibire û partiya muxalîf "Terakkiperwer Cumhuriyet Fırkası" (TCF) jî ji holê rake. Ji xwe, di warê tebdîrên li hemberî Kurdan de, tu cihêrî di nav Mustefa Kemal û serokwezîr Fethî Beg de tunebû.

Mustefa Kemal li gor vê siyaseta xwe, ji Fethi Beg daxwaz kir ku berpirsiyarên "TCF"ê bi destên xwe partiya xwe bigrin. Li ser vê daxwazê, Fethi Beg di 25-ê Sibata de, serokê "TCF" Kazım Karabekir û hinek berpirsiyarên vê partiye dawet dike û vê daxwazê ji wan re weha tîne zimên:

"Ji bona ku ez bi daxwaza ku hûn firkaya xwe bi destên xwe bigrin, hatime memûr kirin. Eger hûn belav nekin, ez pêşerojê tarî dibînim. Wê xwîn bête rijandin".

Li ser vê daxwazê, Kazım Karabekir vê bersîvê dide Fethî Beg:

"Di çarçeweya qanûnê de damezirandina firqayê di destê me de ye. Lê belavkirina wê ne di destê me de ye. Hûn hukûmet in. Bi her awayê hêz û wasiteyên we hene. Gava hûn bixwazin hitilmitil, firqaya me bigrin, ev tişt di destê we de ye".³⁶

Mustefa Kemal ji bona vê rewşa nû bi Îsmet Paşa re bipeyive û wî dîsa bike serokwezîr, wî dawetî Ankarayê dike. Ew, berî ku meclîsê bicivîne Îsmet Paşa, Serkanê Giştî Fevzi Çakmak Paşa û cîgirê serok Kazım Orbay li Çankayayê dicivîne û di vê civînê de hemû plan û taktîkên xwe amade dikin. Piştî civîna Çankayayê, Mustefa Kemal di serokatiya xwe de Lijneya Wezîran kom dike û Serkanê Giştî Fevzi Paşa jî dawetî vê civînê dike. Di 2-ê Adarê de jî, Mustefa Kemal grûba "CHF"ê dide civandin. Çarenûsa Serokwezîr Fethi Beg û hukûmeta wî êdî diyar dibe. Hevalbenden Mustefa Kemal

daxwaznameyeke ku hukûmet siyasetek hişk û bi şiddet bimeşîne, Mahkemeyên Îstiqlalê damezrîne û sînorên îdareya awarteyî firehtir bike, pêşkêş dikin. Di dengdanê de, aliyê Fethî Beg 60 dangan û yê Mustefa Kemal jî 94 dangan digrin. Li ser vê yekê, Fethî Beg neçar dibe ku îstifa bike. Mustefa Kemal di cih de îstifa wê qebûl dike û wezîfeya damezrandina hukûmeta nû dide Îsmet Paşa.

Gava Îsmet Paşa hukûmeta nû ava dike, bi awayekî pir eşkere diyar dike ku *"ew dê li hemberî bûyerên ku dikarin li tevayê welêt derkevin, tedbîran bistîne"*. Ev gotinên Îsmet Paşa diyar dikir ku wê hukûmeta nû siyaseta Mustefa Kemal bimeşîne. Şeva ku hukûmeta nû ji aliyê meclîsê ve hate pijirandin, Îsmet Paşa daxwaza *"Qanûna Takrîr-î Sukûn"*ê pêşkêşî meclîsê kir û bi meclîsê da qebûl kirin. Bi vê qanûna taybetî, Mustefa Kemal û Îsmet Paşa dixwastin ku bi sistemek despot û girtî welêt îdare bikin. Ji bona pêkanîna *"şoreşên"* ku wan dixwastin, welatekî bi her awayî ker û lal pêwîst bû. Li gor bîr û baweriya Mustefa Kemal û aqilmendên wî, *"şoreş û azadî bi hev re nikarîbûn bijiyana"*. *"Wan rewş û halekî weha dixwastin ku bikaribin şoreşên xwe temam bikin. Di rewşekî weha de, wê tenê bêdengiyeye mirî hakim ba. Wê kesekî kiryarên dihatin kirin munaqêşe nekirina. Tiştên ku dihatin kirin, wê tenê bihatina pesinandin..."*³⁷

Îsmet Paşa û Mustefa Kemal qîma xwe bi wê qanûnê jî neanîn. Di 31-ê Tîrmehê de jî, vê carê *"Qanûna Mahkemeyên Îstiqlalê"* pêşkêşî meclîsê kirin û dan derxistin. Li gor wê qanûnê, yek li Kurdistanê û yek jî li Ankarayê du Mahkemeyên Îstiqlalê hatin ava kirin. Mahkemeya Îstiqlalê ya Kurdistanê wê li navçeyên serhildanê bixebitiya. Mahkemeya Îstiqlalê ya Ankarayê jî, ji derveyî herêmên leşkerî, hemû navçeyên din dixiste nava sînorên dest-hilatdariya xwe. Êdî hefsarê dewleta Tirkîyê bi her awayî ketibû destên Mustafa Kemal û Îsmet Paşa.

Piştî ku hukûmeta Îsmet Paşa hemû hêz û îmkan xistin destên xwe, ji aliyekî bi hovitiyeye mezin êrîşî ser Kurdan kir, ji aliyê din jî dest bi qedexekirina rojname û kovarên muxalîf kir û gelek kes da girtin. Li gor *"Qanûna Takrîr-î Sukûn"*ê, *"Derbeya pêşîn van heşt rojname û kovaran xwarin. Ji vana pênc heb rojname bûn û sê heb jî kovar bûn. Rojname ev bûn: Li Trabzonê Îstikbal, li Adanayê Sayha, li Stenbolê Tevhîdîefkar, Son Telgraf û Îstiklal. Hersê kovar jî li Stenbolê derdîketin: Sebilürreşat, Aydınlik û Orak-Çekiç. Ji vana Sebilürreşat şerîetî yê din komunîst bûn"*.³⁸

Êdî dor hatibû ser qedexekirina "TCF"ê. Teva ku berpirsiyarên "TCF"ê ji bona tefandina serhildana Şex Seîd, bi her awayî piştgiriya hukûmetê

kiribûn jî, Mustefa Kemal û Îsmet Paşa nedixwastin ku tenê bi nav be dahî, tu muxalefet li ser lingan bimîne. Ji ber ku pêkanîna tiştên ku wan dabûn pêşiya xwe, tenê li welatekî kor, ker û lal mumkun bû. Mahkemeya Îstiqlalê ya Diyarbekirê hemû liqên "TCF"ê ku diketin nav sînorên desthilatdariya wê, girtin. Mahkemeya Îstiqlalê ya Ankarayê jî li gor "Qanûna Takrir-i Sukûn"ê, biryara qedexekirina navend û hemû liqên "TCF"ê pêşkêşî hukûmetê kirin. Hukûmet jî di 3-yê Hezîranê de civiya û biryarnameya qedexekirina "TCF"ê belav kir. Li ser vê rewşê, Metin Toker weha dinivîsîne:

"Biryarnameya hukûmetê di cih de hate pêk anîn. Li dijderketina liderên "TCF"ê, tenê weke gotinên platonîk li hewa man. Îqtidara ku ordî di bin destê wê de bû, di wê hêza ku bikaribe daxwazên xwe pêk bîne de bû. Gazî û Îsmet Paşa sînorên hêza xwe baş û rast dizanîbûn. Muxalefet di meclîsê de maö lê bê partî. Avêtina wan ya ji wê derê jî, wê bi paqijkirina duyem ya bi wesîleya Suûqasta İzmirê biba".

Dîsa li gor ku Metin Toker dinivîsîne, felsefeya wê demê di rojnameya "Hakimiyeta Millî" de weha di hate îfade kirin:

"Ji bona ku em şoreşa xwe bidin jiyandin, serxwebûna xwe biparêzin, li hemberî êrîşên derve rawestin, divê em bihêz bibin. Herweha, divê em ji bîr nekin ku di siyaseta de merhemet tune ye. Quwet û menfeet heye. Û nihayet bi saya serê quwetê hurmet û dilovanî heye".³⁹

Ev siyaseta Mustefa Kemal, her ku çû bêtir bi cih bû û bû siyaseta resmî ya dewleta Tirkîyeyê. Ji xwe, ji wê demê û vir de, her gava ku tevger û pirs Kurdî geş bûye, dewleta Tirkîyeyê ev siyaseta resmî meşandiye. Ji aliyekî bi dijwarî û hovitiyeke mezin êrîşî ser gelê Kurd kiriye; ji aliyê din jî, heta wê gavê bi awakî pir bi nisbî be jî maf û azadiyên ku gihastine ser hevdu ji holê rakirine; av li ser zeviyên muxalefet û cihêfikirandinê miçiqandiye. Îro jî, ev siyaseta Mustefa Kemal weke siyaseta resmî ya dewletê berdewam e. Ma îro jî karbidesten dewletê ji wan gotinên ku Mustefa Kemal berî niha bi heftê salî gotiye pê ve tiştêkî din dubare dikin?

Pirs û pirsgirêka neteweyî ya gelê Kurd, çawa ku berî niha bi heftê salî li pêşiya pêkanîna muxalefeteke bi rûmet, pêşketin, mafên mirov, daxwazên azadî û demokrasiya giştî ya Tirkîyeyê astenga herî mezin bû, îro jî, ji bona gihastina van maf û armancan, asteng û tehdîda herî mezin e. Gihastina vê qonaxê û bi destxistina van mafan, di çareserkirina vê pirsê de derbas dibe.

- ¹⁷ Binêre: Metin Toker, Şeyh Sait ve İsyanı, Akis Yayınları, Ankara, 1968, r. 35
- ¹⁸ Binêre: Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kürdistan 1918-1958, Doz Yayınları, Stenbol, Gulan 1992, r. 146. Robert Olson, Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı, Öz- Ge Yayınları, Ankara, Çirya Paşin 1991, r. 76
- ¹⁹ Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh ve Devlet, Öz-Ge Yayınları, Ankara, r. 350
- ²⁰ Martin van Bruinessen, berhema navê wê derbas dibe (b.n.d), r. 349
- Ji bo vê bahsê binêre: Hesên Hîşyar, Dîtin û Bîrhatinên Min, Çapxana Emîral, Beyrût 1993, r. 243-244
- ²¹ Binêre: Uğur Mumcu, Kürt-İslam Ayaklanması, Tekin Yayınevi, Ankara, 1991, r. 51
- ²² Binêre: Azîz Aşan, Şeyh Sait Ayaklanması, Stenbol-Çeleya Pêşin 1991, r. 106. Uğur Mumcu, b.n.d, r. 52
- ²³ Ji bona dirêjayiya ve bahsê binêre: Faik Bulut, Dar Üçgende Üç İsyân Kürdistan'da Etnik Çatışmalar, çapa yekem, Belge Yayınları, Stenbol, Gulan 1992, r. 271- 272
- Cemil Gündoğan, 1924 Beytüşşebap İsyanı ve Şeyh Sait Ayaklanmasına Etkileri, Komal Basım Yayım Dağıtım, Stenbol, Tebax 1994, r. 15- 24
- ²⁴ Binêre: Aziz Aşan, b.n.d, r. 106- 107
- ²⁵ Zinar Silopî, Doza Kurdistan, Öz- Ge Yayınları, Ankara 1991, r. 86.
- ²⁶ Aziz Aşan, b.n.d, r. 107
- ²⁷ Ji bo vê behsê binere: M. Şerif Fırat, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, çapa pêncan, Türk Kültürü Araştırma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1983, r. 167
- ²⁸ Ekrem Cemil Paşa, Muhtasar Hayatım, Weşanên Enstituya Kurd ya Brukselê, r. 59- 60.
- ²⁹ M. Şerif Fırat, b.n.d, r. 169.
- ³⁰ M. Şerif Fırat, b.n.d, r. 169.
- ³¹ Li ser tarîxa bûyera Pîranê nerînên cihê hene: Li gor Dr. Vet. M. Nuri Dersimi, M. Şerif Fırat û Martin van Bruinessen dinivîsinin; bûyera Pîranê di 8-ê Sibata 1925-an de dest pêkiriye. Binere: Dr. Vet. M. Nuri Dersimi, Kürdistan Tarihinde Dersim, Ani Matbaası, Halep, 1952, r. 176. M. Şerif Fırat, b.n.d, r. 174. Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh ve Devlet, Öz-Ge Yayınları, r. 356. Lê li gor Metin Toker bûyera Pîranê di 13-ê Sibata 1925-an de çêbûye û di vê bûyerê de ji leşkerên Tirkan yek tê kuştin û du kes jî birîndar dibin. Binere: Metin Toker, b.n.d, r. 37-38
- ³² Zinar Silopî, b.n.d, r. 92
- ³³ Binêre: Robert Olson, b.n.d, r. 171
- Li gor Aziz Aşan dinivîşîne, Yusuf Ziya, Xalid Begê Cibrânî, Faîq û Mele Evdîrehîm di 14-yê Nîsana 1924-an, li Bedlîsê hatin îdam kirin. Binere: Aziz Aşan, b.n.d, r. 108
- ³⁴ Ji bo ew kesên hatine daliqandin û vê behsê, binere: Azîz Aşan, b.n.d, r. 39- 40. Metin Toker, b.n.d, r. 131- 132
- ³⁵ Ji bo vê behsê binere: Metin Toker, b.n.d, r. 16- 21.
- ³⁶ Yê ku ji Ali Fuat Cebesoy, Siyasi Hatıralar, cild 2, Doğan Yayınları, 1960, r. 143-an neqil dîke; Aziz Aşan, b.n.d, r. 47
- ³⁷ Binêre: Metin Toker, b.n.d, r. 44
- ³⁸ Binêre: Metin Toker, b.n.d, r. 82
- ³⁹ Binêre: Metin Toker, b.n.d, r. 104-105

ÇARÎN

Kemal Burkay *

Hevalo, gula xas tim venabe, jê ra dem divê
Li gor derdî derman, gor birînê melem divê
Te dinyayek delal xwast, azad û aştîxwaz
Lê ka ew merivên nu, gor behrê belem divê

Li pagê kevn çîm rizîye, ba dilîze bi pelgan
Sal û zeman di bin axê da çûn, deng û beng ne man
Kulbekî bigir û tevde, dibe hîn germ e ev ax
Derd û şa û evîn, hêvî û xewn û xeyalên wan

Ne zû ne dereng, hertişt bi dem e, bi waxt û wade
Bihar hat û çû, dar salê du car kulîlkan nade
Zeman pir tişt guhart, ew dildarên berê çûn
Ne evîna Leyl û Mecnûn, ne Şîrîn û Ferhad e

* Di hejmara 1. a Çîrayê de tarîxa jidayikbûna Kemal Burkay bi şaşî 1934 hatibû nivîsandin, rastiya wê 1937 e. Çîra

DU NAMEYÊN DR. FÛAD BERXO (1887-1925)

M. Malmîsanîj

*"Nalid çonan ke felek gûşê xod gerîft
Ta neşenewed fixanê men o ahê zarê del."*

Heyran Xanima Donbolî



Welatperwerê navdar Doktor Fûad Berxo, kurrê Hacı İbrahîm û ji Kurdên Kird (Zaza) e. Di 1887'an de li Diyarbekirê ji diya xwe bûye.

Li Îstenbolê, di tibbiya eskerî de xwendiyê û dema ku di sinifa dawî ya vê tibbiyê de bûye carekê çûye Awrûpayê, piştî demekê vegeyriyaye.

Doktor Fûad, di nameyêke xwe de dinivîse ku ew yek ji damezrênerên komeleya Hêviyêye.¹ Tê zanîn ku ev komele di 1912'an de li Îstenbolê hatiye avakirin. Carekê, dema ku Seyîd Taha û Hecî Mûsa Begê Karçikan diçin Îstenbolê, Komîta Kargêr a Hêviyê, Dr. Fûad û Qedrî Cemîlpaşa (Zinar Silopî) dişîne ba wan da ku ji bo komeleya Hêviyê ji wan alîkarî bixwazin.²

Dr. Fûad yek ji endamên komîteya birêvebir a Kürt Tealî Cemîyetî ya Diyarbekirê³, herweha yek ji endamên şûbeya Diyarbekirê ya Civata Azadiya Kurd (Civata Xweseriya Kurd) jî bûye.⁴

Wî, çend meh berî serhildana Şêx Se'îd, li Diyarbekirê hazirî dikir ku rojnama Mezopotamyayê derxe.⁵

Şêx Se'îd bi xwe, di îfadeya xwe ya Mehkemeya İstiqlalê de wenî dibêje: "... Lê bi qasî ku tê bîra min, Salih Beg[ê Hênî] gotibû ku Cemîlpaşazade û Doktor Fûad terefdarên me ne."⁶

Dr. Fûad, piştî destpêkirina serhildana Kurdan a 1925'an, ji alî karbidestên Tirkî ve tê girtin û li Diyarbekirê tê dardekirin. Li gor hin çavkaniyan, wî di dema dardebûyinê de ev beyta Tirkî xwendiyê:

*"Kimdir bizi meneyleyecek baġ-ı cennetden?"⁷
Miras-ı pederdir gireriz hane bizimdir."⁸*

Yanî:

*"Yê ku me ji bexçeyê bihiştê men bike kê ye?
Mîrasa bav e, em dikevinê, xanî yê me ye."*

Ligor çavkaniyeke Farişî jî Dr. Fûad di dema dardebûyinê de, bi dengêkil bilind şî'reke Tirkî xwendiyê ku me'na wê wenî ye:

"Kî dikare min ji bihiştê Kurdistanê men bike? Ev av û 'erdê Kurdistanê mîrasa bav û kalên min in, xebata min ew e ku ez ji xesbkiran paş de bigrim."⁹

Serekwezîrê Hindistanê Jawaharlal Nehru (1889-1964), di salên 1930'yê de derheqê Şêx Se'îd û Dr. Fûad de wenî nivîsandibû:

"Wî [Mustefa Kemalî], paşî bi bêînsafî Kurd pelçiqandin, jibo mehkemkirina bi hezaran kesî Mehkemeyên Îstîqlalê yê taybetî danîn. Ji pêşengên Kurdan Şêx Se'îd, Doktor Fûad û gelekên din hatin bidardekirin. Ew, bi şîarên parastina serbixwebûn a Kurdan mirin."

"Li Tirkên ku heta van demên dawî jibo azadîya xwe têdikoşîyan binêre, wan, Kurdên ku jibo azadîya xwe hewl didan pelçiqandin. Evyek tiştêkî balkêş e [û nîşan dide] milletperweriyek ku xwe diparêze çawa paşê dibe milletperweriyêke êrişkar û şerekî azadîyê çawa dibe şerekî tehekkumê li ser ên din."

"Di 1929'an de serîhildaneke Kurdan a din pêk hat û dîsa hat pelçiqandin, qet nebe niha. Lê gelek (xelkek) ku jibo azadîyê îsrar dîke û jibo bidestxistina wê amade ye ku bedêla wê bide, çawa heta dawîyê dikane bête pelçiqandin?"¹⁰

Bi qasî ku ez dizanim du nameyên Dr. Fûad di 1918 û 1919'an de, di kovarên Kurdî de derketine. Nameyêke wî jî di 21. 5. 1925'an de di rojnameya Vakit de derketiye. Ji vana nameya pêşîn di hejmarê 5. a kovara Jînê de heye, nameya sêyem jî demeke berê di kitêbê¹¹ de ji nû ve derket lê di vê çapa nû de çend şaşiyên piçûk hene. Li vir hun dê wergera nameya wî ya duyem û ya sêyem bixwînin. Nameya wî ya sêyem min ji rojnameya Vakit wergerand. Herweha kopya destnivîsa vê nameyê jî di 1925'an de di Vakitê de derketibû û piştî wê çapê, cara pêşîn digihîje xwendevanên Kurd.

Şehîdbûna Dr. Fûad tesîreke mezin li hin şa'îrên Kurdan kiriye. Şa'îrê navdar Qanî' (1900-1965), di şî'reke xwe de -bi Kurdîya Başûr- xîtabî Dr.

navdar Qani' (1900-1965), di şî'reke xwe de -bi Kurdîya Başûr- xîtabî Dr. Fûad dike. Berî ku em nameyên Doktor bixwînin, werin em vê şî'ra Qani' bixwînin:

*"Ey Doktor Fûad! Ey şêrî nemir!
Heta qiyamet bo Kurd kelkgir.
Nemirdûy, namirî, nexşî dil-man î.
Ême bulbul in, to hem gul-man î.
Ser teqekêş î, nîştimanperwer î.
Lawî dilêr î, kanî cewher î.
Herçend ke êste laşe-t pinhan e,
Zexîre w mêjû y bo em zemanê.
Qaremanî gel, şêrî roy meydan
Axir le ser çî wa to-yan xenkan?
Bo yê wa to-yan helkêşa be dar
Ke hewl-it eda bo çînî hejar.
Koşîş-it ekird le dewrey dewran
Etwit "Azad bin gelî bêdestan".
Sûç-it ewe bû ke etwit "Kurd im"
"Kurdî be namûs be dest û bird im"
Sûç-it ewe bû fermût "Nîştimanî m"
"Bîşim xenkênin, her Kurdistanî m"
Sûç-it ewe bû dûjmin-hoz nebûy
Sûç-it ewe bû casûs koz nebûy.
Axir bo kujray hesêrey Kurdan?
Çiray rûnakî henaseserdan.
To hergîz namirî, her le pêş çaw î.
Le mêjû-man a xawenî naw î.
To hergîz namirî, qurbanî Kurdan!
Rûnakî dilî wêlî bin berdan.
To hergîz namirî, lawî nîştiman î
Le dil der naçî to be asanî.
Rûh-it bêdar bê ke gel hoşyar in.
Êste çaw ber bû, çak xwêndewar in.
Taze be pare naxletên bo kes,*

Weha nezanî ke êste ş kas in,
Dûjminî xwe-yan zor baş enasin.
Çi ladê, çi şar, xerîk hat û ço n.
Xerîk wergirtin heya w abrû n.
Kîçan des egrin be des birayan,
Esûrrênewe le dûy hîwayan.¹²

NAMEYÊN DR. FÛAD

Ji Komela Kurdistanê [Kürdistan Cemiyeti] re

Diyarbakir, 13 Sibat 1335 [1919]


Di hejmara rojnameya Atî ya 14'yê Kanûnîsanî de, dema ku di bin sernivîsa "Vilayat-ı Şarkiyemiz" [Wilayetên Me yên Rojhelatê] de behsa "tehcîr"¹³ tê kirin, tê xwestin ku para herî mezin a berpirsiyariya vê meseleya diltezên bixin sitûyê Kurdan. Em, li ser navê Kurdên wîlayeta xwe, vê îsnadê neheq dibînin û em wê bûyerê, bi şahidiya îtirafa gunehkarî ya ku vê dawiyê bi xwekuştina¹⁴ Çerkez Reşî Beg ê waliyê Diyarbakirê bû [.....]¹⁵

*Li ser navê Diyarbakir Kürt Teali Cemiyeti
Fûad*

Ev nameya nivçe ya Dr. Fûad, di kovara/rojnameya Kurdistanê de derketiye.¹⁶ Her di vê hejmarê de kovara Kurdistanê bersîva nameya wî jî daye:

Bo balkişandina Kürt Teali Cemiyetiya Diyarbakirê ya hêja

Di hejmara pêşîn a rojnameya me [Kurdistan] de jî bi nivîsa "İsimsiz Müsemmler" (Bênavên Binav) bersîva buhtankariya hejmara 14'yê Kanûnîsanî ya rojnameya Atî ya li hemberî Kurdan hat dayîn; herweha ew ji alî Komeleyê (Cemiyetê) ve, di rojnameya Alemdar de bi awakî resmî hat protestokirin. Jixwe rojnameya me û riya (mesleka) me şiyarkirina Kurdistanê ye. Ji berê ve 'edet e ku buhtankarên wisa, cîneyetan davêjin ser Kurdan. Wezîfeya ku dikeve ser rojnameya me, me bi cî anî. Di kûrayiya mêrxasî ya Kurdistanê de hawarên



► Dr. Fûad


biheq ên parêzkarên wek we, bêguman bûn sebebê kêfxweşî û şayiya me. Em sipasî we û hevkarên we dikin. Ermenî qatilên xwe nas dikin. Hawara rojnameya Atî, ji wê qîrreqîrrê pê ve ne tiştê e ku kesê gunehkar di meydana 'edaletê de bi hêviya dawîn dike.

Ew moda, êdî derbaz bûye ku Awrûpa bête xapandin û wekî her qetlî'amê, Kurd [wek gunehkar] bên destnîşankirin. Ne Awrûpa tê xapandin ne jî Kurd wekî berê bêdeng dimînin. Rojnameya Atî pirr baş dizane ku bes ji ber ku hevdîne (dîndaşê) wê bûn, bi sedhezaran Kurd ji alî Ermeniyên ve hatin kuştin.

Kurdistan

NAMEYA DAWÎN A DOKTOR FÛAD

Dr. Fûad nameya jêrîn ji Ferît Paşa re nivîsiye, lê di destpêka serfihildana Şêx Se'îd de karbidestên Tirk, li Diyarbekirê dest danîne ser posteyê û name



kontrol kirine; ev name jî li wir, bê ku bigihîje Ferît Paşa, bi dest xistine.

Ferît Paşa (1860-1937), Kurê Alî Necîp e, li Misrê ji diya xwe bûye. Demekê Serekê *Osmanlı Sulh ve Selamet Cemiyeti*, Sekreterê Giştîyê *Sulh ve Selamet-i Osmaniye Fırkası* û Wezîrê Herbiye bûye. Dema ku Doktor Fûad jê re ev name nivîsandîye, Ferît Paşa li Îstebolê bûye.¹⁷ Li gor Prof. M. A. Hasretyan, Ferît Paşa Kurd e lê ez di tu çavkaniyeke din de rastî agahdariyeke wisa nehatim.¹⁸

► Destnivîsa nameya Dr. Fûad

Diyarbekir, 21 Sibat 341 [1925]

Hezretî efendiyê min ê hêja,

Gava ku min me'aşê meha Sibatê pêşkêş kiribû, min bi telgrafê dabû zanîn ku ez gelek caran muhtacê mizgîniya 'efiyeta cenabê we me. Dema ku min -'ekê hêvî û 'edetê- bersîva vê telgrafê negirtibû, min fikir kiribû. Bi mebesta nehiştina fikirê, min telgrafa ku hun behs dikin da Memduh Beg. Demek berê min ji efendiyê me [mebest jê Ferît Paşa ye-M. Malmîsanîj] jî telgrafek -ku tê de jibo min mizgînî hebû- girt û ez li benda nameya wa'dkirî mam. Îro min tenê ji Muzeffer sê kart girtin, destnivîsa efendiyê me negihîşt destê min. Min bihîst ku Muzeffer dane İstiklal Lisesi (Lîseyê İstiqlalê). Min dixwest di vî warî de agahdariyên dîrûdirêj bigrim. Disa jî, ji ber ku berî her tiştî ez dixwazim

qe nebe panzde [rojan] carekê bi mizgîniya 'efiyeta mun îmaneya¹⁹ we bigihîjim mebesta xwe, ez mecbûr mam ku murace'etî rêberî û wasitebûna agahdariyên dûrûdirêj ên nameyê bikim da ku bigihîjim vê mebesta 'eslî. Ez dîsa rica dikim, di qebûlîkirin û bicîanîna daxwaza min de ji qenciya xwe dirêxî nekin. Em hemî di xweşiyê de ne. Ji nişkê ve mirina Kamil Begê meb'ûs, çûyina Hacî Niyazî Begî²⁰ bo Îstenbolê; ji ber başnebûna talihê ji xwe re bijartina koşeya tenahiyê ('uzletê) ya 'Arif Begî²¹ û 'Ezîz Efendiyê Cizîrî,²² bêhtengiya rojên "bêwelûd"²³ -ên ku ne ji sipêde ne jî ji şevên wan xêr tê hevîkirin- dide [meriv].

Bûyerên herêmî: Bi emr û îşareta Komîteyên Serxwebûnê yên Kurdî (Kürt İstiklâl Komiteleri) yên li Mûsilê ku bi mehan ve bi awakî ciddî dest bi xebatê kirine, şêxê Xînûsê Şêx Se'îd Efendî bi hildana alaya serîhildanê hat heta Hênê û Licê. Nika heşt-neh se'et dûrî bajêr, li aliyê bakur şerr heye. Xwedê encama wî bike ya xêrê.

Komeleya Kurdî (Kürt Cemiyeti) ya li Helebê jî her bi 'eynî mebestê, dike ku Kurdên binê xetê rake ser piyan. Mûş, ket destê 'eşîrên wê herêmê. Elhasil fikra Kurdistanê ku heta nika piçûk dihat dîtin, dest pê kiriye bi awakî ciddî hukûmetê dide fikirandin.

Em binêrin ka hela çi dibe. Ez jî piştî dîtin û derbazkirina rojên derbederiyê, bi berhevkirina berhemên tecrubeyan û bi hişyariyê, di dewreya payînê de me. Ji ber ku ji viya zêdetir efendiyê me eleqedar nake, ez bi dûrûdirêjî behs nakim. Heke rojekê ez ji mecbûriyetê winda bibim, bêguman efendiyê me tê agahdarkirin. Herçiqas ez jî Sûriyeyê têm da'wetkirin jî bawer nakim ku ez dê li wir îcrayê sen'et bikim. Loma min bi îhtiyat bersîv da.

Ez ji rewşa xwe ya vêderê kêfxweş im. Ji ber vê yekê ez pir pêwîst nabînim têkevîm nav serguzeştên nediyar.

Bi daxwaza xweşiya daîmî, ez bi hurmetkarî destên we maç dikim û berdewamiya eleqedariya cenabê we tika dikim.

Fûad

¹ Jîn (din, edebiyat, ictimaiyat ve iktisadiyattan behseder Türkçe-Kürdçe mecmuadır), İstanbul, no: 5 (12 Kanunievvel 1334 [1918]), r. 10-11

² Zinar Silopî, Doza Kurdistan, Stewr Basımevi, Beyrut (?), 1969, r. 36

³ M. Bayrak, Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1993, r. 165

⁴ Robert Olson, Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı, Çevirenler: Bülent Peker ve Nevzat Kırış, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1992, s. 249

⁵ M. Bayrak, r. 171

⁶ M. Bayrak, r. 335

⁷ Di kitêba Cemal Nebez de, di ciyê "cennetten" de, "cenanden" hatiye nivîsîn. Lê tê fêmkirin ku bi şaşî wenî hatiye nivîsîn, ji ber ku di wergera Kurdî ya Cemal Nebez de ev kelîme "beheşt" e.

⁸ Cemal Nebez vê beytê ji devê Reşîd Şewqî neql dîke (Binêre: Cemal Nebez, Pêwendarêtîy Kurdî, Kurd Kê ye w Kurdbûn Manay Çî?, Bilawkirawey Rêkxirawî Xwêndikaranî Sosyalîstî Kurd Le Ewropa, Stockholm, 1986, r. 7).

⁹ Baba Merdûxê Rûhanî (Şîva), Tarîxê Meşahîrê Kord, cîldê dovom, Tehran, 1366 [1988], r. 175-176

¹⁰ Jawaharlal Nehru, Glimpses of World History, Asia Publishing House, Bombay, Calcuta, London, New York, 1965, r. 732

¹¹ M. Bayrak, r. 180-181

¹² Baba Merdûxê Rûhanî (Şîva), cîldê dovom, r. 175-176

¹³ Ji "tehcîr"ê mebest, koçkirina mecbûrî ya Ermenîyan e ku ji alî karbidestên Osmanîyan hatibû organîzekirin.

¹⁴ Di 1919'an de ji ber kuştina Ermenîyan hin berpirsiyarên Osmanîyan hatibûn mehkemekirin. Ji vana yek jî walîyê berê yê Diyarbekirê Doktor Reşît bû. Dr. Reşît ji tirsê cezaya dardebûyîne xwe bi xwe dîkujê. Doktor Fûad di nameya xwe de behsa wê bûyerê dîke.

¹⁵ Ev cumle di kovarê de nivçe ye û piştî wê bi qasî sê-çar rêzan cî vala maye. Wisa tê fêmkirin ku dawîya nameyê hatiye sansurkirin.

¹⁶ Kurdistan (haftada bir def'a neşrolunur), İstanbul, no: 5 (3 Nisan 1335/2 Receb 1337 [1919]), r. 50

¹⁷ Binêre: Türk Ansiklopedisi, Milli Eğitim Basımevi, Ankara, 1968, c. 16, r. 254

- Tarık Zafer Tunaya, Türkiye'de Siyasal Partiler, c. 2, Hürriyet Vakfı Yayınları, 1986, r. 138, 237-238

¹⁸ Prof. Dr. M. A. Hasretyan, Türkiye'de Kürt Sorunu (1918-1940), Weşanên Înstîtuya Kurdî, 1995, c. 1, r. 139

¹⁹ **mun'imane:** bi awayê ku layiqê kesê welînîmet e, bi awayê ku layiqê kesê ku ji yekî din re qencîyeke mezin kiriye

²⁰ **Hacî Niyazî Beg:** Dibe ku ev kes Hacî Abdulhamîd Niyazî Çıkıntaş (1856-1934) be. Hacî A. Niyazî Çıkıntaş, li Diyarbekirê ji diya xwe bûye. Demekê serekê Belediyeya Diyarbekirê bûye. Wî şî'r jî nivîsandine. Kitêbeke wî ya bi navê Amid-i Sevda (Amîda Reş) hatiye çapkirin (Binêre: Şevket Beysanoğlu, Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları, İstanbul, 1960, c. 2, r. 328-330; Bütün Cepheleriyle Diyarbakır, İstanbul, 1963, r. 166, 168).

²¹ **Arif Beg:** Kesekî pîr dewlemend bûye.

²² **Eziz Efendî:** Demekê serokê belediyeyê bûye.

²³ **welûd:** 1)ya ku dizê 2)yê/ya ku pîr berhem dide.

"SIYASIYÊN ME NEBÛN"

Ev nivîs, ji hevpeyivînekê -ku di Adara 1982'yan de Celal Uzun bi Çeçanê Haco Axa re kiriye- hatiye wergirtin. Bêyî ku destkariyê di devok û naveroka wê de bikim, min ew gotûbêj ji bandê (kasetê) derbasî ser kaxetê kir. Ji bo dilfirehiya Celal Uzun ez sipasî wî dikim.

Piştî serîhildana Şêx Seîdê nemir, herwekî gelek berrabûnên Kurdistanê, Dewleta Tirk tu cudatî nexistiye navbera Kurdên "hevalbend" û "neyar"ên dewletê. Karbidestên dewletê, tim bi çavên ku Kurd in li wan nêriye û ew bi yek agirî şewitandine. Wek nimûne: Ma'moyê Hendê -ku rehmetiyê Çeçanê Haco di bîranînên xwe de behsa wî dike- û zaroyên wî, li dijî şerrê Kurdan alikariya dewletê kirin, lê dîsa mîna gelek malbatên Kurd ji welêt hatin bidûrxistin. Îro jî neviyên wî li Ceyhana Çuqurowayê xwediyê çend donim erdê avî yên bermayê wê demê ne. Ji Dêrika Çiyayê Mazî, ji eşîra Rûtan, Salihê Mihemedê 'Evdî yê mala Mistefa Axa jî alîkariya dewletê kir, lêbelê malbata Saliho jî ji surgûnbûna bo Çuqurowayê xelas nebû. Çend donim erdê avî, heta mirinê "serbilindiya" lawê wî, Bişarê Saliho bû. Eger di vî warî de Kurdistan bê tevdan, dê gelek nimûneyên weha derkevin.

Bêguman tarîxa Haco Axa û malbata wî ne ev nivîs bi tenê ye. Gorrbuhişt Nûreddîn Zaza di bîranînên xwe de behsa xapandina Haco Axa dike. Di kitêba xwe ya bi navê Doza Kurdistan de welatperwerê hêja Zinar Silopî (Qedrî Cemîlpaşa) û hin çavkaniyên din ên Kurdan didin zanîn ku Haco Axa yek ji damezrênerên Xoybûnê bû. Îro jî bi sedan keç û xort ji vê malbata fireh, di nav tevgera neteweyî ya Kurdan de dixebitin. Hêvî dikim ku naskirina şasiyên berê bibe alîkarê hişyariya pêşerojê, herweha renc û xebata pozîtîf a nîşên berê ji nîşên nû re bibe rêber.

Berî ma (me), axalerê Kurmancagelik çûne Diyarbekrê. Hikûmetê dixwestin, diçûn.

Digo "herrin xeta têlxurafê çêkin, hetta bi Sêwrekê". Wextê go (ku) ji bajêr derdiketin, ji Diyarbekrê, eskerê Şêx Seid dihate wa. Dihate wa, bazdidan, şerr nedikirin, dihatna mala xwe.

Ê me, wextê go em çûn, gotne bavê mi jî go "were". Ez bi xwe bi bavê xwe ra bûm. Em çûne Diyarbekrê. Em hê negihan Diyarbekrê, em li Xana Axpayê bûn û eskerê Şêx Seid li Diyarbekrê da, lê da, dengê topa û ewa dihat. Heraaa şerr betal bû. Vêca xeber dane ma, em çûn Diyarbekrê. Em çûne Diyarbekrê, em sê roja man.

Rabûn gotne bavê min "me divê tu heta bi Sêwrekê xetê çêkê, xeta têlxurafê".

Em sed zelum bûn, bi bavê mi ra. Rabûn em çûn. Em wê rojê meşîn heta êvarî. Me dar[ên têlxurafê] rastkirin, em gîhane Çiyayê Qerejdaxê. Em gîhane Çiyayê Qerejdaxê û em çûne gundkî. Em ketne gund da û hatine ma. Me şerr bi wa ra kir. Me şerr bi wa ra kir heraaa dinyayê gewr kir. Dinyayê gewr kir, bi serê te, me pêjna kesî nekir, çûn ketna wa newalan, wa ewa da. Em rabûn, em sibehî meşîn, me dîsa xeta xwe girt, me çêkir. Yek li va, yek li wa, em çûn; me dî go wê xera dikin. Dara didine erdê, têla diqetênin û ne wê li pey ma na. Dîsa me şerrê xwe kir heraaa êvarî. Êvarî em gîhan wilo newalek, [newal] kete neqeba me û wa da.

Ê go bi me ra hena sih neferê peyada û sihî suwarî yê esker û ê dîtirê em in. Em sed nefer in.

Eh, bi serê bavê te, newal kete neqeba me da; ew mane li wî alî û em mane li vî alî. Hew li pey ma hatin û bû evar jî. Em meşîn, em hatin, divê Qerebexça. Em hatina raserî wî Çiyayê Qerebexça, hema me dî ji Qerebexça alem derket û hatina pêşiya ma. Hatina pêşiya ma, rabû me bakire wa[n]:

– Kurro hun dost in, hun dujmin in? Ji me ra bêjin. Heka hun hevalê Şêx Seid in bêjin, heka hun ê hikûmetê na, bêjin!

Go: – Em ê hikûmetê ne. Em hatina li vêderê, Qerebexça, mihafeza Sêwrekê go eskerê Şêx Seid neyên Sêwrekê.

– *Ew eşîrana kê bûn? Ew 'eşîrên ji Sêwregê hatibûn!*

– Çi?

– *Divê "ew çi 'eşîr bûn?"*

– Ew 'eşîr? Zaza bûn, bi Xwedê Zaza bûn, Dumbila bûn. Digo Bozan Beg û axir, ê, birazyê Birahîm Paşa, Ma'moyê Hendê¹ û Bozan Begê Zilfeqêr.²

Axalerê wana û ê Qeregêçya bûn. Ê Qeregêçya bûn û ê wa dera bûn. Hatina pêşiya ma. Me bakir, go[tin]:

– Em hevalê hikûmetê na.

– Bi rastî?

Go: – Bi rastî!

Me go: – Wele em jî hevalê hikûmetê na.

Go: – De werin.

Em çûne nav wa. Vêca ê wa çadir anîna, kon anîna û ê ma em li gund qûnax bûn. Ez û bavê xwe û çendek, em li mala muxtar man. Vêca ê dîtirê li nava gund belav bûn. Em sê roja man. Me dî Walî hat, ê Sêwrekê. Hat gote bavê min:

– Bê ma tu va axalera qani' nake vegeerîne Diyarbekrê û xeta têlxurafê çêkin?

Bavê mi gote wa[n]. Ew Ma'moyê Hendê bû û Xelîl Begê,³ nizanim yê Xeşmên, -navê wî çî ya?- jî wa bûn. Qeregêçya bûn. Weleh me qani' kirin, me rê girtin û em meşîn. Vêca jî Qerebexça me berê xwe da Diyarbekir. Em jî divên "Xwedo, hema em gavkê ber bi mal herin". Erê bi serê te. Em meşîn hetaaa êvarî, kaxeta Şêx Evdirehîm, birayê Şêx Seîd, kaxeta wî hat, go:

– Hun divegerin navegerin? Navegerin, bi Xwedê ezê kim go yek jî we bi saxîtî neghê mala xwe.

Hema vitvit li wa ket. De ê wana belkî hezar zîlam heya û em sed in.

Bavê mi got: – Kuro, malxirabo, ma wê jî me bêhtir ên?

Kir û nekir, axir go: – Baş e, sibehê emê meşin, bera bêna ma.

Ji gund em derketin û me dî carkê... Navê gund nizam, mi jî bîr a kiriye. Vêca em derketin go em xetê çêkin. Hema me dî bi şûn va, berê xwe dane welatê xwe, me jî da pay wa.

– Ew çûn Sêwrekê?

– Heeh?

– Çûn Sêwrekê?

– Erê, berê xwe dane aliyê Sêwrekê. Nemeşin ber bi Diyarbekrê, vegerehan. Vegerehan, em jî bi wa ra vegerehan. Birazî! Hema çilo em ji gund derketin, ha me dî ji wa newala û ji wa dera hucûmî me kirin. Êdî me şerr kir. Me şerr bi wa ra kir heta em di Qerejdaxê de qulubandin. Vî qasî me şerr kir. Ji wa belkî dused zîlam êsîr girtin û her sih neferê peyada. Ê suwarî bi me ra filitîn û ê me em li hev bûne xwedî, yê ki dibetilê me direvand, me

suwar dikir. Em meşîn heta em hatina Qerebexça dîsa. Em hatina Qerebexça, konê xwe jî rakirin. Kon tevde hema êdî rabîn. Em tevde meşîn, li pey me hatin heta divê Xana Qeynaxa.

– *Qaynax.*

– Heeh?

– *Ee.*

– Em gihane Xana Qeynaxa ji pey me vegerehan û vêca ew ahlê vî welatî û em pev ra na. Me go wekî ew bazdidin, em jî tevayî wa û her sih suwarê me jî bi me ra ya û bînbaşîk e û du yuzbaşî na. Ji wêdê vegerehan û em û hevalên xwe ê wî welatî em tevde meşîn, bû şev. Bi şev [em] meşîn heta em ji wê Xana Qaynaxa gîhana Sêwrekê. Ew welat welatê wa ya, bajarê wa ya. Dîsa digot[in] Mehemed Emîn Efendî⁴ -reisê belediyê bû, derkete pêşiya ma. Bavê min û em çendik birina mala xwe û zilam dane zilamê ma, [li] nava bajêr belav kirin, qûnax kirin û bi serê bavê te, hê me taşte nexwarî, go ”Law va ye eskerê Şêx Seîd hat!..”

– *Li wir jî destpêkir.*

– Ne îja li Sêwrekê ha! Va ye eskerê Şêx Seîd hat! Em tevde çûne sahê. Bavê mi gote Walî: – Paşa, tu çi dibêjê?

Go: – Heke bi ya min î ez ji şêrr [şerr] im, ne bi ya min î hun zanin, kêfa we ya.

Bavê mi go: – Wele bi ya me nakin. Ev axaler hemi divê[jin] ”em şêrr nakin ” û em xerîb in. Em jî tevayî wa na. Ya ma ev a.

Talî, vir da, wê da, go: – Emê çine şêrr.

Em meşîn, em çûn serê wa reza, wî alî, rez û ew in. Em çûn û me dî ew hatin. Hatin, wele em man heta halo ro nêzîkî çû ava. Hema bûne rast. Ma'moyê Hendê -birazyê Birahîm Paşa-, 'Evdîlqadirê Dirê'î⁵ û kurramê wî..

– *Bozanê Zilfiqêr?*

– Û axir meşîn. Gotne bavê min go ”Heyra, em ahlê welat in û bajarê ma ya, em divegerin û tu? Îşê te li vir çi ye? Tu jî bi me ra wera”.

Em çûn. Bû şev heta em gîhane nav Qeregêçya. Em gîhane nav Qeregêçya û li wêde, wele sibehî taştê ji me ra anîn, me xwar û em hatina Wêranşahrê. Em hatina Wêranşahrê, şiv ji me ra anîn, axir xwarinke ecêb wî camêrî anî. Me xwar û sibehî me da rê em hatin. Ez dirêj nakim. Em hatina Golîyê,⁶ binya Mêrdînê. Heçî peyayê ma û ewê dî herkeskî mana li welatê xwe. Em hatina Golîyê. Li wêdê bavê mi go:



► Serekê eşîra Hevêrkan Haco Axa

– Wele, bi Xwedê, hema li vir bin, ezê çime Mêrdînê. Ezê çim bê[jim] hal û hewal ev a. Wela, ahwalê xwe emê bêjin.

Rabû bavê mi çû Mêrdînê û em mane li wêdê, li hêvîyê. Go[tibû]:

– Li hêvîya mi bimînin, heta xebera mi ji we ra bê. Mi go ”werin”, werin; ”herrin”, herrin.

Em man, bavê mi çû Mêrdînê. Têlxuraf dane Mursil [Mursel] Paşa, Cahfer Teyyar Paşa û ew[ên] li Diyarbekirê bûn. Xeber da wa, got hal û mersele ev e, halo bi me ra qewimî; ka ma hun çi emrî dikin?

Go: – Heçê zilamê ta, bera herrna mal û tu dudo, sisê, çar bi xwe ra tênî bera bê. Ê dî bera herrna mal. Mesele, Şêx Seîd hat, hikûmet hat û kete Sêwrekê û Şêx Seîd xwe da alîkî, bazda. Vêca te divê tu bimîne. Bera ew herrin û tu bimîne.

Bavê mi go: – Gelkî dom nekir, xeber ji wa ra hat, go ”me Şêx Seîd girt”. Çû go herre Eyranê [Îranê], yekî Kurmanca, axakî Kurmanca bêbextî lê kir; girt anîn. Hikûmetê go ”Haco, ê te, em mesela te qenc zanin. Bînbaşiyê bi te ra hat, bi tenê bi suwarî hat. Go ’Kes hevalê ma nebû ji xeynî Haco, kes hevalê ma nebû ji wî pê va. Êdî hemuwa xwe da alîkî. Ew jî xerîb bû, wî jî xwe da alîkî, ew jî çû’. Ma’lûmate te em zanin. Li cem ma ba.”

Şêx [Seîd] girtin anîn û bavê mi ma li Dîyarbekrê. Roja go wê Şêx mahkeme kin, gotne bavê mi go ”Tu jî were mahkemê, tu hissa [guhdariya] Şêx bikê”.

Cilê zabita lê [li bavê min] kirin û şefqe li serê wî kirin, sibehê çû mahkemê. Mahkeme jî hemi zabit in. Ew jî kete nav wa. [Bavê min] go ”Mi dî Şêx anîn. Yekî zirav û dirêj û bêvla wî zirav; sippî, mûkî reş nebû. Wele, anîn; bi rastî ji ber rabûn. Kursîk danê, rûnişt”.

Elî Saîb -ê go taqîbata me kiriye li Taqa-, şazdeh roja me şerr pê ra kir, me eskerê wa gelek kuşt û me gelek telefata kirin. Meselê me dû-dirêj in û bi serê bavê te, eva ewî reîsê [Mehkema] Îstîqlalê ye.⁷

Elî Saîb go: – Şex Efendî, em Misilman, hun Misilman, tu vê fitnê dikê nav ma û em hevdû bikujin. Çi bi bextê te hatiya? Zilamkî şêx...

[Şêx Seîd] Go: – Haşa! Hun ne Misilman in.

– Çawa em ne Misilman in?

[Bavê min] go, [Şêx Seîd] go: – Wele hun ne Misilman in. Pîrekê we li dansa direqisin û hun nizam çi dikin... Hun ne Misilman in.

Ê go: – Ne emê te xeniqênin!

Go: – Ma çi qîmetê xeniqandina mi li cem mi heya? Li ba Xwedê mi rûyê xwe sipî kir. Heçê em alim û şêx û ew in, em mamûrê Xwedê na, em muwezzef in. Mi wezîfa xwe kir. Mi rûyê xwe li cem Rebbê xwe sipî kir. Ê vêca hun mi bixeniqênin jî çi qîmeta wê heya, mi rûyê xwe sipî kiriya.

Axir îfada xwe wilo da.

Bavê mi go: – Mi dî Şêx qewîtî kir. Kurkê wî, gelo, kurrik pê re, ew gotiyê, go qewîtîya hurmetê kir. Tu navê (nabêjî) xidamya wa dikir. Ta’b bi wa ra dîbû. [Şêx Seîd] gote kurrik go ”Haqa mal bidne filan, bidne wê hurmetê, ta’b bi me ra diye”.

Go Elî Saîb go: – Haa! Şêx Efendî, qey tişteke di neqeba te û wê de heya?

[Şêx Se’îd go]: – Heee, kopek oxlî kopek!

Go ”hema rahişte kursiyê bin xwe, bir go li qahfê wî xe; hema zabita xwe girt û girtin”.

[Şêx Se'îd go]: – Xedama me bû. Weke xwa mi bû. Bêşeref! Hey bênamûs!
Çilo tu vê xeberê dibêjî?

Û bi serê bavê te, girtin birin.

Vêca Elî Saîb gote bavê mi go sibê seet li hevqasî emê [Şêx Seîd] xeniqênin.
Were kursî ji bin bikşêna.

– *Yaboo!*

– Heeh!

– *Di mahkemê da, gotibûnê da "Ma tu Haco nasdikê?"*

– Kêêê? E, e. Got, go "Ma tu Haco nasdikê?"

[Şêx Seîd] got: – Haco yê Êzîdî?

Go: – Na, na haşal! Haco ne Êzîdî ya, Misilman a.

Şêx go: – Wele wilo ji mi ra gotin. Jixwe Haco nifûza mi şikand û şerrê
me kir.

'Eyn wilo got, bi serê bavê te. Go "Ma Haco ne hevalê te bû?"

Go: – Na, na; ne hevalê mi bû, dujminê mi bû.

Vêca Elî Saîb gote bavê mi, seet hevqasî sibehî werêne, emê xeniqênin û
tu kursî bikşêna.

Bavê mi go: – Baş a.

Û bave mi hema bi bez, bazda çû cem Mursel Paşa, Cahfer Teyyar Paşa, go:
– Ev [Elî Saîb] dujminê min e. Şazdeh roja mi şerrê wî kiriye û divê
(dibêje) "Were kursiyê ji bin Şêx bikşîna". Mi bixeniqênin û vî tiştî ji mi
mexwazin! Ez qîma xwe bi xeniqandinê nênim. Di Kurdistanê de yekî weke
Şêx bixeniqênim, ma êdî ez karim herrim? Hetta bi zaruwê mi wê mi bikujin.

Go: – Herre xwe bide alîkî, xwe şanî wî seyî meda, xwe ji ber bide alîkî.

Bavê mi go "Sibehî mi cilê xwe nexeyirandin û ez jî ketme nav alemê.
Çûm gi awayi çelî daleqandina. Şêx û çil kême yek".

Hemmi wê xeniqandina û bi serê bavê te, bavê mi qederekî li wêderê ma.
Wek qedera heyvekê ma, hate mal. Hate mal, êdî taqîbata ma jî kir[in]. Ma
bazda. Êh, vêca bi Kurdistanê ketin, tiving standin û nizam çî kirin û bavê
mi çû Mêrdînê, cem Walî.

[Walî] go: – Axa, weleh tu weke birayê min î. Lê bi Xwedê, bîst û du qerar
di heqê Kurmanca da dana go sîlaha nehêlin, wa teb'îd bikin û ê kuştinê-
kuştinê, ê go nekujin jî wa teb'îd bikin. Heke tu karibê, herre xeta Feransa.

Êdî em hatin xeta Feransa. Ew rok û ev rok. Ehh. Erê wele bi serê bavê te.

– *Şêx Seîd da'wa çî dikir?*

– Heee?

– Şêx Seîd?

– Îii!

– *Da'wa çi dikir?*

– Welleh go da'wa şîrî'etê dikir, wilo digotin. Go mêhvanê wî hatin û esker li pey wa. Îja esker, ew mêhvanê wî jê xwestin. Eee neda. Neda û êdî li wa da û şêrr bi wa ra kir û yek, dusêk ji wa kuştin û bazdan û hema êdî rabûn. Eh, wilo digotin, wa digotin.

– *Pîşt Şêx Seîd ra...*

– Î!

– *Ê ki alîkariya hikmatê kir...*

– Î.

– *Hikmatê, pişt ra ta'de negîhand wan jî?*

– Çilo kirin?

– *Yanî ê ki alîkariya hikmatê kir, hikmata Tirk, pişt ra, Şêx, mersela qedya şûn da.*

– Î.

– *Hikmatê çi da wan? Yanî îkramîye li wan kir, an ew jî kuştin, ew jî nefî kirin? Çi kir bi wan?*

– Bi Şêx ra?

– *Pîşt Şêx!*

– Pişt Şêx ra, gelek kuştin. Axalerê Kurmanca gelek kuştin. Heta, heta bi Cemilê Çeto, Emerê Temer, hema ê ji welatê ma go em nasdikin, axayê mezin û xeynî ê dora Dîyarbekrê û ê ji Zaza û ji wana. Hema her ro, her ro heft, heşt, deh, panzdeh, bîst dixeniqandin. Her ro, her ro. Roja Şêx çil xeniqandin. Yanî heta heyvkê jî vî qasî, her ro heft û heşt û deh û panzdeh, heta bîsta dixeniqandin.

– *Ê baş i, ev hikmata...*

– Î.

– *Bextê wî he ye? Mêze, we alîkariya hikmatê kir, we alîkariya wan kir, yardîma wan kir.*

– Î.

– *Wan pişt ra surgûna we jî derxist.*

– Ma êdî fêde dikir? Ma êdî arîkarîyê fêde kir? Welleh em çûne şêrrê Tiyyarê⁸ ji wa ra û me [şêrr]ê Şêx Seîd kir û me Feransa li vir qeland û evqa xizmeta hikûmetê. Evqa xizmet ji hikûmetê ra û talî, bi serê bavê te, wî Walî go "Wele Haco, belkî te nekujin lê wê te û kufletê te rakin [bi]bine Anadolê;

tu karibê here, herre xeta Feransa”.

[Bavê mi] go ”Wele Feransa, mi Feransa kuştina. Pa ez çî bikim? Ezê çime dexaleta Feransa”.

Em hatin, eh...

– *Wexta şerrê Dêrsimê!*

– Hiii!

– *Şerrê Dêrsim, Dêrsim!*

– Dêrsim?

– *Wexta Seyît Riza! Seyît Rizo hebû...*

– E.

– *Serokê wan.*

– Î.

– *Vegerya ser hikmata Tirk go ”Hikûmata zulmkerê bêbext!”*

– Î.

– *Ew pîrsa wî çî da yi yan ne çî da yi?*

– Te go çî?

– *Yaboo! Seyid Riza, tu nasdike?*

– Mi navê wî bihîstibû.

– *Divê ”Seyid Riza gotîya...”*

– Î.

– *”Hikûmeta Tirkî, hikûmeteke bêbext e!”*

– Î...

– *”Hikûmeteke bêbext e.”*

– Erê welle.

– *Ma şexaliya wî rast e yan na?*

– Î welleh! Welleh bêbextîya wa hişkere bû. Belê, ’efû dan û piştê efwê ra dîsa Kurmanc gellek kuştin. Lê ê me, em neçûn. Em neçûn, vêca Feransa milk da ma û gund da ma. Eh, vêca mesela Feransa me negot ji te ra...

Dê dom bike.

¹ **Ma’moyê Hendê:** Ji mala Keleş ’evdî ye. Mala Keleş ’Evdî, mezinê eşîra Milan e. Ma’moyê Hendê, ne biraziyê Bîrahîm Paşayê Millî ye lê ji bapîrê Bîrahîm Paşa, Bişar Axa ne û piştî fermana Bîrahîm Paşayê Millî, hinekî jî bi alîkariya dewletê Ma’moyê Hendê bû mezinê Millan. Piştî Ma’mo, lawê wî Ahmed Begî mezinatiya Milan kir. Îro Serekê Belediya Wêranşarê Xelîl Keleşebdîoxlû ye. Ev Xelîl Beg, kurrê Ahmed Begê Ma’moyê Hendê ye.

² **Bozan Begê Zilfeqêr:** Mezinê eşîra Îzolan bû. Emînê Bozanê Zilfeqêr, hete beriya hejdeh salan sax bû. Lê Emîn û çar zaroyên xwe û birayê xwe û jina xwe ji aliyê kurrê Emîn, Mihemed 'Elî bi ser hev de hatin kuştin. Mihemed 'Elî bi xwe jî wê rojê hat kuştin.

³ **Xelîl Begê Xeşmên:** Ji mîrên eşîra Qeregêçyan e. Xelîl û Dire'î birayê hevdu ne. Ji mîran Birahîmê Xeşmên tê naskirin. Dibe ku nav jî aliyê Çeçanê Haco de tevlihev bûbe. Eşîra Qeregêçyan eşîreke mezin e û di navbera Sêwreg û Wêranşarê de, li derûdora Qerejdaxê diji.

⁴ **Mehemed Emîn Efendî:** Mehmed Emîn Odabaşî ye.

⁵ **'Evdilqadirê Dirê'î:** Lawê Dire'î ye. Dire'î mîrê Qeregêçyan bû. Di dema Birahîm Paşayê Millî de ji Dire'î û Hemê Mûsikî pê ve kêma kes dikaribû li hember Birahîm Paşayê Millî dengê xwe derxista.

⁶ **Golî:** Gundekî di navbera Mêrdînê û Qiziltepeyê de ye. Îro jî ava ye. Di sitranên folklorîk ên Kurdî de Golîyê xwedî cihêkî taybetî ye. Wek nimûne, di sitrana "Hey Lo Lo Delal" de navê wê weha derbas dibe:

"Mêrdîna şewitî li pozê zinêr e

Gawur Golî di binyê re... cî û ma'denê ziv û zêrr e."

⁷ **Elî Saîb:** Ali Saip Ursavaş e ku yek ji endamên Mehkema Îstîqlalê ya Diyarbekirê bû.

⁸ **Tiyyarî (Teyyarî):** Eşîreke Aşûriyan (Asûriyan) e. Ligor ku min bihîstiye, dema ku Aşûrî ji Kurdistanê Başûr (Bakurê Îraqê) ji aliyê Frensiyan de hatine rakirin û ber bi Xêbûr hatine şandin ev şerr derketiye. Tiyyariyên Aşûrî wê demê di ber xwe dane. Heta dibêjin ku wê demê, wan bi balte û biviran çend teyareyên Frensiyan jî xera kirine.

HÊNDÊ LAYENÎ KULTURÎ KOMARÎ KURDISTAN 1946

Kerîmî Husamî



Wek dezanîn îsal gelê me pêşwazî le 50. salî Komarî Kurdistan deka ku le salî 1946, le rojhelatî Kurdistan, le bajêrî Mehabad hate awakirin.

Komarî Kurdistan yekem dewletî neteweyî Kurd bû ke be resmî deselatî millî Kurdî rageyand. Le vir ez naxwazim ku aliyê siyasî û hel û mercî awakirina Komarî Kurdistan bideme ber bas û şikirdinewe. Dexwazim jibo agadariya xwendevanên hêja yên kovara Çira, be kurtî layenî kulturî û dananî hêndê yasay civatî Komarî Kurdistan bas bikem.

Gelî Kurd le rojhelatî Kurdistan, le serdema hukûmeta Pehlewî da, le gişt mafî neteweyî bêbeş kirabû. Ziman û kultur û lîbas û gişt şwênawarî millî Kurd qedexe bû. Le mekteb û le îdarey dewlet, axaftin be zimanî Kurdî yasax bû. Le îdarey dewletî le tablo nûsra bû *"Axaftin tenê be zimanî Farsî."*

Yekem hengawî Komarî Kurdistan bujandinewe û perepêdanî ziman û kulturî Kurdî bû. Ew gawe le serdemî Komeley J. K. ta raddeyek hawêjrabû. Komarî Kurdistan zimanî Kurdî le mekteb û îdare da kird be zimanî resmî. Xwêndin le mekteb be zimanî Kurdî dest pê kira. Kitêb û kovar û rojname be zimanî Kurdî hatine weşandin. Weşanxaney Kurdistan destî be kar kird. Hêsta berî awakirinî komar, le şeşî mangî Dêsambrî 1945 kovarî Kurdistan (bilawkerewey bîrî Hizbî Dêmokratî Kurdistan) geyişte destî xwêndevanên Kurd. Le 11. 1. 1946 rojnamey Kurdistan derçû. Paşê kovarî Hawar, Niştiman, Helale, Gîrrûgalî Minalan hatine weşandin. Radyoya Dengî Kurdistan, 3. 4. 1946 le Mehabad dengî Komarî Kurdistanî be dinya

rageyand. Sînemay Kurdistan awakira. Kitêbxaney millî ronra. Rojnamey Kurdistan, le jimarey 11. 1. 1946' da em agadariyey bilaw kirdibûwe:

"Be tewawî ehalî xoşewîstî Sablax radegeyendrê

"Le ser emrî pêşeway mezin û qerarî Hizbî Dêmoqrati Kurdistan, lewey bew la we pêwîst e bo perepêdan û rewacî zimanî Kurdî, xwêndin le medresekan be Kurdî bê. Lew tarîxe we ta 10 rojî dîke her kesêk kurr û kiçî hebê ke 'umrî îqtizay xwêndin bika, debê bînêrê medrese. Her kesê lew emre rû werbigêrê, be tundî mucazat dekrê."

Pêşewa Qazî Mihemed rojî dûy Rêbendan (rojî awakirina Komara Kurdistan) le gotarî xo da debêjî:

*"Çend medresey kurrin û kiçan-man kirdewe. Medresey şewane-man dayîr kird. Kitêb be zimanî Kurdî tercume kiran. Kurr û kiç û piyawî gewre le medarisî şewane û rojane be zimanî Kurdî dexwênin. Le cîyatî ewey şeş-hewt sal xerîkî xwêndin û fêrbûnî Farsî bin, le mangêk û du mang da debine xwêndewar û hemû şitêk dexwêninewe û denûsin. Bo rageyandinî hawarî xo-man be gwêy dinyayî pêşewt û 'edalet, muhtacî wesîley çap û bilawkirinewe bûyn. Çapxaney zor çak tesis kira û danira. Le şarî xo-man da be zimanî xo-man, be çapxaney xo-man kowar û rojname der deçê û bîr û fikr û daxwazî ême le dinya da bilaw dekatewe."*¹

Jibo çekirina kar û barê kulturî, heyetêkî ferhengî diyarî kira û çend biryarî giringî derkird. Wek:

1. Ew zarokî ke bêkes in û gedayî deken, ko bikirênewe le Mektebî Gelawêj dersî-yan pê bixwênin.
2. Xelkî nexêndewar amade biken, le mektebî şewane ders bixwênin.
3. Hemû tablo û nûsînî ser dergay mekteb û îdare û cadde be Kurdî binûsrê.
4. Biryar dira corî lîbasî şagirdî mektebkan diyarî bikrê.

Jibo ewey ku zimanî Kurdî neşewênrê û herkes bo xo wişey Kurdî danetaşê, Heyetî Ferhengî le agadariyek da rageyand:

"Be tewawî zanayanî berzî Kurd radegeyêndrê

*"Bo bekarhênanî wişey Kurdî ke ta ewro bekar nehênrawe, debê le pêş da be Heyetî Ferhengî pêşniyar bikrê û le wê da teswîb bikrê û îcazey bekarhênanî bidrê û kes heqî niye wişe ronê û bekarî bènê."*²

Le ser emrî Pêşewa, Medresey Pehlewî le Mehabad nawî gorra be **Mektebî Kirmancî Kurdistan**. Medresekanî dîke be nawî **Mektebî Kurdistan, Gelawêj û Pêşewa** naw niran.

Le Komarî Kurdistan xwêndin jibo zarokan bû be îcbarî. Çend mamostay Kurdî welatparêzî Kurdistanî Başûr hatibûne Mehabad û ders-yan be şagirdan degot. Jibo rêzgirtin le mafî ayînî û kulturî kemînekan, jibo zarokî Cûlekan le Mehabad mektebî taybetî awakira.

Dûmahî heye.

¹ Rojnamey Kurdistan, hejmar: 10 (4. 2. 1946)

² Rojnamey Kurdistan, hejmar: 15 (16. 2. 1946)

BİRCANÊ DİYARBEKİRÎ RA MEKTUBÊKE

Serdar Roşan

Birawo,

Belê, Newroz emsarr serranê verî ra ciya hame pîrozkerdiş. Çend aşmî ra ver bi waştişê şarê Diyarbekirî, Belediyey Diyarbekirî qerar dabi ku Newroz bi awayêke weş bêro pîrozkerdiş. Ez do (go) etya qaso ku taqetê min ê nûştişî dest bido û ziwane min bigeyro, şima rê şahî û pîrozkerdişê Newrozî binûsî. Bi nûştiş, bi kelîman îfadekerdişê heme weşî û renganê Newrozî zehmet o. Labelê semedê xusûsiyetê mektubnûştişî ez enî rêzan nûsena. Eger dimacû wextê şima bibo û şima temaşey filmanê Newrozî bikerê şima do (go) qestê min fam bikerê.

Ez wazena şahî û pîroziya enî rocî ra çend nimûnan binûsî. Etya, enî çiyane ku ez do biyarî şima çiman ver, çiyê ku min bi xu diyê û çiyê ke hevalanê min, min rê behskerde yê. Bê ku ez derg bikerî û serey şima bidecnî, de bêre ma piya raşteraşt şêrin temaşeyê operaya Memê Alanî.

Şewa Newrozî

Şewa Newrozî, badê ku tarî kewte erdî ser, di se'et heşt de, di Banê Tiyatroy de operay Memê Alanî dest pê kerd. Di salone de cayêke tenê zî veng nêmendbi. Herçiqas banê tiyatroy pîl o zî, cayêke pîlêr do baştir bibiyayêne. Semedo ku ena raya ewilîne bî, destane Memê Alanî bi awayêke weş di şaristanê Diyarbekirî de, verê çimanê temaşekerdoxan de ze tabloyêke ku hunermendêke renganê xu bi sebir û dîqqet ser o bi ca bikero hameyne xulîqnayîş.

Herçiqas di şanê Newrozî de bi seyan kes semedo ku yew bilet xu dest fîno di verê berê rîyatroy de kom bi zî hêviya îne bi ca niyamî. Biletê ena şewe, di aşmî verocû qediyaybî. Hameyne vatiş ku ena ray peyey bazarê siyay, siyarotoxî bêkar mendîbî.

Ez zehf zereşikiyaye wa, semedo ku ez nêşkena bi nûştiş ena opera bi heme huner û weşiya cay û ay hîssê ku di wextê temaşekerdişî de merdimî de peyda benê, biyarî ziwan. Belê, wexta merdimî temaşey operay kerdêne, merdim şîne dinya û heyatêke bîn. Di a dinya de ciwamêrdî bî, bi xewf û heybet bî. Cinî bî, bi rindiyey xu horî bî. Merdim geh di cenet, geh di cezhim de bi. Geh di hewnê şêrîn, geh zindan de bi. Hewn û xeyal, ters û heybet, merdî û bêbextî, başî û nebaşî, feqîrî û pêrî, hevalî û neyarî, heskerdiş û kîndarî, bi kilmî to vatêne qey merdim parçeyêke tarîxê însaniyetî ciwiyêno. Heme tabloyan di verê çimanê merdimî de şikil girotêne û hameyne bedelnayîş. Bi asanî ez şikena vacî ku rihê dengbêjanê ma yê merdan şa bi. Vengê hunermendan pêl bi pêl di miyanê dol û newalan de, serê koyan ra, di asîmanê welatê ma de, çar goşan ra weşî û şayî kerde vila. Vanê emşo di asîmanê koy Agrî de, estarey Ehmedê Xanî hergo hewe zehfêrî şewq dayne. Zehf merdimî kelegirî bî. Keynanê ciwanan semedê heskerdişê (sînayîşê) Mem û Zîne, di a salona tarî de wesar û payîz xu vîrî ard. Xortê ciwanî îne ra kemêr nêbî. Eger destbidayne do zehf ciwametdan semedê heyfê Memî êtiş bikerdêne sehnî ser. Belê, merdim nêzano di temaşekerdişê ena opera de çi hîssî şarî de peyda bî. Tenê Homa û hîsketdoxê ma zanê kamco hîssî di rihê îne de newe ra xuliqiyay...

Di şanê Newrozî de televîzyonî ena opera dîrekt mocnay (nawite). Merdimê ku nêşkay şêrê temaşe, qîmê xu bi televîzyonî ard. Labelê ganî merdim vaco ku qediyayîşê opera dima, di şanê Newrozî de, temaşekerdoxan bi xeyalanê ciya-ciyayan xu verta da miyanê tariyê şewe. Her merdimêke bi xeyal û hêviyê xu, bi fikir û waştişê xu, kêfweş yan zî xemgîn...

Helbet pîrozkerdişê Newrozî tenî bi operay Memê Alanî nêbi. Badê opera, waştişê henî embazan ser ro, ma helîkopterêke weniştî ku ma di asîmanê Diyarbekirî de bigeyrê û bivînê ku di ena şewa tarî de cot de şaristan senîn eyseno. Zege min verî zî vatbi, ez do hewl bidî (bixebitîyî) ku qe nêbo menzerayêke biyarî çimanê şima ver, eger ena menzera zehf rengîne nêbo zî.

Di Asîmanê Diyarbekirî De

Belê, ma di tariyê şewê Newrozî de, bi helîkopter di asîmanê Diyarbekirî de geyrenê. Siûdê ma esto, hewr di asîman de nêeyseno. Şewêke çîksayî ya. Di

asîman de estarey bi heme weşîyê xu temaşey ma kenê. Heme şewan zêdeyêr (vîşêr) roşin ê. Ti vanê qey ê zî ma dir Newroz pîroz kenê. Ma cor de temaşe kenê, şaristan di miyanê rengan de mendo. Gelo ena keskîsor a di ena şewa tarî de eysena? Nê nê. Ena keskîsorê ma wa. Keskîsorê Newrozî wa. Belê, wexto ku ma nîzdî ro bajarê Diyarbekirî yê kanî kenê, bi weşîyê menzerawa eysayî, ma konê miyanê xeyalan. Bedenê Diyarbekirî seraser hamewo xemelnayîş. Roşnayî zey aw herekêna. Bedeno rengîn çimanê merdimî ver de şiklanê zehf bedeliyayeyan gêno. Henî rayan zey gilayanê mûndan ê Xeca Koy Sîpanî eysenê. Eger merdim hayî ro ci nêbo ku di helîkopterêke de wo, bêguman merdim wazeno cor de xu berzo miyanê enî daristanê gilayan... Bi têdiyayîşê helîkoptere ene ray rismêkew bîn yeno xuliqnayîş. Bedenê Diyarbekirî kofiyânê ciniyanê Kurdan anê verê çimanê merdimî. Ay kofiyê rengînî û bi zêrran xemalnaye eysenê. Diyarbekir, di verê çimanê merdimî de beno zey cinîke rinde ku di tarî şewe de tê geyrena. Banê berzî, gilay mûndey, bedeno nexşîn tabloya hunermendî tamam kenê. Kela zerê merdimî wirzena, germbiyayîşê canê (ganê) merdimî hîna lez geyrayîşê gunî ano vîrê kiçî (merdimî). Ma di ezmanê Diyarbekirî de, bi zerêka germine, ro zerê şaristanî (bajarî) temaşe kenê...

Rochelatê şaristanî de çemê Dicle herekêno. Roşnê şaristanî ver, wexto ku merdim cor de hanêno, vînenno ku Dicle bi awayêkew bîn herekêna, roşnayî awê Dicle bedelnawa. Ku hereknayîş û pêlanê aw ra nêbo ez do vacî ena Dicle niya... Adirê Newrozî, di serê bedenê vakurîyê en berzî de bi heme pîrozîya xu, ver bi asîman pêl dano. Ti vanê semedê rizgarkerdişê (filitnayîşê) Memî, Tajdînî banê xu veşnawo... Hendî Dehak di serê sînîya xu de kankilanê gozan nêvînenno. Adirê Newrozî hendî gozêre tenî nêverdeno.

Di asîmanê Diyarbekirî de fişekê hewayî teqenê. Belê, bi renganê ciya-ciyayan, di asîman de bi fişekanê hewayîyan "Newroz Pîroz Bo" yeno nûştiş. Di binê asîmanê Diyarbekirî de, ena şewa tarî de zehf çî eysenê... Ez serey şima nêdecnî.

Rocê Newrozî

Zege şima zanê, rocê Newrozî ma kar nêkenê. Roşan o. Badê arahî, ma çend embazî piya veciyay miyanê bajarî. Ma va ma banî ka di eno roco weş de Diyarbekirîcî Newrozê xu senîn pîroz kenê. Ma verê xu şa miyanê şaristanî, şaristanê kanî. Herçiqas lazim niyo ez vacî, la şarê şaristanî bi cilanê xu yê mîllîyan rengêkew bîn dayne enî rocî. Di serê rehîrê xu de ma pê hesiyay ku di miyanê şaristanî de trafik vinderto. Badî coy ma ra hame vatiş ku semedê

şahî, di miyanê bajarî de trafik dawo vindertiş...

Belê, ez senîn vacî? Çar hetanê Diyarbekirî ra vengê def û zirna bîne berz. Di eno roco weş de, bi waştîşê Belediya Diyarbekirî, belediyane ma yê bînan ra govendgêrî (grûbê govende, koçekî) hameybî şirawtiş. Enka çar hetanê bajarî ra enî grûbê govende, bi govenda xu ya mehelli, bi hunermendî, kuçanê Diyarbekirî ra ver bi rastey Şêx Seîdî herekiyayne. Hergû grûbe en tay se kesî ra viraziyaybî. Xortê çelengi, keyney bedewî dest bi dest, pêl bi pêl leqayne. To vatê qey mergê zozanan ê Serhedî yê. Hewayke şenikî (sivikî) eno deryay gul û vilan şanayne tê. Şarê bajarî di kiştanê rehîran de, temaşey îne kerdêne. Henî reyan bi tililî û çepikan ê zî têkilê govende bîne.

Badê grûbêke govende, grûbê komedî veciyay. Herçî bi veciyayîşê nê komikan tûtî zehf kêfweş bîne. Tûtan bi hewar û qîrrî waştêne kolikanê pîlan ser o temaşey komikanê komedî bikerê. Raştiko ê grûbanê komedî zî kêfêkew ciya dayne enî rocî û kêfê tûtan ser ra çîke çinêbi. Tûtî bi zerweşî hewayne û kêf kerdêne.

Badê demêke, enî grûbê govende pêro resay rastey Şêx Seîdî. Ewca serekê belediye kilm xeberî da. Badê xeberdayîşî ena ray heme grûban piya bi hewt def û zirnan govende girote. Ena menzera sosin, beybûn, pîrpizêk, nêrgiz û vilê bihvêran (vamêran) ardêne vîrê merdimî. Enî veng û menzereyan, xuliqnayîş û xumîyanê tebîetî ku di wesarê welatê ma de ameynê meydan, bi awayêkew tesîrin di xorînîya hîssanê merdimî de cay xu girotêne. Herê, şima zanê, min verî zî vatbi, ez hendî nêşkena ena tablo teswîr bikerî. Werreka şaîra ma wa namedare Binefşa Xezale etya bibîne û di cay min de şima rê binuştêne.

Di dormarê Diyarbekirî de, Diyarbekiricî di seyrangehan, miyanê gul û vilan de Newrozî bi tewir tewir şahiyar pîroz kenê. La etya verî ku ez xu vîr akerî, lazim o ez vacî, eyro roc rocê heskerdoxan o. Ê heskerdoxî xu keyeyanê xu ra fînenê dûrî ku nîzdî waştanê xu bibê. Bi seyan xort û keyney Diyarbekirî, di verê çemê Dicle de, dest destê jobînî de, di miyanê xeyalan de, bi vatişanê şêrînan pê dir xeberî danê, lewanê engemînan jobînî ra wazenê. Gulê sûrî û gulê pembey vişkoyênê. Çemê Dicle bi bar o, barê yê giran o la bi kêfweşî herekêno, Mem û Zîna Cizîra Botanî rê silamanê xort û keynanê Diyarbekirî beno. Heskerdoxî bi hêviya ku biresê Mem û Zîne, qevdanê vilan, nêrgizan, gulanê sûr û pembeyan erzenê miyanê çemê heskerdişî... Û vanê hergû serre, di vîst û yewê Edare de Mem û Zîne newe ra xuliqênê û di kuçanê Cizîra Botanî de, di verê çemê Dicle de tenî heskerdoxan ra eysenê.

Veyşanî ver ma gêj bîy. Kêf û şahîya enî rocî ra ma wer kerdibi xu vîr a. Ma weriştî şî keye. Ma boya xu day, dima ra ma verê sifreykew mîrankî de niştî ro, wer werd. Şan de ma do şirin Stadyûmê Pîlî.

Piyes

Belê, enka ma kewtê zerey Stadyûmî û ma di cay xu de ronîştê. Qasêke badê cûy do piyes dest pa kero. Program çende babetan ra viraziyawo la ez do şima rê tenî behsê piyesê Dehakî bikerî. Piyes bi destê merkeza kulturî hamewo amadekerdiş û bi awayêke hemdem hamewo şîrovekerdiş. Di stadyûm de cawo veng nêmodo. Nizdî vîst hezar temaşekerdoxî do temaşey piyesî bikerê. Tv zî do raşterast piyesî bimocno.

Piyes bi kemîkerdişê roşnî û bi muzîkêkew xofin dest pê keno. Pêlê recfe yenê kiçî (merdimî). Dehak bi heme xof û nebaşiya xu, bi eskeranê xu wa kono zere. Ma enka di dinyayêka bîne, dinyayêka kane de, enka ra bi hezar serran verî ciwiyênê. Pêlê roşnayî, cilê Dehakî û eskeranê cê, motîfê ku eysenê heme têdir nê hîssan însanî de peyda kenê. Kaykerdoxî xeberî danê, la ma vengê îne nêşinawênê. Hereket û muzîk, çiyê ku benê, merdim seyrê piyesî ra fam keno. Çar kenaranê meydanê (raştey) piyesî ra hêdî hêdî merdimê bînî eysenê. Heyatê însananê ay çaxî eyseno. Ma şarî ra asinkar, koşkar, şiwane, citêr, rezwan û gelekî xebatkaranê bînan vînenê. Dehak rehet niyo. Eskerê cê, di lez û bez de yê. Pêlê xofê eskeranê Dehakî tersêkew pîl di miyanê şarî de peyda kenê. Her gama ku şina, riyê erdî ver bi cahnim yeno bedelnayîş. Heyat beno ezabêkew giran... Badê demêke, miyanê şarî ra tevgerê henî merdiman dest pê keno. Muzîk merdimî şano tê. Çar kenaranê stadyûmî ra veng yeno. Çirûskê (çiqlikê) adirî eysenê. Tîrêjê roşnî ra-ray benê geşî. Bi keft û leftêke pîle, di miyanê mij û dumanî de, roşnayî tarîya şewe darena we. Dehak û eskerê xu nêşkenê xu vera adir û tîrêjanê roşnayî bipawê. Muzîk yeno bedelnayîş. Kêfweşî hem bi muzîk hem zî bi piyes yena pîrozkerdiş. Vîst hezar temaşekerdox çepikan kuweno. Diyarbekirî tarîxê xu ra riperran vînenê. Bi sereberzî (çaretokerdeyî) û xemremnayeyî stadyûm ra vecênê. Beno ku zey min, di hewnê gelekî temaşekerdoxan de zî piyes bêro tekrarkerdiş.

Bi kilmî, Newrozê ma yê emsarrî di şaristanê Diyarbekirî de, bi enewa hame pîrozkerdiş. Reyna zî Newrozê şima heminan pîroz bo. Heme rocê şima bi şayî, bi kêfweşî û xeman ra dûrî bivêrê...

Diyarbakir, 22.03.2021

BILA WIRG BE

Ahmet Cantekin

Pirjîr xwe ji xwe re digot:

Dîsa! Dîsa nameyek ji min re hat! Hawar ji van nameyan! Hawar! Nebêjin ku çima tu şa nabî. Nebêjin!

Belê, ez dizanim gelek kes hene ku li bendî nameyekê ne. Ew dixwazin ku ji wan re nameyek were. Bila were, bila du rêz werin. Lê ez çî dibêjim, dîsa nameyek ji min re hat. Aciz dibim û acizbûna xwe jî nîşan didim.

Di 1992'yan de ji Pirjîr re nameyek tê. Name di şeş rojan de digihêje destên Pirjîr. Ew berî ku nameyê vebike, nameyê bi dîwêr ve bi dar ve dike. Neh gavan bi şûnde diçe. Neh tîran hildigire û xwe amade dike. Yek li ser yekê davêje nameyê. Ji ber ku ew hîn bûye, hemû tîr jî lêdikevin.

Pirjîr dibêje name paqij bû. Dûre dest bi xwendinê dike. Dema ew nameyê dixwîne, dixwaze zûtirîn were dawiya daxwazên wî. Di destpêkê de jî di mêjiyê wî de hebû. Ma lawê xelkê ji bo çî ji Pirjîr re name binivîse. Hem jî çima niha...

Name bi vî awayî dest pê dike.

'Birayê min ê delal û qedirbilind!

Zemanekî dîr û dirêj e ku tu çûyî wî welatî. Te ji me re nameyek jî neşand. Lê bila rindî ya min be û ez nameyekê dişînim. Ez hêvî dikim ku tu xweş î û saxiya te li cîh e. Tu ji me mepirse! Tu çûyî û te xwe filitand. Em! Em ên pêrîşan li van kuçeyan solan kevn dikin. Qûna me li ser sendeliyên qehweyan kul bûne. Lê tu, tu sedî sed li ser sendeliyên nermik rûdinî. Porzer pir in. Bijî ji te re...'

Belê, belê... 'heval' bi 'birayê' min dest bi nameya xwe dike. Ez li kû bûm birayê te? Destê bavê min bile bi dereke diya te nebûye. 'Bira'! gêjê min, di vî zemanî de bira ma, hal ma! Ez ji birayê xwe aciz bûme got Pirjîr. Dom kir, ji dest wî hatime amanê! Name li ser name dişîne û malavayî her tim jî bê pere ye. Ez nizanim ew bi ew pereyên ku ez dişînim çi dike! Ku ew meriyan bixwe, têra wî dikin û li ber jî dimînin. Nebe ku ew her şev li xwarinxaneyan tev hevalên xwe dixwe û vedixwe. Ez çi bizanim! Yê ku ez dizanim ew her tim pêrîşan e, bê pere ye, ew her tiştî dike ku kar bibîne, lê ev bû û ev nebû; du heftayên din yekî soz daye ku ew ê karekî baş bikin...

Lê...lê... ev bûn çend sal ku golik mangê dimije. Û golik qet mezin nabe!

Lê 'bira', tu jî rabûye û doza biratiyê li min dikî. Ev zemanekî dûr û dirêj e ku te name ji min hilnegirtine û rindiyê dikî û name ji min re dişînî. Yanî tu bi nameya xwe rûyê min sor dikî û min deyndar derdixî.

Çima nabêjî welatê ku tu çûyî çawan e! Tu çi dikî! Rewşa te çawan e! Hewniya te tê yan na! Dost û heval hene yan na! Tu bi çi îdara xwe dikî! Ew kîjan zimanî dipeyvîn. Tu çawan dikî! Ne ku ew kurmançî şoran dikin! Bêje, tu dixwazî li wir bimînî yan na! Bêje, te çima welatê xwe, bajar û hevalên xwe, dê û bavê xwe, xwîşk û birayên xwe li cih hiştin û çûyî! Bêje, ka ez çi dixwazim! Ma ez dixwazim li vir bimînim. Ma ez ji vir hez dikim!

Yek jî tu dibêjî, tu çûyî û te xwe filitand. Rast e, ez ji ber lepên axayên ku xulamên dewleta tirkên dagirker in û bêheşên ku di ber wan de dikirî min bikujin, filitîm. Filitîn ew filitîn e! Lê li vî welatî xelkê çi karê min heye!

Tu dibêjî 'bira', baş e, dema ez li dijî axayên me yên zordest bûm û li ber guleyên wan bûm, tu li kû bû? Çima te destê xwe yê alîkariyê dirêjî min nekir 'bira'? Çima te du rêz li ser dê û bavê min nenivîsîne? Ew çawan in, çi dikin! Bêheşên axayan çûne dikana bavê min û cîhê min ji bavê min pirsîne. Baş e, eger em 'bira' ne, çima tu biratiya xwe nakî? Birûskekê li mala axayan naxî?

Eger tu naxwazî ku qûna te li ser sendeliyên qehweyan kul bibe, diwê tu karekî peyda bikî. Biçe ba gundiyekekî û alîkariya wî bike. Hêşinahiyê biçîne û bîne bifroşe. Deh tene mirîşkan tev keleşerekî bikire û hêk, varik, çêlikên mirîşkan bifroşe.

Rûnene. Wek min bike. Li dijî axayan û leşkerên dagirkeran şer bike. Tu dizanî min çi kir û çi nekir. Hew te dizanî bû. Lê tu ne tev min bû. Te qusûr didîtin û tu nedihatî. 'Bira' her tim bira ye... Ez vê dizanim.

Li vî welatî jiyan ne rihet e, ne gengaz e, ne karê her kesî ye. Ev welat tev xwezaya xwe xweş e. Dar û berên xwe pir in. Daristan şên e. Hêşinahî û golên

vir gelek in. Lê adetên vir! Hawar! Oy hawar! Sed carî hawar! Gotina dawîn ez niha bêjim: Ez poşman im, ez sed carî poşman im ku hatim vî welatî! Ez nehatama! Bila min ev welata nedîtî ba! Bila ez neketama nav çerx û çanda wan! Hawar! Eger tu van rêzan fehm bikî jî ji bo te xem nake. Ji ber ku tu, wek min hoya ku bûye hoya hawar û hawara min nejîya ye. Tu nizanî!

Mê vir! Mexwaze jî! Ji bîr ve bike. Ne ku tenê vî welatî, hemû welatan. Bila bi tenê di bîra te de, di mêjîyê te de, di jiyana te de welatê te hebe. Li welatê xwe be. Li welatê xwe bijî. Ji yekî hev welatîyê xwe gotinan bibihîze, ne ku ji yekî biyanî. Gotin tûj in! Ne xweş in gotinên biyaniyan! Ya şîrin û şîrintirîn, axa meriyan bi xwe ye. Ew axa ku meriv li ser hatiye cîhanê. Ew cîhê ku meriv nas dike. Li ser mezin dibe û dibîne ye.

Belê 'bira'. Ez vê jî dizanim ku tu pir bi van gotinan bawer nakî. Ji ber ku tu neketiye rewşa min û yên wek min. Dema meriv bi xwe tiştêkî dijî, wê demê meriv wê baştir dizane. Lê dema meriv wek min dijî bi şûn de jî xira dibe. Belê, te rast xwend. Meriv xira dibe. Xwe bi xwe nabe. Hinek mêjîyê merivan roj bi roj, hefte bi hefte, sal bi sal, bi awayekî xweşik xira dikin. Mîna ku tu çoyekî di destê xwe kî û bi çê tevnika pîrewokê xira bikî. Li vir mêjîyê merivan wirg dikin û dibe!

Eger di mêjîyê te de, welat nemirî be, dê û bavên te her hebin, daxwaza vegeê her jîndar be; û tu nikaribî jî êdî di mêjîyê te de rûpel bi nav û hev dikevin. Derd û kul di ser re diçin. Dema di ser re jî diçin, êdî rewşa te ne tu rewş e.

Bîleta te hatiye birînê û tu yê çûyî nê yî.

Ji tevnika xirabî guhdarî bike:

Li welatê xwe be.

Li welatê xwe serbest û azad bijî.

Bijî, ji bo xwe, ji bo welatê xwe yê serbixwe bijî.

Şer bike ku tu bikaribî bijî.

Bijî ku tu bikaribî şer bikî.

Bi hêz be.

KIRDKÎ (DIMILKÎ) DI JEWAMOREY Û BOLAMOREY

Haydar Diljen

Nameyê çiyê ki kes şeno amoro (bihûmaro), Kirdkî (Dimilkî) di yan jewamor yan zî bolamor ê. Nameyê çiyê ki kes nêşeno amoro zî tenya jewamor ê. Ki (eke) name, nameyê jew çî bo yewamor, namey bol (zaf) çiyar bo, yanê jew çî vêşêrî bo, bolamor o.

Dimilkî di mesela bolamorey tenya bi namandê çiyar a sînorkerdê niya. Him sifetê ki wesfanê çiyandê bolamoran danê û him zî fiilê ki cumla di atribut (yüklem) ê, tayn halan di virênê benê bolamorî. Atribut, cumla di jûfini (ge ge) goreyê bolamoreya faîlî û jûfini zî goreyê bolamoreya objeyî formê bolamorey gêno û virêno. Nê viriyayîşî pêro zî goreyê tayn qaydan benê. Ez do nê nûştedê xo di nê qaydan ser o vindera. Min Dimilkîya kişta (dormarê) Sêw-regî (Sûki) esas girota.

Ze ki min amorda verîni di zî va (*biewinê Çira amor.1, riperr: 95*),

embazê ki Dimilkî zanê, ki bi çiman-dê krîtîkkerden a nê nuştî biwanê û fikranê xo vajê, ez do zaf zerweş ba.

-ê -î -y -an

Naman di Bolamorey

1. Nameyê ki bi herfênda konsonant a qedênê, demeyo ki bolamorî bê herfa "î" gênê.

Mîsal:

jewamor	bolamor
camêrd	camêrdî
çim	çimî
dest	destî
goş	goşî
kitab	kitabî
Kurd	Kurdî
merdim	merdimî
nan	nanî
rez	rezî
welat	welatî

2. Nameyê ki bi ”-î” ya qedênê sufîks nêgênê. Yanê jewamor û bolamoreya ci zey pê ya.

Mîsal:

jewamor	bolamor
cinî	cinî*
darî	darî
kardî	kardî
lûlî	lûlî
mî	mî
partî	partî
qutî	qutî
sirsî	sirsî
şilwalindî	şilwalindî
zincî	zincî

* *Goreyê Malmîsanijî, jew ”y” peynîda kelîmada bolamori di esta, labelê telafûz di weş beli nêbena. mîsal: cinîy, darîy, kardîy*

Bolamoreya namandê winasînan (winayênan), cumla di hîna weş belî bena.

Mîsal:

Cini ya yena. / Cini yê yenê
 Cinî amê. / Cinî amey.
 Cinî do bêro. / Cinî do bêrê.
 Raya dûri / Rayê dûrî
 Henara tirşî / Henarê tirşî

3. Nameyê ki jewamorey di bi ”-i” ya qedênê, demeyo ki benê bolamor, ”-î” virêna bena ”-î”.

Mîsal:

jewamor	bolamor
bizi	bizî
dewi	dewî
gozi	gozî
keyneki	keynekî
lingi	lingî
nani	nanî
qelemi	qelemî
şamiki	şamikî
vami	vamî

4. Kelîmeyê ki jewamorey di bi ”-a” ya qedênê, bolamorey di herfa ”-y” gênê.

Kelîmeyê winay di tewirî yê:

a. Tayn kelîmeyê winasîni, demeyo ki benê bolamorî, herfa ”-a” ya peyêni virêna bena ”-e”.

Mîsal:

jewamor	bolamor
balişna	balişney
gila	giley
ginda	gindey
kesa	kesey
keyna	keyney
makîna	makîney
manga	mangey
mojla	mojley
pencera	pencerey
qisa	qisey
şûşa	şûşey
teyara	teyarey
zirna	zirney

b. Tayn kelîmeyê ki jewamorey di bi "a" ya qedênê, demeyo ki benê bolamor "a" ya peyênî nêvirêna zey xo manena.

Mîsal:

jewamor	bolamor
ga	gay
la	lay
sa	say
zama	zamay
Zaza	Zazay
ma	may
wa	way

5. Kelîmeyê ki jewamorey di bi herfandê vokalan ê bînan (-e, -o, -u, -û) a qedênê, bolamorey di peynî di herfa "y" gênê.

Mîsal:

jewamor	bolamor
adilge (adirge)	adilgey (adirgey)
bellû	bellûy
cezwe	cezwey
deleme	delemey
estare	estarey
giştane	giştaney
ko	koy
mercû	mercûy
parzane	parzaney
simore	simorey
şane	şaney
tembûre	tembûrey
tû	tûy

Sifetan di Bolamorey

Wexto ki sifetî wesfanê çiyandê bolamor danê, sufiksê bolamorey gênê.

Mîsal:

jewamor	bolamor
saya sûri	sayê sûrî
kutiko har	kutikê harî
embazo erciyaye	embazê erciyayey
nana germi	nanê germî

Fîlan sero tesîrê bolamorey

a. Fîlê îtranstîfî

Di fîlandê îtranstîfan di, ki faîl bolamor bo, demeyo nikayên û demeyo ameyox di fîl "-ê" gêno û beno bolamor. Di demedo viyarte di zî ki fîlî bi herfênda vokal a biqediyoy "y" gêno û ki bi konsonanta biqediyê zî "-î" gêno.

Demeyo nikayên:

Mîsal:

Şilan û Serdariya yê huwenê.
Ma yê werzenê.
Ê yê yenê.
Şima yê remenê?

Demeyo ameyox:

Mîsal:

Şilani û Serdarî ya do bihuwê.

Ma do werzê.
Ê do bêrê.
Şima do biremê.

Demeyo viyarte

Mîsal:

Şilan û Serdarî ya huway.
Ma weriştî.
Ê amey.
Şima remay.

b. Fiilê Transtîfi

Demeyo nikayên

Di demeyê nikayên ê fiilandê transtîfan di , ki fail bolamor bo, fiilo transtîfo ki atribut o zî beno bolamor û bi "-ê" ya qedêno.

Mîsal:

Şilani û Serdarî ya yê zebeşî wenê.
Ma yê estori awdanê
Ê yê welatê ma veşnenê.
Şima yê şamî virazenê.

Di demeyê nikayên ê fiilandê transtîfan di, tesîrê objî jewamor û bolamoreya fiilî ser o çiniyo. Yanê obje jewamor bo zî bolamor bo zî formê fiilî jew o.

Mîsal:

Ma yê estori awdanê. / Ma yê

estoran awdanê.

Ez a estori awdana. / Ez a estoran awdana.

Di demeyê nikayên ê fiilandê transtîfan di, ki him fail him obje bolamorî bê, obje sufiksê bolamorey "-an" gêno û fiil bi "-ê" ya qedêno.

Mîsal:

Şilani û Serdarî ya yê zebeşan wenê.
Ma yê estoran awdanê.
Cendirmey ê dewan veşnenê.
Şima yê encîlan wenê.

Demeyo viyarte

Di demeyê viyarte yê fiilandê transtîfan di, fiil goreyê holamoreya failî nê, labelê goreyê bolamoreya objî beno bolamor. Yanê kiştawamorey û bolamorey ra mabêndê objî û fiilê transtîfi di ahengê esto.

Obje ze sufiksê bolamorey "-î" gêno; fiilo transtîfo ki atribut o û bi herfênda konsonant a qedêno "-î" gêno, o ki bi herfênda vokal a qedêno zî "-y" gêno.

Mîsal:

Min henar werd.
/Ma henar werd.
Min henarî werdî.
/Ma henarî werdî.
Şilani û Serdarî ya zebeşî werdi.

Şilani û Serdarî ya **zebeşî** werdî.
Ma **estori** awdê.
Ma **estorî** awday.
Cendirman **dewi** veşnê.
Cendirman **dewî** veşnay.
Şima **encîli** werdî.
Şima **encîlî** werdî.

Demeyo ameyox

Di demeyê ameyoxê fiîlandê intrans-tîfan di, fiîlî goreyê bolamoreya faîlî, benê bolamor. Yanê mabêndê jewa-morey û bolamoreyda faîl û fiîlo ki atribut o di ahengê esto, ki faîl bolamor bo ganî (gerek) fiîl zî bolamor bo, ki faîl jewamor bo ganî fiîl zî jewamor bo.

Mîsal:

Şilani û Serdarî ya do **zebeşî** bûrê.
Şilani û Serdarî ya do **zebeşan** bûrê.
Ma do **estori** awdê.
Ma do **estoran** awdê

Cendirmey do **dewi** biveşnê.
Cendirmey do **dewan** biveşnê.
Şima do **encîli** bûrê.
Şima do **encîlan** bûrê.

Ez do goşt bûra.
Ma do goşt bûrê.
Ti do goşt bûrê.
Şima do goşt bûrê.
A/O do goşt bûro.
Ê do goşt bûrê.
Ez do **sayan** bûra.
Ma do **sayan** bûrê.

Demeyo ameyoxê fiîlandê trans-tîfan ser o tesîrê jewamorey û bolamoreyda objî çiniyo.

Mîsal:

Şilani do **kitab** biwano.
Şilani do **kitabân** biwano.
Şilani û Arjenî ya do **kitab** biwanê.
Şilani û Arjenî ya do **kitabân** biwanê.

JÎ KURTEÇÎROKA HEVÇERX YA KURDÎ FAZİL UMER SALÎH

Amadekar Xelil Duhokî

Di sala 1962-an de, li gundê Girreşê, nêzik bajarê Zaxoyê ji dayik bûye. Serî, navî û berhevî li çendîn gund û bajaran xwendiyê û di sala 1986-an de, beşê nojdariyê li zanîngeha Mûsil bi dawî aniye û niha jî li Zaxo diktoriyê dike. Di sala 1980-an de, çîrokên xwe di kovar û rojnamên kurdî de belav kirîne. Heta niha komeleka kurteçîrokan bi navê (Kalê Peşêman) çap kiriye. Me ev hevpeyvîne digel kiriye û dê çîrokeka wî jî, ji tîpên erebî wergerînin yên latînî. Em hêvîdar in qulaçeka edebiyata kurdî pîrr ke.

– *Kengî û bo çi te dest bi nivîsînê kiriye?*

– Ji salên heftêyan min dest bi nivîsînê kiriye, lê ez destpêka xwe ya dirust di salên heştêyan da dibînim. Bi hizra min kêma hene weku destpêk bizanin ka ji bo çi dinivîsin, lê hêvî ew e niha bizanin ji ber çi dinivîsin.

– *Barê edebê kurdî, evro çewan e? Helbest, çîrok û rexne.*

– Îro li Kurdîstana jêr destê Îraqê, ez dibînim helbest li koka pêşkeftinêyê û li ser rêya rast e, herwesa kurteçîrokê jî qonax birîne, lê tayên din taze hêj di landikê de ne.

– *Hizra te li ser edibên derveyê welatî çi ye? Wezîfa wan çi ye û çi biken baş e?*

– Nivîserê li derveyê Kurdistanê, bi hizra min du cor in. Yek ji Kurdistanê reviyê û ev kesane bawer nakim, ne ji xwe razî bin, ne jî rojekê qencyek ji wan çê be. Desteka din ku, ji kawdanên berteng û aloz cihê xwe guhastiye û derûn û canê wan hêj li Kurdistanê. Evane cihê rêz û qedirgirtinê ne û çavê me li xamê wan e. Pêdivî ye nivîserên derveyê Kurdistanê evan karan bikin:

Li ser Kurd û Kurdistanê bi wan zimanên biyanî binivîsin. Li ser dîroka Kurdistanê binivîsin, çinku li wir jêder û azadî berfirehtir e. Bo me awa û terzên nû yên torê biyanî wergerînin.

Binkarê ferhenga kurdiya danin.

– *Tu bi çi mijolî û pirojên te çi ne?*

– Ez niha piçekê bi zimanî ve mijolîm, min semînarek jî, li jêr navê (Vavartin û gogirandina zimanê nivîsînê) li binkê Yeketiya Nivîskaran pêşkêş kir. Heke delîve peyda bû, dê li gel hindêk nivîsînên xwe yên destxet çap kem.

– *Di vî kawdana xirab da, rola edibê kurdî çi ye?*

– Pêdivî ye tore van çîrayê gelan be, lê mixabin pîrraniya me erkê li ser milê xwe nizanin!

– *Edebê biyanî çi karîkîrin li edebê kurdî kiriye?*

– Wek dibêje: Mirov yan çav li siroştê dike yan jî çav li çavlêkerê duwê dike, lew afrandin û çavlêkirin herdu bi hevra dijîn.

DUBARE MÏRAR BÛNE

Fazil Umer Salih

Li cîhanek vala, mêzeyek avedan bû, teqên û şeçên diçû ber asmanî.

– Bi dehî ne.

– Bi pazdî ne û me ji xelkî bibûrîne.

– Bi dehî ne û me bi xelkê ra bigehîne.

– Ducihar û çî diqewmît bila biqewmît.

Dinya di çavên wî da wergera, adarîk û nîsanîk keftin nihâl û betenan, nêrgiz di latan dageş bûn, bêna behîştê dinya vegirt, xweşiyek bêhevdeng dilê wî girt, dest havête duşêşê, destê xwe bilind kir û jor da ber da xwarê û vêra digot:

”Bi bîstî ne û serê van herdu xişîma biçemîne!”

Dema destê wî yê giran gehîşte mêzê, destê wî di nav da çû xwarê û mêze pirtikî, her pîlek bi rexekî ve firî... Û ji xewê veciniqî. Navê Xudê îna, rûnişt, bawîşkek hatê û bi xavî li demjimêrê nêrî, serê wî hind giran bûbû, hizir kir demjimêr xelet e! Viya paldet ve, lê dergeh vebû û dayka wî hate jor, kirasê tebesî û fîstanê şîn, ode li ber çava şîn kir. Berê xwe da lewendiyên dayka xwe û bawîşkek îna xwe.

– Dê çî key?

– Ma xelk çî diken?

– Têşta xwe dixun, hizra îş û karên xwe diken, berê xwe diden dinyayê, çî heye, çî nîne.

– Tu nabêjî dê çî hebît?! Erd; girover e û her dê mînit girover. Her sal carekê li dûr rojê dizivirit û rojê carekê li dûr xwe. Herro, roj ji rojhilatî derdikevit û li rojava hinda dibit.

– Bes dawo jîyê me pê dibûrit!

Gotina dayka wî, tirarek tezî bû û dirust ji xewê rakir. Di dilê xwe da got:” Çi qewmiye? Çi caran hizrên dayka min ji dergehê aşxanê dûr nedikeftin, îro her tişteke qewmiye.”

– Rast bêje. Te vê spêdê çi bihîstiye?

Dayka wî bişkurî û bi dilgeşî bersiva wî da.

– Radyoyê got, Emrîka balefirek çêkiriye, dê pê çine asmanî û vegerin... Min jî hizra te û wan dikir.

– Vêca daykê vegerin, nevegerin, bizivrin, stû lê bişkên... Tu nabêjt me çi jê ye? Bapîrê min bi kerdîkilkî dibezî û bi sîmerxê difirî. Ez bi du linga dibezim û bi du çingilan difirim... (herdu destên xwe rahejandin wekî qurtê li ser kelexî) min got ka çi qewmiye!

Pîştî hîngê qawina têtstê lêdan û dema ji dayka xwe pirsî, ka Siyapoş hatiye yan ne. Dayka wî axînek rahêla û derkeft.

Rabû ser xwe, çavên xwe şûştin û ji serşûkê derkeft, lêvek xawliyê li ser milê çepê bû û bi lêva dî rûyê xwe zoha dikir. Zengilê lê da û xwîşka wî dergeh vekir, dengê Siyapoşî hatê.

– Rostem ji xew rabûye yan ne?

– Fermo yê çavêt xwe dişût.

Rostemî gazî kirê:” Ha eha ez hatim.” Xîret nekir sentor û pentora bikete ber xwe û ne jî porçika xwe şekir. Şelwalek ji dîwarî vekir û qemîsê reş kirine ber xwe, tilên xwe kirine şe û bi rê ket.

– Min îro bo wan sond xwariye. Bifirin berperên asmanî ji me naben!

– Ez nizanim çawan ew herdu xişîm ji me diben! Şeşê ji pêncê cuda naken! Ez hizir dikem dûrandina me ji zanîna me ye.

– Ji bîr neke domîne bexte. Ma heker hercar, çar cift bo te hatin, dê çi key? Ji bîr neke heker ewê digel te biket xişîm bit, te jî xişîm diket!

Vê danûstandinê, herdu gehandin ber pêpelîskên gazînoyê. Rostemî gava xwe havête ser peyîska yekê û li Siyapoşî zivirî û got:

– Îro ez dê li ser destê Serdar bim.

Siyapoş bi çavê gomanê lê nêrî û herdu bi silal keftin. Dema gehîştîne jor, ji qulaçekê du dest ji nav dûkêlê bilind bûn û herduwan rû kirê.

– Çi ye hûn şevêdî li vir nivistibûn?

– Dê were! Em xewa spêdê ji xwe dibeyin da cihekî bo axay bigirîn, hêj ew neraziye!

– Dirêj neke û me ber minet neke. Gazî çar şîşkên cergî bike û panka destê xwe bialîse!

Li ser mêzê bo qada şer û cengan. Dubare mir, dubarê deh xwarin. Duşes

bo aznîf, duşêş mir. Duşêş ma di destê wî da, duciharê deh xwarin. Hepîyek hate kuştin...

Êvar bû dema gehîştîye mal, ji Hilwazê pirsî ka firavîn çi ye? Dema gotîyê: "Te çi divêt?" Got: "Çayek wek ya mirovan!"

Xwe pal da ser textî û herdu destên xwe têk dan û danîn bin serê xwe. Ewî jî nezanî çewanê kulîç û heval hatin bîrê û xewna Serdarî dîtî, bişkurînek êxiste rûyê wî: "Min û Rostemî dumîne dikir, hindî me dikir min jê dibir, Rostem ji qehrên xwe da pîlek havêt li stûna xanî da û heraft!... Avahî bi ser êk da hilweşya. Ez mame li ser kursîka xwe û bi kenî ve min digot: "Tu çi dikey dê ji te bim! Tu çi bikey dê ji te bim!"

Dema xwîşka wî dergêh vekirî û çay bo înay, Rostem di xew çûbû û ew bişkurîn hêj li ser lêvan bû.

Destek mezin ew dîmen ji mejiyê wî malî û dîmenek dî nîşa da. Pîl ji asmanî dibarîn, hemî dubare bûn. Ehrîmen li ser heyvê rûniştîbû, pên wî li ser erdê bûn. Pêyek li ava deryayê dida û yê dî li çiyay dida. Pîl li stêran didan û Ehrîmenî diqîjand: Dubare, dubare...

Paşî Rostemî xwe di odeyekê ve dît, dîwar dubare bûn, erd zendorek bêbin bû, dubareyek jor de, ji banî dihate xwarê, Ehrîmen lê swarbû û dihajot... Jor da wekî birûsyê dihat, hindî Rostem hate xwe ku birevit, berhingar bit yan xwe vedet, neşiya. Dubare bi mejiyê wî yê şîşe keft û pirtikand!! Û tarîstanek bê domahîk li pê xwe hişt.

PEYVÊN GİRAN

Pîl: Berkê domîne

Kulîç: Fakulta Unîversîtê

Mêze: Mase

Xişîm: Nezan, nefam

Demjimêr: Saet

Qurt: Teyrê kelexa

Xwîşk: Xoh, xung

Dûrandin: Xusaretî

KİRMANCKÎ (ZAZAKÎ) DE NÊR Û MAYİK

Mûnzûr Çem

Hûmara (amora) Çira ya virêne de Haydar Diljenî, eve (ebi) namê "Dimilkî di Nerî û Makî" maqalê nusnê. Zeke H. Diljen ve xo kî vano, êy maqalaxo de Kirmanckiyê (Zazakiyê) hetê Sêwrege esas gureto. Ez kî wazen ke na nuştayê xo de, Kirmanckiyê hetê Dêrsimî de nêr û mayik çi turî yo dêy (êy) ser o vindîne ke ferqo ke wertê na hurdemêna fekonê Kirmanckî de esto, va bêro verê çiman.

1. Namê mayikî eve **-a**, **-e**, **-î** ra qedînê.

Mîsal: Danga, manga, maye, waye, soye, hoye, leye, kewaniye, çêwaye, murîye, sacî (sojî).

Zêdeyê namê mayikan (mayikû) eve **"-e"** qedînê. Fekê Sêwrege de hurêndîya na vengî **"-i"** cêno. Tayê cayanê (cawanê/cawonê) Dêrsimî de kî, mesela hetê Xozat û Pulurî (Tirkî de Ovacık) têpîya vengê **"-i"** yêno pêy.

2. Çi turî ke H. Diljen kî vano, sifetî xo ser o notr ê. Çi esto ke, eke sifet amelewê nameyî o name sufiksê nerî ya kî mayikî cêno (gêno).

Mîsal:

Fekê Sêwrege

awa gîrênayê
cewo gîrênaye
saya sûri
goliko sûr
nano teze
awa tezê

Fekê Dêrsimî

awa gîrênayîye
cewo gîrênaye
saya (sowa) sure
goliko sur
nano teze
awa tezîye

3. Sifetê ke wesfanê (wasfonê) çiyânê mayikan danê, ya kî alaqeyê xo û çiyânê mayikan pê ra esto, fekê hetê Sêwrege û taye cayanê Dêrsimî de eve vengê **"-i"** qedînê. Hama, esas fekê Dêrsimî de na veng **"-e"** wo.

Mîsal:

Nêrî

alîm
adir

Mayike

alîme
adire

bêbin	bêbine
bêkes	bêkese
bênamus	bênamuse
cesur	cesure
comerd	comerde
çewt	çewte
dêndar	dêndare
girs	girse
kez	keze
murdar	murdarre
namdar	namdare
parên	parêne
pêrsan	pêrsane
rind	rinde
rast	raste
saf	safe
şermok	şermoke
vêsan	vêsane

4. Fekê Kirmanckiyê Sêwrege de sifetê nêrî yê ke vengê "-e" ra qedînê, waxto ke wesfê çîyanê mayikan danê, "-e" vurrîna bena "-ê" (Niyade: H. Diljen, "Dimilkî de Nerî û Makî", Çira, hûmar: 1, pelge: 99).

Fekê Kirmanckiyê Dêrsîmî de kî "-e" vurrîna bena "-îye."

Mîsal:

Nêrî

arêdaye
cîngane
çarnaye
morde
nêmende
nîşankerde
pêmite

Mayikî

arêdayîye
cînganîye
çarnayîye
mordîye
nêmendîye
nîşankerdiye
pêmitîye

pînkerde	pînkerdiye
pîzkerde	pîzkerdiye
qesenaye	qesenayîye
qeşiyaye	qeşiyayîye
racêraye	racêrayîye
rakewte	rakewtîye
ronîşte	ronîştîye
sarepîşte	sarepîştîye
telebe	telebîye
tênimite	tênimîtîye
virasre	virastîye
xapîyaye	xapîyayîye
zanaye	zanayîye
zewejîyaye	zewejîyayîye

5. Sifetê îşaretî

Sifetê îşaretî, gorê nêr û mayikênî zuvinî ra benê cîyayî.

Nêrî:

o/wo (*seva çîyanê dûrî*)

no/na* (*seva çîyanê nêzdî/nêjdî*)

* *Na, seva tayê halan vajîno hama hen zaf niyo.*

Mayik:

a (*seva çîyanê dûrî*)

na (*seva çîyanê nêzdî*)

Zafhûmar

ê/yê (*seva çîyanê dûrî*)

nê/na (*seva çîyanê nêzdî*)

Mîsal:

O/wo lazek birayê min o.

No/na dar husk o.

A cênîke maya min a.

Na dare goze wa (goz a).

Ê/yê çenekî rindek ê.

Nê/na kutikî har ê.

6. Fîlê estbîyayêne (estbiyayiş):

a) Eke faîlê cumla, mayik û zuhûmar (yewhûmar) bo, fîlê estbîyayêne beno "a".

b) Eke faîlê cumla, nêrî û zuhûmar bo, fîlê estbîyayêne beno "o".

c) Eke faîlê cumla, zafhûmar bo, fîlê estbîyayêne beno "ê".

Mîsal:

Qelesa mi/min sur a.

Defterê mi/min sur o.

Çimê mi/min sîya yê.

Porrê mi/min sîya yo/wo*.

Bêçika mi/min barî ya.

Burîyê mi/min barî yê.

* "Y" û "w" naza de herfê pêra-gîrêdayîşî yê.

d) Tayê mîsalê bînî:

Ez derg û/ûne *

ti derg a

o derg o

a derg a

ma derg îme

şima/sima derg ê

ê/yê derg ê

* Tayê cayanê Dêrsîmî de, na hal eve vengê "a" yêno vatene. Mîsal: Ez derg a.

Eke sifet herfa vengine (vokal) ra biqedîyone, herfa gîrêdayîşî ("y") kuna werte.

Mîsal:

Ti cira amaye ya. (nêrî)

Ti cira amayî ya. (mayike)

Ti beznderg a. (Seva nêr û mayikî zu form vajîno.)

7) Zamîran de nêr û mayikî:

Kirmanckî de zamîrê şexsî di grub ê. Zamîrê şexsê hîrêyîne kî nêr û mayikênî ra gore cîya rê. Seva nêrî "o"/"wo"/"êy", seva mayike kî "a"/"aye" vajîno.

Grub I

ez

ti

o/wo

a

ma

şima/sima

ê/yê

Grub II

mi/min

to/tu

êy/ey

ay/aye

ma

şima/sima

îne/yîne/înan

Mîsal I:

Vizerî (vîjêrî) o ame çê ma. (nêrî)

Vizerî (vîjêrî) a amê çê ma. (mayike)

O derse dano çênka mi/min.

A derse dana çêna mi/min.

Mîsal II:

Êy (ey) mi rê sayî ardî. (nêrî)

Aye (ay) mi rê sayî ardî. (mayike)

Ez **aye** (**daye**) ra zaf hes ken
(kenûne/kenû/kena). (**nerî**)

Ti **êy** (**dêy**) ra zaf hes kena.
(**mayike**)

8. Fîlan ser o têsîrê nêr û mayîkî
(*Mi kî zê H. Diljenî, naza de hîrê
waxtê fîlan esas guretê*)

A) Fîlê înanstîfî DEMO NIKAYÊN

Faîlo nêr

Serdar yêno (êno)
Serdar şono (sono)
Serdar kuno ra
Sedar urzeno ra (wirzeno ra)
Serdar huyîno
Serdar remeno

Faîla mayike

Roşna yêna (êna)
Roşna şona (sona)
Zere kuna ra
Bese urzena ra
Êlîfe huyîna
Gule remena

Faîlo zafhûmar

Fekê Dêrsîmî dedi formêna halî estê:

1.
Serdar û roşna yêne
Serdar û Roşna şonê (sonê)
Serdar û Zere kunê ra
Serdar û Bese urzenê ra
Serdar û Êlîfe huyîne
Serdar û Gule remenê

2.

Serdar ve/bi roşna ra yêne
Serdar ve/bi Roşna ra şonê (sonê)
Serdar ve/bi Zere ra kunê ra
Serdar ve/bi Bese ra urzenê ra
Serdar ve/bi Êlîfe ra huyîne
Serdar ve/bi Gule ra remenê

Fekê dêrsîmî de nê formê cêrînî
kî vajîne:

Faîlo nêr

Serdar o yêno (êno)
Serdar o sono
Serdar o kuno ra
Sedar o urzeno ra (wirzeno ra)
Serdar o huyîno
Serdar o vêneno
Serdar o remeno

Faîla mayike

Roşna ya* yêna
Roşna ya şona (sona)
Zere ya kuna ra
Bese ya urzena ra
Êlîfe ya huyîna
Sere ya vênena
Gule ya remena

* Kirmanckiyê Dêrsîmî de, vengê pêra
gîrêdayîşî "y", sirê qesêykerdene de zaf waxt
zê vengê "w" yî vajîno. Uzay ser o kî eke
hurêndiya "y" de, "w" bêro nuştene kî beno.
Mîsal: Roşna wa yêna, Gule wa remena.

Faîlo zafhûmar

Fekê Dêrsîmî dedi formêna halî estê:

1.
Serdar ve/bi* roşna ra yê yêne (êne)

Serdar ve/bi Roşna ra **yê** şonê (sonê)
 Serdar ve/bi Zere ra **yê** kunê ra
 Serdar ve/bi Bese ra **yê** urzenê ra
 Serdar ve/bi Êlîfe ra **yê** huyînê
 Serdar ve/bi Sere ra **yê** vênênê
 Serdar ve/bi Gule ra **yê** remenê

* *Tayê cayan de "bi" zê "be" yî kî yêno vatene.*

2.

Serdar û Roşna **yê** yênê (ênê)
 Serdar û Roşna **yê** şonê
 Serdar û Zere **yê** kunê ra
 Serdar û Bese **yê** urzenê ra
 Serdar û Êlîfe **yê** huyînê
 Serdar û Sere **yê** vênênê
 Serdar û Gule **yê** remenê

a) Eke fail nêrî bo, fîl "-o" cêno.

b) Eke fail mayike bo, fîl "-a" cêno.

c) Eke fail zafhûmar bo, fîl "-ê" cêno.

d) Namê ke herfa vengine (vokal) ra qêdîné, herfa pêragîrêdayîşî "y", gegane kî "w" kuna werte. Mîsal: Alî yo/wo wirzeno ra, Gule ya/wa remena. Naza de "y" ve "w" ra, herfê pêragîrêdayîşî yê. Fikrê mi ra gore, nuştîş de "y" binusiyo (bêro nuştene) bes o.

e) Çi turî ke aseno, demo nikayên de, prepozîsyonî zê zuvinî ca nêcênê. Kirmanckiyê Sêwrêge de prepozîsyon verê fîlan der o, Kirmanckiyê Dêrsîmî de kî pêy der o.

Mîsal:

Arjen o rakewno. (Sêwrege)

Serdar o kuno ra. (Dêrsîm)

Na ûsul, fîlê ke eve prepozîsyonan ra pîya rê, seva dîne (înan) têdîne nîyanên o ya kî vurrîno ra, ser o gereke bêro vinetene.

DEMO RAVÊRDE

Faîlo nêr

Serdar ame

Serdar şî

Serdar kewt ra

Sedar ust ra (wist ra)

Serdar huya

Serdar rema

Faîla mayike

Roşna amê

Roşna şîye

Zere kewte ra

Bese uste ra

Êlîfe huye

Gule remê

Faîlo zafhûmar

Fekê Dêrsîmî dedi formêna halî estê:

1.

Serdar û roşna amêyî

Serdar û Roşna şî

Serdar û Zere kewtî ra

Serdar û Bese uştî ra

Serdar û Êlîfe huyîyayî

Serdar û Gule remayî

2.

Serdar ve/bi* roşna ra ameyî

Serdar ve/bi Roşna ra şî

Serdar ve/bi Zere ra kewtî ra

Serdar ve/bi Bese ra uştî ra

Serdar ve/bi Êlîfe ra huyîyayî

Serdar ve/bi Gule ra remayî

a) Eke faîl nêrî bo, fiîl vengê ”-e” ya kî ”-a” cêno; tayê fiîlî na hal de qet vengê newe kî nêcênê. Zêde kî, fiîlê ke eve prepozisyonî ra pêya rê, nîyanên ê. Mîsal: Serdar kewt ra.

b) Eke faîle mayike bo, fiîl vengo ”-e”/”-ê” cêno.

c) Eke faîl zafhûmar bo, fiîl vengê ”-î” ra qedîno. Çi esto ke, fiîlê ke herfa vengine yêna pêy, yê fiîlan de herfa pêragîrêdayîşî ”y” kuna werte.

DEMO AMEYOX

Faîlo nêr

Serdar yêno (êno)
Serdar şono (sono).
Serdar kuno ra
Sedar urzeno ra (wirzeno ra)
Serdar huyîno
Serdar remeno

Faîla mayike

Roşna yêna (êna)
Roşna şona (sona)
Zere kuna ra
Bese urzena ra
Êlîfe huyîna
Gule remena

Faîlo zafhûmar

Fekê Dêrsîmî de di formê na halî estê:

1.

Serdar û roşna yêne
Serdar û Roşna şonê (sonê)
Serdar û Zere kunê ra

Serdar û Bese urzenê ra
Serdar û Êlîfe huyîne
Serdar û Gule remene

2.

Serdar ve/bi roşna ra yêne
Serdar ve/bi Roşna ra şonê (sonê)
Serdar ve/bi Zere ra kunê ra
Serdar ve/bi Bese ra urzenê ra
Serdar ve/bi Êlîfe ra huyîne
Serdar ve/bi Gule ra remene

a) Eke faîl nêrî bo, fiîl vengê ”-o” cêno.

b) Eke faîle mayike bo, fiîl vengê ”-a” cêno.

c) Eke faîl zafhûmar bo, fiîl vengê ”-ê” ra qedîno.

d) Çi turî ke aseno, fekê Dêrsîmî de demo ameyox ve demo nikayên ra zê zuvinî yê. Fekê Sêwrege de faîlî ra dime ”do” yêno. Mîsal: Roşna do bêro. Ez hen zanen ke, eke nuştiş de pê na formî bêro nuştene rind beno.

B) Fîlanê transtîfan de têsîrê nêr û mayikî

DEMO NİKAYÊN

Eke obje nêr û zuhûmar bo:

Fekê Dêrsîmî de hîrê formê na halî estê.

1.

Ez ûne/û* goşt (gost) têvdan
Ez ûne/û goşt wen
Ez ûne/û goşt ken hurdî
Ez ûne/û goşt pozen
Ez ûne/û goşt ken vila

Ez ûne/û goşt qilasnên ra

* *Qesêykerdiş de "ûne" ra zêde "û" vajîno.*

2.

Ez a goşt têvdana

Ez a goşt wena

Ez a goşt kena hurdî

3.

Ez o goşt têvdon

Ez o goşt won

Ez goşt kon hurdî

Eke obje mayik û zuhûmar bo:

Ez ûne/û* saye hêrnên

Ez ûne/û saye wen

Ez ûne/û saye ken letey

Ez ûne/û saye hencinên

Ez ûne/û saye ken husk

Ez ûne/û saye erzen

* *Tayê cayanê Dêrsîmî de hurêndîya "ûne"/"û" de, "a" ya kî "o" vajîno.*

Eke hurêndîya "ûne"/"û" de "a" ya kî "o" bibo, têpîya fiilê kî naye ra gore vurrîno.

Mîsal: Ez a saye hêrnena. Ez o saye hêrnon.

Ez wazen naye kî vajîne; Kirmanckiyê Dêrsîmî de, zêde "ûne"/"û" vajîno, uzay ser o kî mi formanê bînan ra zêde ca da na formî. Hama no, nîno o mane ke na form ayê bînan ra rasttir o.

Eke obje zafhûmar bo:

Fekê Dêrsîmî de hîrê formê na halî estê:

1.

Ez ûne/û tuyû ken arê

Ez ûne/û tuyû wen

Ez ûne/û tuyû ken huskî (husk)

Ez ûne/û tuyû pozen

Ez ûne/û tuyû çarç ken

Ez ûne/û tuyû sanên ro

2.

Ez a tuyan kena arê

Ez a tuyan wena

Ez a tuyan kena husk

3.

Ez o tuyon kon arê

Ez o tuyon won

Ez o tuyon kon husk

DEMO RAVÊRDE

Eke obje nêr û zuhûmar bo:

Min goşt werd

Min goşt kerd hurdî

Min goşt lete kerd

Min goşt pot

Min goşt kerd vila

Min goşt qilasna ra

Eke obje mayik û zuhûmar bo:

Min saye werde

Min saye kerde letey

Min saye gîrênê

Min saye kerde huske

Min saye este

Eke obje zafhûmar bo:

Min sayî werdî

Min sayî kerdî leteyî

Min sayî gîrênayî

Min sayî kerdî huskî

Min sayî estî

DEMO AMEYOX

Eke obje nêr û zuhûmar bo:

Ez goşt (gost) têvdan

Ez goşt wen

Ez goşt ken hurdî
Ez goşt pozen
Ez goşt ken vila
Ez goşt qilasnen ra

Eke obje mayik û zuhûmar bo:

Ez saye wen
Ez saye ken letey
Ez saye gîrênen
Ez saye ken husk
Ez saye erzen

Eke obje zafhûmar bo:

Fekê Dêrsîmî de hîrê formê na
halî estê:

1.
Ez tuyû ken* arê
Ez tuyû wen
Ez tuyû ken huskî

Ez tuyû pozen
Ez tuyû çarç ken

2.
Ez tuyan wena
Ez tuyan kena huskî

3.
Ez tuyon kon* arê
Ez tuyon won
Ez tuyon kon huskî

* Qesêykerdene de, halî ra gore gegane "û" ya ki "-o" jêno pêyê filî.

Mîsal:

*Ez tuyû kenû arê.
Ez tuyo keno arê.*

*Fikirê mi ra gore, rastê xo kî gereke nîya
bo, hama pratîk de -fekê Dêrsîmî de- na
vengî biyê kêmi.*

ÇEND NOTÊ PEYÊNÎ

1. Zê fêkê Sêwrege, fêkê Dêrsîmî de kî kêlîmeyê ke namê hêywananê mayikan ê, eve xo kî mayik ê.

Mîsal:

astore, mîrçike, awrêse, pisinge, kutike, luye, kerge, bize, mîye, tuske, voreke, bizêke, kavirre, manga, here, mayîne.

2. Namê cênîyan (cênîyû) mayik ê:

Mîsal:

Fate, Bese, Ele, Zere, Sare, Sere, Roşna, Gewre, Sosine, Nalîne, Delale, Fîraze, Gule, Xezale, Nure.

3. Kêlîmeyê ke namê cuwamêrdan ê, nêrî yê:

Mîsal:

Serdar, Azad, Alî, Hesen, Usên, Xidir, Qemer, Cêmsîd, Mîrza.

4. Sifet û nameyê ke elaqê xo eve cênîyan ra esto, têde mayik ê; ayê ke elaqê xo cuwamêrdan ra esto, têde nêrî yê.

Mîsal:

Mayike: Vêyve, kewanîye, çêwaye, vis-turîye, çêna, xale, amike.

Nêrî: bira, ap, dereza (dedza), wereza, lazek, cuwamêrd, kewra, misayîv.

HATAY Û BÎRANÎNÊN MEKTEBÊ

Kemal Sülker

Ev nivîsa jêrîn ji bîranîneke Kemal Sülker a bi navê "Hatay ve Okul Anıları (Hatay û Bîranînên Mektebê)" hatiye girtin. Kemal Sülker ji Antaqyayê ye. Dema ku Îskenderûn di bin destê Fransîzan de bû ew jî li wir di lîsê de telebe bû û wê demê (1934) Memduh Selîm jî mamostê wî yê edebîyatê bû.

Kemal Sülker di vê bîranîna xwe de qala dewra xwe ya Antaqya û xwendina xwe ya wê demê û qala mamosteyên xwe dike. Her weha wê demê wî deftereke bîranînê jî hebûye ku gelek caran mamosteyên wî jê re hin tişt nivîsîne. Yek ji wan kesên ku di deftera wî de nivîsiye mamostê wî yê edebîyatê Memduh Selîm bûye. Li vir em tenê qismê ku Memduh Selîm jê re nivîsiye werdigerînin Kurdî û pêşkêşî we dikin.

...

Mamostê edebîyatê Memduh Selîm kesekî aktîf, ciddî û xwedî perspektîfeke fireh bû. Wî jî şîretên xwe weha rêz kiribûn:

"Ji wan mirovan bin ku li gel hakim û şairê mezin **Sadîyê Şîrazî Benî adem azayê yek dîgerend**¹ dibêjin û di dilê xwe de wek lédana rehên ku têhniyê mezinatiyê ne bi şîreta **Lamartine Partout où lón pleurea mon âme a sa patrie** yanê **Her ciyê ku girîn lê hebe ew der welatê ruhê min e** dijîn.

Pasteure dibêje:

On ne demande pas à un malheureux de quel pays ou de quelle religion es-tu? Tu souffres, cela me suffrt. Ta mappartiens et je te soulageraix.

Ji felakerzadeyekî nayê pirsîn "tu ji kîjan milletî yî, ji kîjan dînî jî". Tu istirabê dikişînî, ev besî min e. Tu ye min î û ezê te tesellî bikim.

Tu dikarî wilo bî? Roja ku tu wilo bî û ji dil û can wilo bî, wê demê mirovatiyê amanca xwe di te de dîtiye.

Gotinên Titus dinivîsin:

Diem perdidi.

Min roja xwe wenda kir.

Roja ku îmkân bi dest neketiye ku qencîyekê bike weha digot.

Şaîrekî Îranî çawa van hîssan ji dil û can hîs dike:

Ez, kîjan uzuv îstirabê bikişîne, wek çavê girayî me. Her kî bi keder û êş be, xemgîn dibim.

Ev çend rêzên şaîrê mirov û mirovê mezin, ustadê min Dr. Abdullah Cevdet çiqas însanî ne:

Gönüllerle beraber gönlümüz şâd ü mükedderdir

Dil-i tevhidimizde münferid hazz ü azap olmaz.²

Belê, ez welê hîs dikim û welê dibêjim. Berî her tiştî mirovê wisa... Her meslek, her sinif û her temen (emir) muhtacî vê ye. Ax ew muhtacî were hîskirin û ew kovan (hesret) hebe. Alîyekî mezin ê sirra bextewerîyê di vir de ye.

Hê maye: Tu dev ji wan şîretên ku *mîrovê ku nekeve ber bayê diweste* û *ger dem ne li gor te be, tu xwe li gor demê eyar bike* berde. Berê di karûbarên hukumerê de derew, dek û dolab ne şerm bûn, ji xizmeta ebedîbûnê dihatin hesabandin. Makyavelîzm; durûtîya ku jê re dibêjin polîtîka, canbazî... Îro di karûbarê dewletê de jî neman. Êdî têkiliyên navneteweyî jî ku ji vê re dibêjin *qahpetî*, gelo di jiyana xwe ya şexsî û civakî de em dikarin vê wek wasite û şertekî serketinê bihesibînin?

Wekî ku hinek jî dibêjin, navbera xwe û herkesî xweşkirin, ne mezîyetek e. Navbera xwe û herkesî xweşkirin ne-piçek lê gelekî şelaqîkirin e û serê xwe li ber herkesî xwarkirin e. Ev bi temamî dirûtîyek e. Yê ku bi herkesî re xweş dikin, bila riyakarîyê nekin, hela em binihêrin navbera wan ê xweş be an ne? **J. J. Rousseau** gava ku rexne li Misanthrope ya **Moliere** digre, qala vî xuyê wî jî dike û bi şîddet bi ser de diçe û kê-m-zêde weha dibêje:

Ew kesê ku dostê her kesî be, bi ya min bêtir dijminê mirovî ye. Mirovê ku ji her tiştî kêfxweş e, her tim piştgirê hemû xerabîyan e, ji bêexlaqîyên ku serkanîya hemû bêserûberîyên civatê ne re şelaqîyê dikin... Ew kes dijminê mirovî ye.

*Kaç çalipaya gerildi ruhum
Kaç Yuda busesi gördü yanağım³*

Bi van rêzên xwe Abdullah Cevdet ku neheqîya bêwefadarîyê tîne zimên
û bi van herdû çarînên xwe jî bi min riyeke baş nîşanî me dide:

İştîyakım bir açık özlü, açık sözlü ere
Ah bilsen yüreğimde ne kadar çok ve derin!
En güzel maskeye tercih ederim bin kerre
Maskesiz çehre-i menfurunu ifritlerin.

Ölmüş arslanlığı tercih ile gör,
Ömr-ü mesudunu kıskanma itin
Yaşa vaziyet-i pür izzetini
Ölmeğe hazır olan bir yiğitin.⁴

Em di şerrê têkoşîna jibo mirovayetîyê de ne. Piştî ku me xurûr û tahma
vê têkoşînê dît şûn de, li tahmek din nagerin. Ji xwe *însaniya kamil û welîti*
di vir de ye.”

(Ji kovara **Yazko Edebiyat**, No: 24 (Ekim 1982), İstanbul, r. 76-78 hatiye girtin)

**Wergera ji Tirkî:
Mahmûd Lewendî**

Not:

¹ *Beni adem aza-yi yek digerend*: Benî adem endamên yekûdu ne

² Bi dilan re, dilê meşad(?) û bi keder e. Di dilê meyê yekbûyî de kêfxweşî û êşa munferîd (yekane) tune.

³ Ruhê min bi çend çarmîxan ve hat girêdan, dêmên min çend ramûsanên Yuda dîtin.

⁴ Bi kurtî maneya vê helbestê weha ye: Di dilê min de bûye hesret û kovan da ku bikaribim kesekî durust û rastgo bibînim. Ez hezar carî ruyê nexweşîkê ifrîtên bê maske, tercîhî maskeya herî xweşîk dikim.

Bi daxwaz bibîne mirina şêrane/Bi tercîh bîmire wek şêr, hesûdiya jiyana bextewer a kûçîk meke(mekşîne). Halê tijî hêjayî û mezinahî ya mêrxasekî li ber mirinê bijî.

MEMOYÊ ŞIVAN Û ÛJDANÊ DADGEHA TIRK!

Laleş Qaso

"Ûjdan nîne, heq û hiqûq nîne, edalet nîne; devê tivinga kê zirav be zozan yê wî ye!.." Memoyê şivan li girtîgeha Diyarbekirê seraqet wilo digot. Bi rastî jî, weke ku Memo digot bû. Ger tu li Dadgeha Ewlekarî ya Diyarbekirê bi şintaqê li ûjdên bigerîya, bi Qesem dibêjim, dîsa jî te derhemek peyde nedikir. Dadger hemû mirovên barbar bûn! Van dadgeran ji ewraqên ku di derheqa hêsîran de bêtir, meyla xwe didan ser axaftin, şûf û endama hêsîran. Eger ê hêsîr li êşkencexanê li gora zagonan bi qasî ku tewqîf nebe axaftiba, ango tîman li ser hindik nivîsandiba û ev mirov ketiba çavên dadgeran, yanî bi şûf û endam an jî zanyar baya, xelasîya wî çenedibû. Dadgeran ya di cîhêcîh de ew tewqîf dikirin, ya jî ew li êşkencexana ku jê hatibû vedigerandin. Ev mirovên han taybetî ji dêvla tewqîfê ku rastûrê bişandina girtîgehê, dîsa li êşkencexaneya pirsedanîyê vedigerandin. Tîman jî ewraqên wan dinepixandin û ew bi ser dadgeran de dişandin. Dadgeran bûyer hertim di derbarê zagonên kevneperest de difesilandin û bi eşqîyatî keftûlept dikirin. Li vê edaleta dadgeha tirk temaşe bikin: Ew kesê ku tiştêkî wî û doza kurdayetîyê bi hev re nîne, belê li ser vî tiştî bi mehan di êşkencexaneyên pirsedanîyê de birçî û tazî û herwiha lêdanê dixwe, paşîn rînin dadgehê, dadgeh bejn û bala wî naecibîne û dixwaze wî tewqîf bike, di ewraqan de delîlê tewqîfkirinê nabîne û wî dîsa li êşkencexanên pirsedanîyê vedigerîne. Çawa ûjdan e!!

Memo Ayhan jî yek ji van kesên ku dadgeran bejn û bala wî ne ecibandibûn û ew dîsa li êşkencexana pirsedanîyê vegerandibûn. Navê vî mirovê hêja ê rastî Mehmet bû. Ji ber ku ez heqaretek mezin dibînim, gava

ku ji kurdekî welatparêz re bibêjim «Mehmet an Abdûllah» îcar Memo û Evdo dibêjim, bibexişnin. Memo ji dorhêla Dêrika Çiyayê Mazî û mirovekî 25 salî bû. Di sala 1980'yê de hatibû girtin. Ev mirov ji wê roja ku bîr dibe û bi ser lîngan dikeve ta roja tê girtin, herwiha şivan û gavaniyê dike. Dibistan nexwendibû, suxtetî nekiribû û ji kurdî pêve wekî din bi tu zimanî jî nizanibû. Mirovekî di halê xwe de kemlan, wensxweş û ewqasî jî henekçî bû.

Memo 25 sal kiribû, belê dîsa jî nezan bû. Ne bi mirovên jîr û zana re rabûbû û rûniştibû û ne jî gerok bû. Berî min bi salekê hatibû girtin. Îcar em ê niha ji devê girtiyên li ser roja ku Memo tînin girtîgehê û bê ev Memoyê me çendî mirovekî zanyar bû, hinekî binivîsîn:

– Memo Atatirk kî ye û ji kuderê ye?

– Weh, kurdên ku hîn Atatirk nas nekiribin hene qey! Atatirk bavê Silêmanê Şido û Mêrdînî ye. Hûn çî dikenin lawo, ma ne wisa ye qey. Bêbavo bûye mezinê tirkan li Enqerê rûniştîye û ha ha dijminatîyê bi me kurdan re dike. Vî bêbavî em kurd şewitandin û bê yekî bi namûs ji me derkeve here derbekê lêxe lo...

– Silêmanê Şido kî ye ?

– Silêmanê Şido Mêrdînî ye. Bi zulma xwe pir bi nav û deng e! Kurdan ji destê vî zalimî pir û pir kişandiyê!..

– Bi rastî gava Silêmanê Şido Mêrdînî, bajarî û bavê Atatirk be, mirov wî çaxî dikare bibêje ku Atatirk ne tirk e, erebekî bajarî ye...

– Min digot qey hûn jî mirovên zîrek in: Malviritîno herçî bajarî û tirk yek tişt e, yek; bajarî bi qasî tirkan bêbav in!

– Memo çima tu wisa dibêjî? Pirên van hevalên girtî bajarî ne.

– Li qusûra min nenêrin. Belê bi Xwedê bajarî hemû bêbav in û hew.

– Memo, çewt ji te re gotine. Atatirk tirk e û ev 44 salê wî ye ku mirîye.

– Na lo!

– Erê erê.

– Lawo hûn bi qedirê Xwedayê xwe kin, hûn ê van gotinên min ji Hisên Çurûk re nebêjin. Kuro bi Quran wê min bike zibil û zibar...

Huseyin Çuruk jî yekî mîna Memo û ji dorhêla Cizîrê bû. Li ser jîr û zanatiyê yek carinan ew û Memo diketin qirika hev. Wî digot ez ji te, yê din digot na ez ji te bêtir zana me. Memo li ser navê kurdayetîyê hatibû girtin. Wilo bû gelo? Dadgehê ew mîna ku siyasetgerekî mezin bû, didît û darîçav jê dipelikand. Dadger û ku çawa ji yekî wek Memo belengaz bipelikîne! Dadger zana bûn. Ji herkesî çêtir bi rewşa Memo dizanin.

Girtî pirsê dikin û Memo jî bersivê dide:

- Memo kurd kî ne?
- Kurd ez û tu û em evên girtî ne.
- Kurdistan li kû derê ye?

- Kurdistan Hekarî, Wan, Cizîra Bota, Nisêbîn, Qiziltepe, Dêrik, Sêwreg, Wêranşar, Diyarbekir û Batmanê ye. Belê dibêjin ku Edene, Maden û Îzmîrê jî Kurdistan e, kuro. Lawo, Xwedê bike lawo. Hema heçê ku navê, çavên wî kûr bibin.

Memo ji roja ku çêdibe ta roja tê girtin, carekê bi meta xwe re diçe Nisêbînê, carekê bi yekî wek xwe şivan re diçin Wêranşarê û carekê jî bi mirovekî xwe re diçe Qiziltepeyê. Îcar gava min jê re digot:

- Memo, ma ji van bajarên pêve te tu bajarên din jî nedîtine?
- Wilehî çî bibêjim, erê erê min nîv bajarekî din jî dîtîye.
- Tê ne gihiştim.

- Erê lo, min Mêrdînê ji dûrayî ve dîtîye. Qesda gotina min ya nîvbajarekî ev e, ha. Qaşo tu jî xwendevanî. Bê ku ez bi nav bikim, têbigihêje şoreşgero. Ê ne Nayif, ne tu nizanî bê bi şev ji çiyayên Dêrika malwêran ev xopana Mêrdînê çiqasî xweşik xuya dike; mîna alqût û buhuştê diçirîsîne!

- Buhuşt naçirîsîne, ma te buhuşt dîtîye qey? Memo, nebe tu ewlîya bî...

- Oooh tu jî, ez çî zanim, mele wisa dibêjin. De ka bise dev ji van qeşmerîyan berde û ji min re bibêje bê ez ê kengî bêm berdan. Howeh kuro lawo, ditirsim bi saxî ji vê cehnemê dernekevim û wê Mêrdîna Silêmanê Şido nebinim. Nayif, ev niha bi rastî weku heval dibêjin, Silêmanê Şido ne bavê Atatirk e, tu bi qedirê Xwedê kî..?

- Tu kurd î an na?

- Kuro lawo îcar ev çî gotin e; ma ku ez ne kurd bim, naxwe ev kurd kî ne! Bêguneh ez wek bavê kurda me. Lawo bi Xwedê tu ferqa min û hirçê ji hev nîne...

Ji serê nenûkên tilîyên lîngan û ta ku digihaşt serê nenûkên tilîyên destan, wilo herderê Memo bi pirç bû. Li gora wî her çî kesê ku mîna wî wilo bi pirç ba, ew kurdeki temam bû. Em bi Memo re vê devjenkê hîn jî bidomînin:

- Memo ev pirça te bûye bela serê te. Bi vê pirçê, hakim te mezinekî kurd dibînin û bi Xwedê te tu carî bernadin.

- Eehew lawo ev tu çiqasî zalim î! Wey mala Xwedê ava ku kesî tu nekirîye hakim. Malxerabo, çawa devê te digere ku tu wisa dibêjî. Kuro bi wê Qurana ser çoga Pêxember, min ev pirç jênekir û ez ê wisa kurd bimînim. Çî dikin bila bikin. Ma ne wê hey rojekê Cizîrê li ber avê biçe; hema bila niha biçe û hew.

Sûcê Memo ev bû: Li çiyê hin şoreşger û leşkerên tirk li hev diteqînin. Memo jî di wê gavê de dîsa wek hertim li çolê şivan e. Bi teqînê, şoreşger bazdidin, xwe xelas dikin û leşker jî bi zanatî li şûna van şoreşgeran Memo digirin. Leşger di cîhêcîh de bi qezetoran laşê Memo diterişînin, serê wî û zendeke wî dişkînin. Memo bêhiş tînin tûxaya Mêrdînê. "Li tûxayê ez bi ser hişê xwe hatim" digot. Wî, nêzî sê mehan li tûxayê dihêlin, êşkencê pê dikin û paşîn wî dişînin Diyarbekirê, dadgeha leşkerî. Herçi dadger, meyla xwe didin ser bejn û bala Memo û li ewraqan temaşe dikin. Di van ewraqan de, bi qasî ku Memo bişînin girûgehê sûcekî nabînin. Dadger şûfa Memoyê me naecibînin û berê wî dîsa didin tûxaya Mêrdînê. Memoyê ku bi carekê ve kurd bû, zêdî mehekê li vir dihêlin û herwiha pê êşkencê dikin. Di ewraqên wî de gelek tiştên nebûyî dinivîsînin. Memo nizane îmza xwe bavêje. Ji dêvla înzê, tilîka wî lêdixînin û wî dîsa bi ser edaleta tirk de dişînin. Ewraq pir nepixî hatine destê edaletê. Li gora zagonan, bi rêz û tertîp hatibûn nivîsandin. Memoyê ku digot "Nayif ev însan çima wisa bêaqil in, kuro ma ev dinya têra kê nake ku însan li ser malê dinyayê zulmê li hev dikin û hev dikujin.." êdî dê çawa ji destê vê edaletê azad bibûya. Edalet dest û piyên vî mirovperestê belengaz kelepçe dîke û wî davêje nav agirê dojhê. Edaleta dewleta tirk ev e. Memo ne mirovekî nizanim çawa bibêjim wilo şûfşêr, awîrqertel û bi endam bû; mirovekî bê dar û ber, mîna lepekî hûr û ewqasî jî perîşan bû. Îcar gava ku mirov nizanîba bi tirkî û mirov derdixistina pêşberî dadgeran, tew mirov hîn bêtir ji hawhaw diket. Gelo dadger ji vê belengazîya Memo aciz bûbûn ku ew cezeyê giran dan Memo û wekî din jî ew heft salan di nav agirê dojhê de şewitandin? Ya gelo ji ber wexta ku Memo tînin dadgehê, Memo bi şekala mekap bû, dadgeran jî ev şekal qominîst û kurd dizanîbûn, ji vê yekê aciz bûbûn ku wilo bi saxî Memo dişewitandin? Ya jî gelo ji ber ku dadger ji kurdan pir bi kîn bûn û Memo jî kurd hatibû vê dinyaya; bi buhuşt û dojh, tengijîn û wilo bi qahr ew debûzê zulmê li serê Memo yê reben dixistin?

Gava mirov bi tirkî nizanîba, dadgeha tirk, ev yeka han sûc didît û ji vî sûcî ceze dibirî. Ceze, di navbera heşt sal û heft mehan de dilîst. Şekala mekap jî bi sûc bû. Dadgerên tirk gava yekî bi şekala mekap li pêşberî xwe didît, bêgotin ji du salan ta ku bigiha heft salan ceze lê dibirîn. Wexta ku mirov henûn, kemlan, nezan an jîr û zana û ji xwe bi hêvî ba, dîsa jî tawanbarî bû. Tu dîn ba jî sûc bû. Li girtîgehê bi êşkencê mirovên ku dîn bûbûn hebûn. Dadgehê bêqewl ceze daye van mirovan jî...

Ji berpîrsiyar û xebatkarên Med TV re

Stockholm, 11. 04. 1995

Bi destpêkirina weşana televîzyona Kurdî, hun karekî giring dikin. Tê zanîn ku di dema me de tesîra televîzyonê li ser civatê gelek zêde ye. Li welêt televîzyonên Tirk, 'Ereb û Farisan bûne yek ji wasîteyên asîmîlasyonê yên herî giring.

Bi a me televîzyoneke Kurdî wek Med TV xwedî roleke gelekî giring e û dikare tesîreke baş li milletê Kurd bike. Bi taybetî di warê nasandina pîrsa Kurdî û nîşandayîna problemên civata Kurdistanê de, di nasandin û geşkirina kultura Kurdî de û jiyandin û vejandina zimanê Kurdî de. Loma jî em hêvî dikin ku Med TV, bi zimanê Kurdî weşana xwe bidomîne, bibe dengê milletê Kurd û bikaribe daxwaz û problemên wî destnîşan bike.

Bi vê hêviyê em ji we re serketinê dixwazin.

Mehemed Malmîsanij
Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê

Di hejmara 1. a Çirayê de (r. 39 û 119.'an), navê nivîsa Rojen Barnas şaş hatibû nivîsîn. Rastiya wê weha ye:

Hecî Mihemed 'Elîyê Qelşo
(Radiyellahû teala enhû)

Di hejmara 1. a Çirayê de (r. 118), şaşiyek hebû, em ligel rastiya wê dinivîsin:

Şaş: "Jibo sedasaliya nivîsîna Mem û Zînê..."
Rast: "Jibo sêsedasaliya nivîsîna Mem û Zînê..."

